

K.T.
Zanîngeha Mardin Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

**VEKOLÎNEKE ETNOMUZÎKOLOJÎK
LI SER MIHEMED ARIF CIZÎRÎ**

Teza Lîsansa Bilind

Yunus ORAK
15711006

Şêwirmend:
Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mêrdîn, 2019

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ’NE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum *“Vekolîneke Etnomuzîkolojik li Ser Mihemed Arif Cizîrî (Mihemed Arif Ciziri Üzerine Etnomüzikolojik Bir İnceleme)”* adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkîye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin 1 yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

25.06.2019

Yunus ORAK

KABUL VE ONAY

Yunus ORAK tarafından hazırlanan “*Vekolîneke Etnomuzîkolojik li Ser Mihemed Arif Cizîrî (Mihemed Arif Ciziri Üzerine Etnomüzikolojik Bir İnceleme)*” adlı çalışma, belirlenen tarihte yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Mardin Artuklu Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim dalı **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oy birliği / oy çokluğu ile kabul edilmiştir.

Başkan : Doç. Dr. Mustafa ASLAN

Üye : Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

Danışman : Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Yukarıdaki İmzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylım.

Doç. Dr. Yunus CENGİZ
Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürü

PÊŞGOTIN

Wekî xemxur û şopînerêkî ziman û çanda Kurdî ku ji temenên ciwanîya pêşîn ve ez li serê mijûl, min keda xwe têkelî gelek hêlên sazîyên civakî yên çand û zimanî kir. Di vê maweyê de gelek tecrubeyên cihêreng ên weke berhevkarî û deşîfrasyona berhemên folklorîk, stranbêjî, werger, nivîskarî, perwerdekarî, aktîvîstî û rêveberîya sazî û dezgehên derbarê çand û zimanî de min li xwe zêde kirin û di van waran de keftûleftên min çêbûn. Bi taybetî mijûlbûna bi muzîk û zimanî re ji bo min şanseke û qadeke nû ya pêşveçûnê vebû ku piştî demekê van her du qadan bi hev re û di nav hev de binirxînim û qada xwe ya lêhûrbûnê dîyar bikim.

Ji bo pêşxistina ziman û çandê xebateke bingehîn jî qada xebatên akademîk e. Nexasim zimanê Kurdî yê ku hêj di gelek warên lêkolînan de qadeke beyar e, bêhtir pêdivî pê dibîne ku qadên nû yên akademîk jê re bînin vekirin û ji aliyên nû ve vekolîn û lêkolîn li ser çanda wî bînin pêşxistin. Di xwendina beşa Ziman û Çanda Kurdî ya Zanîngeha Mardîn Artukluyê ya 2015'an de, bi saya mamoste Yrd. Doç. Dr. Necat Keskin berê min ket qada xebatên akademîk ên li ser etnomuzîkolojîyê. Bi demê re xwendin û lêkolînen min li ser vê qadê şax vedan û gihiştin qonaxa avakirina vê tezê û min bingeh li ser naskirin, nasandin û pênaseya etnomuzîkolojîyê lê kir. Li gel vê yekê xebatên min ên li ser dengbêjîyê bîr û boçûnên min ên derbarê vê qadê de dermale kirin û bi awayekî xwezayî ber û bergehên vê xebatê dîyar bûn. Pê re jî vekolîna li ser jîyan û hunera Mihemed Arif Cizîrî beşên din ên vê tezê gihiştin dawî.

Di pêvajoya amadekirinê de divê spasîyên xwe yên taybet bo mamosteyê xwe Yrd. Doç. Dr. Necat Keskin ku bi fikr û ramanê xwe derîyek ji bo vê xebatê vekir û ji bo mamosteyê min ê şewirmend, hêja Doç. Dr. Mustafa Öztürk ku di demeke teng de ji bo kemilandina vê tezê bû alîkar û rênîşandêr û her wiha kedeke nirxdar lê terxan kir, dîyar bikim. Spasîyeke taybet bo hêja Dr. Seyran Amêdî ku xemxur û hezkirîyeke qedîm a Mihemed Arif Cizîrî ye û pêşkêşkirina arşîva xwe ji bo vê xebatê teksîr nekir. Spasîyek bo dost û birakê min ê hêja Fuat Esmeray ku di warê teknîk de keda xwe têkelî vê xebatê kir û di her warê jîyanê de dostanîya xwe ji min kêr nekir. Bi hurmet û hezkirin spasî bo bavê min ê rehmetî Ehmedê Torî û dîya

min Horî û hemû malbata min ku ez bi vê çandê mezin kirî û bûyîn rîknên min ên hest û hizrî.

Bi pêşkêşkirina vê tezê hevîdar im çandhez û şopînerên çanda Kurdî sudeke baş jê werbigirin û ev xebat bibe cihê dilxweşî û ronahîyê bo gencîneya ziman û çanda me û bi hevîdarîya geşbûna xebatên nirxdar ên çandî û zanistî yên Kurdî.

Yunus ORAK

KURTE

Çawa ku zimanê her civakê ji hev cihê ye, muzîka her civakê bi awayekî xwezayî jev cihê ye. Her civak li gor erdnîgarî, bandorên çandên din, pêwîstî û taybetmendiyên xwe, dibe xwediyê mûzîkeke xweser û resen. Ev civak carinan dibe ku etnîsîteyek be, carinan qebîleyek be, derdora olekê be an jî êl û eşîrek be; di dawiyê de ev yek çandekê îfade dikin. Zimanê Kurdî yê ku bûye haveynê çanda devkî, bi xwe re berhemên cîyawaz ên hunerî dane zayîn. Dengbêjên ku barkêşî û veguhêzerîya mîrate û serborîyên çanda devkî ya Kurdan ji nifşên li dû xwe re kirî, hin caran bi şeweyên vegotinê hin caran jî bi şeweyên melodîk berhemên kevneşopî hunandine û afirandine. Dengbêjên ku ji hêla resenî û rengînîya xwe ve bûne resenîyeke muzîka Kurdî di nav şaxa zanîstî ya etnomuzîkolojîyê (muzîkolojîya çandî) hêjayî nirxandinê ne û taybetmendiyên dengbêjîyê yên çandî bi awayekî xwezayî berê mirov dide qada etnomuzîkolojîyê.

Hêla vegotinê ya dengbêjîyê bûye mijara gelek xebatên akademîk û çandî. Hetta wekî rîknê sereke yê edebîyata Kurdî, cihê dengbêjîyê taybet e. Dengbêjî kêm jî be ji hêla muzîkolojîyê ve hatîye nirxandin û vekolandin. Lê em dikarin bibêjin ku nirxandina dengbêjîyê di bin banê etnomuzîkolojîyê de babeteke nû ye. Di vê vekolînê de hewldana me dê li ser nasandina etnomuzîkolojî û xweserîyên wê be û li ser vê bingehê nêrînek li ser jîyana Mihemed Arif Cizîrî û bandora jîyana wî ya civakî ya li ser hunera wî be. Têkildarî vê yekê kod û motîf û mijarên di hunera Mihemed Arifî de dê wekî taybetmendiyên xweser ên muzîka wî dê bên destnîşankirin.

Mihemed Arif Cizîrîyê ku bi stran û kilamên xwe yên cîyawaz bo folklorê Kurdî mîrateke têr û berfireh hiştîye, bi naverok û şeweyên van berhemên dê bibe qada sereke ya vê vekolînê. Li gel van babetan yek ji lêgerînên me yên vê vekolînê jî dê awirtêdana senifandina hunera wî be.

Peyvên Sereke: Etnomuzîkolojî, Mihemed Arif Cizîrî, kilam, dengbêjî, çanda devkî.

ÖZET

Nasıl ki her toplumun dili farklıysa, buna bağlı olarak ve doğal bir şekilde her toplumun müziği de farklılık arz eder. Zaman ve mekâna bağlı olarak her topluluğun; coğrafya, diğer kültürlerle etkileşimi, ihtiyaç ve hususiyetlerine göre, özgün ve orijinal bir müziği oluşur. Bu topluluk bazen bir etnisite, bazen bir kabile, bir inamış kesimi ya da bir hanedanlık ve aşiret olabilmektedir. Ne olursa olsun en nihayetinde bütün bunlar bir kültürü ifade etmektedirler. Sözlü kültürün temel bileşeni olan dil, birçok özgün sanatsal eser doğurmuştur. Kürtlerde sözlü kültür miras taşıyıcı ve aktarıcılığını kendilerinden sonraki kuşaklara aktaran dengbêjler, bazen anlatım biçimiyle, bazen de melodik biçimli geleneksel eserler yaratmışlardır. Farklılık ve renklilikleriyle Kürt müziğinin özgünlüklerinden birini oluşturan dengbêjlerin etnomüzikoloji (*kültürel müzikoloji*) alanında ele alınıp değerlendirilmeleri dikkate değer bir konudur. Zaten dengbêjliğin kültürel niteliklerinin ele alınması doğal bir şekilde yönümüzü etnomüzikoloji alanına çevirmektedir.

Dengbêjliğin sözlü anlatım yönü birçok bilimsel akademik çalışmanın konusu olmuştur. Hatta dengbêjlik Kürt edebiyatının mihenk taşlarından birini ve özel bir alanı oluşturur. Sınırlı bir şekilde de olsa dengbêjlik müzikoloji bağlamında ele alınıp incelenmiştir. Ancak dengbêjliğin etnomüzikolojik bağlamda ele alınması yeni bir konuyu teşkil etmektedir. Bu incelememizde etnomüzikolojiyi tanımaya/tanımlamaya çalışarak, bu temelde Mihemed Arif Cizîrî'nin toplumsal yaşamının sanatına olan etkileri etnomüzikolojik bir bakışla ele alınmaya çalışılacaktır. Buna bağlı olarak Mihemed Arif Cizîrî'nin sanatında yer alan kod, motif ve konular onun müziğinin özgün niteliği olarak sunulmaya çalışılacaktır.

Özgün kilam ve stranlarıyla Kürt folkloruna kapsamlı ve geniş bir miras sunan Mihemed Arif Cizîrî, bütün eserlerinin içerik ve biçimleriyle bu incelemenin temel alanını oluşturacaktır. Bununla beraber bu incelememizin diğer bir arayışı da onun sanatının sınıflandırılması üzerine olacaktır.

Anahtar Kelimeler: Etnomüzikoloji, Mihemed Arif Cizîrî, kilam (şarkı), dengbêjlik, sözlü kültür.

ABSTRACT

Just as the language of each society is different, so does the music of each society. Depending on the time and place of each community; geography, interaction with other cultures and according to the needs and characteristics, develops an unique and original music. This community can sometimes be an ethnicity, sometimes a tribe, a section of belief or a dynasty and tribe. In any case, they all referring to a culture at last. Language, which is the main component of oral culture, has produced many original artistic works. *Dengbêj's* which transmitted their oral cultural heritage carriers and transmissions to the next generations in Kurds, created traditional works with narrative, wording and sometimes with melodic forms. It is worth to consider that *dengbêj's*, which constitute the authenticity of Kurdish music with their differences and diversity, are discussed and evaluated in the domain of ethnomusicology (cultural musicology). In any case, the cultural characteristics of *dengbêjî* (the art of being a dengbêj) naturally lead us to the area of ethnomusicology.

Dengbêj's oral narrative tradition has been the subject of many scientific academic studies. In addition *dengbêjî* constitutes one of the cornerstones of Kurdish literature. Although constrictedly, *dengbêjî* has been studied in the context of musicology. Yet, *dengbêjî* in the ethnomusicological context is a new issue. In this study, by trying to recognize / describe ethnomusicology, the social life of Mihemed Arif Cizîrî on his art will be discussed from an ethnomusicological perspective. Correspondingly the code, motifs and subjects in the art of Mihemed Arif Cizîrî will be presented as the genuine quality of his music.

Mihemed Arif Cizîrî, who offers a comprehensive and wide heritage to Kurdish folklore with his original *kilam's* (ballads) and *stran's* (songs), will form the basis of this study with the content and forms of all his works. At the same time, the classification of its art will be the another quest of this study.

Key Words: Ethnomusicology, Mihemed Arif Cizîrî, kilam (ballad), dengbêjî, oral culture.

NAVEROK

PÊŞGOTIN	I
KURTE	III
ÖZET	IV
ABSTRACT	V
NAVEROK	VI
KURTEBÊJE	IX
DESTPÊK	1

BEŞA YEKEMÎN

1. ÇARÇOVEYA TEORÎK Û TÊGEHÊN SEREKE	4
1.1. Çand	4
1.1.1. Çanda Devkî di nav Kurdan de	5
1.2. Dengbêjî û Taybetmendiyên wê	6
1.2.1. Zimanê Dengbêjîyê	8
1.2.2. Dînamîzma Dengbêjîyê	10
1.2.3. Stranên Gelêrî	12
1.3. Muzîk	13
1.3.1. Deng	16
1.3.2. Weke Qadeke Xwederbirînê Muzîk	17
1.3.3. Muzîk û Nasname	18
1.3.4. Muzîk û Civak	19
1.3.5. Muzîk û Bîr	21
1.3.6. Ecibandina Muzîkê	22
1.4. Etnomuzîkolojî	24
1.4.1. Muzîkolojîya Çandî an Etnomuzîkolojî?	26
1.4.2. Bi Çavê Etnomuzîkolojîyê Gerdûnîbûna Muzîkê	27
1.4.3. Kurtedîroka Etnomuzîkolojîyê	29
1.4.4. Têkilîya Etnomuzîkolojîyê bi Disîplînên din re	33
1.4.5. Nêzîkahî û Modelên li ser Etnomuzîkolojîyê	38
1.4.6. Dengbêjî di Peywenda Etnomuzîkolojîyê de	41

BEŞA DUYEMÎN

2. VEKOLÎNEK LI SER JÎYANA MIHEMED ARIF CIZÎRÎ	44
2.1. Jîyana Mihemed Arif Cizîrî	44
2.1.1. Zaroktî û Malbata wî	44
2.1.2. Salên li Girtîgeha Amedê.....	46
2.1.3. Rêwîtiya wî ya ber bi Başûr ve.....	47
2.1.4. Qehwexaneya Fermanê Çaycî	48
2.1.5. Kufletên wî	49
2.1.6. Hevnasîna bi Hesên Cizîrî re	49
2.1.7. Qewanên wî yên Destpêkê.....	51
2.1.8. Geryana wî ya bo Sineta Zarokan û Pîrozbahîyên Olî	52
2.1.9. Salên li Radyoya Bexdayê	53
2.1.10. Ji bo Konser û Ahengan Serdana li Çend Welatan	56
2.1.11. Tomargeha Ebû Mêhvan	58
2.1.12. Çûyîna Hecê	60
2.1.13. Koça wî ya Dawîn	61
2.2. Kesayetiya Mihemed Arif Cizîrî.....	62

BEŞA SÊYEMÎN

3. HUNER Ê BERHEMÊN MIHEMED ARIF CIZÎRÎ.....	65
3.1. Ji Hêla Rîtmê ve Nirxandina Berhemên wî	66
3.1.1. Berhemên Bêrîtm (Kilam)	67
3.1.2. Berhemên Rîtmîk (Stranên Gelêrî).....	69
3.2. Tembûra wî ya Xweser û Enstrumanên di Tomarên wî de.....	71
3.3. Afirandin û Îcrakirina Berhemê	73
3.3.1. Jixweberî (Emprovîzasyon)	73
3.3.2. Neqilkirina ji Devê Jinê	76
3.3.3. Levvegerandina Jin û Mêr	78
3.3.4. Çîrokbêjîya Kilamê.....	79
3.4. Mijar û Naverokên Berheman.....	81
3.4.1. Welat û Têkoşîna Neteweyî.....	82
3.4.2. Şer û Mêrxasî.....	83
3.4.3. Şîn û Zêmar	85

3.4.4. Xerîbî û Xurbet û Eskerî.....	87
3.4.5. Hepisxane û Zindan	88
3.4.6. Evîndarî	88
3.5. Di Berhemên wî de Hêmanên Bawerîyên Gelêrî û Olî.....	92
3.6. Di Berhemên wî de Hêman û Şêweyên Vegotinê.....	93
ENCAM	96
ÇAVKANÎ	98
PÊVEK 1: Lîsteya Nav û Çavkanîyên Berhemên Mihemed Arif Cizîrî.....	104
PÊVEK 2: Çend Mînak ji Kilam û Stranên Mihemed Arif Cizîrî	114

KURTEBÊJE

alk.	: Alîkar
amd.	: Amadekar
B.Z.	: Berî Zayînê
c.	: Cîld
ç.	: Çap
deş.	: Deşîfrekirin
drk. jgr.	: Dîroka jêgirtinê
h.	: Hejmar
h.b.	: Heman berhem
hwd.	: Her wekî din
P.Z.	: Piştî Zayînê
r.	: Rûpel
wer.	: Wergêr
weş.	: Weşanxane

DESTPÊK

Berîya naverok û mijarên vê tezê dîyar bibin, di destpêkê de lêhûrbûn û vekolîn li ser têgihîştina etnomuzîkolojîyê hat kirin û li ser wê bingehê hin nîşe hatin girtin. Bi lêkirina rîknên sereke yê li ser etnomuzîkolojîyê re piştî demekê min biryar da ku dengbêjekî hildim dest û di nav van xwendinên xwe de vekolînekê li serê bikim. Cizîra Botan a ku min temenê xwe lê derbas kirî û gelek hîmên çand û zimanê Kurdî li min zêde kirî û ez gihandî, ji hêla reng û xweserîyên çand û zimanî de zemîneke têr û tije pêşkêşî min dikir. Li ser vê bingehê min biryar da ku Mihemed Arif Cizîrî yê ku ji alîyê hemû gelê Kurd ve baş tê zanîn û banborên wî li gelek nifşan bûyî, hildim dest û li ser hemû berhem û xweserîyên hunera wî vekolîneke berfireh bibim serî. Ji bo vê yekê jî çî tomar û dengê Mihemed Arif Cizîrî yê heyî û hemû pêzanîn û daneyên devkî, nivîskî û dîtbarî yê derbarê wî de heta ji dest hatî li hev hatine civandin û derbarê wî de arşîveke dijîtal weke dosyayekê hatîye amadekirin. Li ser hemû berhemên wî yê bi awayekî rêkûpêk lîsteya wan hatî derxistin, dest bi deşîfrasyona hunera wî hat kirin. Di ber deşîfrekirinê re nîşe û xalên balkêş û xweserê wî, li alîyekî hatin nivîsîn û ji wan nîşeyan beş û binbeşên tezê dîyar bûn. Di nav van nîşeyan de taybetmendiyên wî û hunera wî yê hêjayî gotinê, bûn rîknên sereke yê vê tezê û bi vî awayî tez ber bi teşeyekî kemilî ve hat.

Her wiha di dawîyê de 240 berhemên Mihemed Arif bi awayekî deşîfrekirî û gelek versiyon û varyantên din ên stran û kilamên wî hê jî li ber deşîfrekirinê li ber dest in. Mebesteke din jî piştî vê tezê weke xebateke antolojîk a Mihemed Arif Cizîrî di demên pêş de bi awayekî berfirehkirî bê pêşkêşkirin. Ji ber ku pêşkêşkirina hemû berhemên wî yê nivîskî dê gelek cih bigire, ji bo xebatê dê qîm pê anîn ku bi tenê desteyek berhemên wî yê deşîfrekirî di pêvekê de bîn pêşkêşkirin û li gel lîsteya navên hemû berhemên wî çavkanî û lînkên stran û kilaman bîn destnîşankirin.

Berîya em ber bi vê tezê de biqedimin, ji bo rêbaza zanistî pêdivîya me pê heye di destpêkê de pirs, armanc, girîngî û sînorê vekolînê bê dîyarkirin. Da ku çarçoveya sedem û encamê eşkeretir derkeve holê û bersivên pirsan zelaltir bin, pêdivîya me ya sereke dê daneyên şênber û rêbazên zanistî bin.

Mijar û Pirsgirêk

Di warê tesnîf û strandardên tegêhî yên dengbêjîyê de xebat û pêşniyarên zanistî yên cuda hatine kirin. Her wiha aliyên dengbêjîyê yên wekî dabeşkirina cure û teşeyên wê bûye mijara lêkolîn û vekolînan. Ji bilî van, hêla vegotinê ya dengbêjîyê bûye mijara gelek xebatên akademîk û çandî. Hetta wekî rîknê sereke yê edebiyata Kurdî, cihê dengbêjîyê taybet hatîye destnîşankirin. Wekî qada edebiyata devkî ne zêde be jî ji aliyê muzîkolojîyê ve hatîye nirxandin û vekolandin. Lê em dikarin bibêjin ku nirxandina dengbêjîyê di bin banê etnomuzîkolojîyê de babeteke nû û beyar e. Li gel vê yekê di çarçoveya etnomuzîkolojîk de heta niha bi Kurdî xebat qet nîn in. Mihemed Arif Cizîrî ku heta niha lêkolîn û vekolînen derbarê wî de hatî kirin bi zêdebarî li ser jîyan û serborîya wî ne. Em dikarin bibêjin ji hêla etnomuzîkolojîk ve nehatîye nirxandin. Dê mijara bingehîn a vê tezê li ser etnomuzîkolojî û girêdayî wê jî bi giştî li ser huner û hêmanên hunermendîya Mihemed Arif Cizîrî be.

Armanç û Girîngî

Dema ji aliyê etnomuzîlojîk ve mirov li muzîka Kurdî dinêre, tê dîtîn ku berhemên hunera dengbêjîyê têkdarî taybetmendiyên Kurdan ên weke sosyolojîk û etnolojîk in ku têgihîştin û watedarîyên wê bo civak û neteweyeke din ne hêsan e. Bêyî ku taybetmendiyên sosyolojîk, erdnîgarî û li gel van bindestî, xizanî û pirsgirêkên dîtir ên neteweya Kurd bên zanîn, muzîka Kurdî nikare bi berfirehî bê naskirin û famkirin. Ji vî alî ve pêdivî pê heye ku hunera Kurdî, bi taybetî dengbêjî û stranbêjî bi rêbazên zanistî bê nirxandin, vekolandin û tesnîfkirin. Di vê çarçoveyê de Mihemed Arif Cizîrîyê ku nimûneyeke mişt bi stran û kilamên etnîk û folklorîk ên Kurdî, wekî barkêşekî mûzîka Kurdî, li ser rista wî ya berhevkarî û berdevkîya wî ya mûzîkê û bi giştî bi çawanîya jîyan û berhemên xwe hêjayî nirxandineke etnomuzîkolojîk e.

Rêbaz

Di vê vekolîne de hewldana me ya destpêkê wê li ser nasandina dengbêjî, muzîk, etnomuzîkolojî û xwesarîyên wan be. Ji bo vê yekê sûd ji kitêbên lêkolînî yên

li ser folklor, dengbêjî, muzîk, etnomuzîkolojîyê hatîye wergirtin. Li ser vê bingehe dê nêrînek li ser jîyana Mihemed Arif Cizîrî û têsîra jîyanê ya li ser hunera wî kirin. Li gel vê yekê dê hewl bê dayîn ku bi nêrîneke etnomuzîkolojîk, şêwe û taybetmendîyê dengbêjî û stranbêjîya wî û têsîra wî ya serdemekê di nav hunera Kurdî de bê destnîşankirin. Her wiha ji bo serwextbûna hunera Mihemed Arif Cizîrî divê em berê xwe bidin kitekitên nav stran û kilamên wî. Di nav wan kitekitan de kod û motîfên etnîk û çandî tesbît bikin û taybetmendîyên wan darîçav bikin. Ji bo ev yek bi berfirehî were kirin 130 kilamên bêrîtm û 110 stranên rîtmîk ên Mihemed Arif Cizîrî ji torên civakî û ji arşîvkeran hatin berhevkerin û bi giştî 240 berhem û varyantên wan hatin deşîfrekirin. Ji wan deşîfreyan li gel kod, motîf, newayên stran û kilaman; daneyên çandî, civakî, dîrokî û her cure taybetmendîyên hunerî hatin notkirin û li ser wan notan dê teza me bê lêkirin. Her wiha ji her cure daneyên nivîskî, devkî, dîtbarî û dijîtal heta ji dest hatî agahîyên berfireh li ser Mihemed Arif û hunera wî hatin berhevkerin. Li ser van daneyan em ê hewl bidin xebata xwe pêşkêş bikin.

BEŞA YEKEMÎN

1. ÇARÇOVEYA TEORÎK Î TÊGEHÊN SEREKE

Ji bo vekolîna me bi berfirehî bê kirin, têkildarî mijarê, di serî de dê bingeh û riknên xebatê yên teorîk û têgehên sereke bîn pênasekirin û nirxandin. Di vê beşê de dê çarçoveya etnomuzîkolojîyê; têkildarî nirxandin û şîroveyên li ser çand, muzîk, civaknasî, etnolojî, muzîkolojîyê de hewldana vekolînê bê kirin. Nexasim etnomuzîkolojîya ku berîya niha wekî rêbaz di xebatên Kurdî de zêde nehatîye bikaranîn pêdivî pê heye bi awayekî dorfireh bê destnîşankirin û dîyarkirin.

1.1. Çand

Dîroka çandê û pênasekirina wê bi qasî dîroka mirovahîyê dûr û dirêj e. Heta weke îro jî qebîlîyeta têgihîştina mirovan li pey watedarkirin û pênaseyên nû ye. Taybetmendîyên ku mirov çawa difikire, dibihîze, dike, dixwaze; xwe çawa dibîne; hebûna xwe û ya kesên din çawa dibîne; çawa nirx û daxwazên xwe saz dike û pêdivîya maddî û manewî çawa pêk tîne, hêmanên çandê ne. Ji ber wê yekê jî mirov bi hêsanî nikare li ser yek wateya têgeha çandê li hev bike. Lê weke dîsîplîneke zanista jîyanê di vê binbeşê de pêdivîya me pê heye ku em cih bidin çend pênaseyên hevpar û cihêreng. Peyva 'Cultura'ê bi Latînî tê wateya '*cotkirina erd*' û di Kurdî de weke '*çand*', carinan weke '*kultur*' jî tê bikaranîn. Çand, bi giştî di bin sê beşan de tê dabeşkirin: Çanda devkî, çanda nivîskî, çanda elektronîk.

Bi pênaseyeke xwerû çand, pevgihana hemû nirxên civakekê ye ku bi hîskirin û hizrî tê pejirandin. Ev têgeh di seranserê serborîyên dîrokî yên mirovan de, xwe dispêre hemû nirxên madî û manewî yên hatî afirandin. Çand bi Voltaireyî re derdikeve derveyî wateya çandinîyê û wekî pêkhatin û gihandina zekaya mirovan tê nirxandin.¹

¹ Abidin Parilti, *Sözün Yazgısı Dengbêjler*, İthaki Yayınları, 2006, r. 13.

Çand, ji destpêka jidayîkbûnê ve, hemû zanyarîyên bihemd an jî bêhemd ên me bi dest xistî, ên me ew bi cih anî, ên me ew navxweyî kirî ne. Ev zanyarî bi tevgerên me û bi alav û amûrên me çêkirî tên nîşandayîn. Bi van zanyarîyan em tevgerên mirovan şîrove dikin, piştî şîrovekirinê jî li gor wê em awayekî tevgerê saz dikin. Mc. Gregor jî çandê ne weke berhem lê weke pêvajoyekê dide destnîşankirin. Li gorî wî çand çalakîyek e ku berdewam dike. Bi wê hin mirov, di hin serdeman de dixwazin bi wateya jîyana xwe tê bigihêjin û bi wê jîyana xwe bixin nav rêkûpêkîyekê de.²

Çand, fêrbûnî û hestpêkirina mirovan a afirandî ye ku li dor xwe dînamîzmek hiştî û li ser şêwe û berhemên şeweya jîyana derdor, girse, civakê hwd şopên madî û menewî yên li ser raborî û siberojeke teheyulkirî ava kirî ye.

1.1.1. Çanda Devkî di nav Kurdan de

Çanda devkî bi awayekî dîyar, di nav hemû civakan de, li gorî pêdivîyên rojane ji destpêka dan û satandina axaftinê ya mirovan ve hebûna xwe diparêze. Her civak li gor xwe hin taybetmendîyên çanda devkî di nav xwe de dihundirîne. Pariltî bi van tesbîtan qala taybetmendîya çanda devkî dike: *Çanda devkî, ji axaftina rojane û hafîzeyaya hevpar a dîrokî pêk tê ku ji hêla kesên ji nivîs û çapxanê ne haydar, ku haydar be jî yên ku wê bi kar naynin û wê pir di jîyana xwe de bi cih nakin ve tê avakirin.*³ Li gorî vê yekê ji ber gelek sedemên wekî erdnîgarî, civakî, çanda devkî ya Kurdan di nav dînamîzmekê de tim li xwe zêde kirîye û gihiştîye heta îro.

Bi taybetî di serdemên nêzîk de dema redkirina nasnameya Kurdan, asîmîlasyon, pêkutî li hesab bîna zêdekirin, tê dîtîn çanda devkî wekî bîngeha hafîzeyaya civakî, zindîbûna xwe parastîye û hema bêje li hemû erdnîgarîyên ku Kurd lê jîyane, wekî metodeke veguhestin û kodkirina kitekitên jîyanê ya bibandor, bi awayekî xwezayî hatîye pejirandin û pêşxistin. Di vê babetê de Jan Assmann wisa dinirxîne: *Hêza neqîlkirina dîroka devkî ya bi komên têkildarî bi wan xwe re, ji belgeyên nivîskî zêdetir e. Ev yek amûra herî bandorker a koman e, ji ber ku bûyerên*

² Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 22.

³ Abidin Pariltî, *Sözün Yazgısı Dengbêjler*, İthaki Yayınları, 2006, r. 18.

“*yekîtî û hişmendîya resenîya xwe*” *vedibêjin*.⁴ Çandên desthilatdar di meyla avakirina dewletan û navendîkirina wê de ne. Ji ber vê egerê zext û zor bivê nevé derdikeve holê. Di nav şert û mercên zextê de bibîranîn şewekî berxwedanê ye. Ji ber vê yekê jî desthilatdarî rêyên jibîrkirinê jî wekî sistematîk diceribîne.⁵ Ji ber van sedeman çanda devkî wekî rêbazeke bibîranînê, hêj jî germbûn û bandordarîya xwe di nav Kurdan de diparêze.

Jîyana Kurdan ku zêdetir bi vegotinên devkî xwe nîşan dide, bi awayekî sirûştî û di nav pîvanên resen de ev vegotin bi gelek cureyên cihê bûne berhemên hunerî. Nexasim ji bo vegotin mayînde û hêsan bibe, hêmanên melodîk li gotinan hatine ristîn û cureyên cihêreng ên muzîkê jî derketine holê. Ev cureyên muzîkê ku çanda devkî di nava xwe de dihewînin li gor her vebêjekî dibe xwedî rengê resen. Her wiha bi veguhestina li herêmanê cuda yên van hêmanên devkî re gelek hêmanên din ên folklorîk jê dizên. Di serê van de dengbêjî wekî hêmaneke darîçav a çanda devkî ya Kurdan derketîye. Di nav hunera dengbêjîyê de her cureyên vegotinê ji xwe re cihek peyda kirîye û wê li her herêm û deverê cihêrengî û sîwana xwe berfireh kirîye ku em dikarin bi rehetî bibêjin dengbêjî rîknê sereke yê çanda Kurdî ye û ev huner tenê ne rêbazeke vegotinê di heman heqîqeta jîyana Kurdan di nava xwe de dihewîne.

1.2. Dengbêjî û Taybetmendiyên wê

Dengbêj û dengbêjî xususiyeteke çanda Kurdan e, alîyên wê yên hunerî yên wekî mûzîk, edebîyat û şanoyê hene ku gelek cure û teşeyên wê bi norm û rêbazên modern di van salên dawîn de nû tîne vekolandin û şîrovekirin. Ji alîyê hunerî ve li ser senifandina dengbêjîyê hê jî nîqaş û nîrxandinên cihêreng tîne meşandin, di qada akamedîk de hewldana nêrîn û nîrxandinên zanistî tîne kirin. Di peywenda çanda devkî de nîqaşên derbarê dengbêjîyê de têra xwe dewlemend in. Di nav xebatên folklorê de, dengbêjîyê ji xwe re qadeke berfireh peyda kirîye û her ku diçe ji hêla berhevkerin û senifandinê ev qad geş û xurttir dibe. Hetta mirov dikare bibêje ku di nav nîqaşên pênasekirina dengbêjîyê de tîgihîştina “folklorî” serwer e. Sazûmanîya dengbêjîyê bi piranî bi folklorê Kurdan re yeksan tîne nîrxandin. Ev nîrxandin rol û

⁴ Jan Assmann, *Kültürel Bellek*, wer. Ayşe Tekin, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2001, r. 69.

⁵ h.b. 73.

mîsyona dengbêjîyê bi awayekî zelal destnîşan dikin ku barê çanda devkî û folklorê Kurdan bi piranî li ser piştê dengbêjan e. Ji ber ku afirînerê dengbêjîyê dengbêj bi xwe ne, ji bo her yek ji van têgehên pêwîst nake ku pênasîyê cuda bê kirin. Li jêr bi destnîşankirina rolên dengbêj, naveroka dengbêjîyê jî jixwe bi awayekî xwezayî tê dîyarîkirin.

Peyva dengbêjîyê bi binyada xwe Kurdî ye ku ji ‘deng’(sewt) û ‘bêj’ê(gotin) pêk tê. Ango dengbêj têgeheke ku hostatîya ‘deng’ û ‘gotin’ê îfade dike. Dengbêj, kesê ku çand û dîrokê bi carinan bi şewaza dengên melodîk, carinan li gor meqamekî taybet dibêje, carinan bi hunereke wêjeyî radigihîne derdor an jî girseyekê. Dengbêj jî qada berhem û xebata dengbêj dîyar dike. Dengbêj li ser sêkuçka muzîk, gotin (metn) û deng ava dibe û xwe sistematîze dike. Di binbeşên pêş de em dê hewl bidin ji hêla etnomuzîkolojîyê ve jî nirxandinekê li serê bikin.

Ji ber ku dengbêj li gorî pîvanên civaka xwe dijî, bi hemû pîrsgirêkên civakê re bivê nevē têkildar e. Li gor vê yeke gelek çaran dengbêj dibe berdevkê bawerî, daxwaz û ramanên civaka xwe angê dibe qasidê di navbera civakên cihê de. Bi gotîneke din dengbêj di nav civakên cihê de wekî pîrekê rîsta hevparî û parvekirinê maddî û manewî dikin, ji pîvan û peymanên civakî re şahidî û wekîltîyê dikin, carinan bi afirînerîya xwe rêyeke nû ji civaka xwe vedikin û rola xwe ya rewşenbîrîyê jî pêk tînin. Li gel van taybetmendîyan xebata komkirin û berhevkirina berhemên çandê dikin. Li ser vê yekê ev nirxandina *Nezan* hêjayî destnîşankirinê ye: *Dengbêj bi ger û hunera xwe, welatê Kurdan ji serîyekî heya serîyê din daye hev û bi vî awayî di pêşketina çanda Kurdî ya netewî de roleke aktîf hildaye ser milê xwe. Her weha bi xwe jî afirîner, helbestvan û bestekar e.*⁶

Di gihîştin û kemilandina çand, ziman û hunera Kurdan a heta îro de cihê dengbêj û kilamên wan gelekî girîng in. Di heman demê de kilam nîşaneyê dîrok û hebûn û taybetmendîyê Kurdan e. Ji ber ku zimanê Kurdî di serdemên cuda de gelekî çaran qedexê bû, Kurdan bêrî û hesreta zimanê xwe li nawayên dengbêjî ristîne. Di newayan de tenê ne ravekirinê bûyeran, serdanpê hemû kitekitên jîyanê tê de veşartî ne. Zimanekî ku rêbêzên nivîsandinê bi dest nexistî, ji bo xwe biparêze

⁶ Kendal Nezan, *Kürt Müziği*, Avesta Yayınları, İstanbul, 1996, r. 12.

bi mecbûrî di bîr û hişê dengbêjan de ji bo mayîndebûnê rêbazek ji xwe re hilbijartîye. Bi taybetî dengbêjên gerok û derwêş bi gera xwe; çand û hunera Kurdan ji herêmekê gihandine herêmeke din an jî li seranserê welêt ev barkêşî kirine û ji nifşekî derbasî nifşekî din kirine.

Dengbêj ew kes in ku bi giranî xwendin û nivîsandina wan nîn e, bi çand û kevneşopî û nakokîyên civaka ku tê de dijîn baş dizanin, xwedîyê bîreke xurt in, xwedîyê wê behremendîyê ne ku dema teşeyê didin gotin û dengê xwe, dikarin wan estetîteze bikin û çîrokên gelêrî yên Kurdan bi newayekê distrên; hin caran jî dengbêj; ew cure bêjer û vebêjer in ku vê hunera xwe di demeke dîyarkirî de bi amûrên muzîkê re li pêşberî komeke guhdar pêşkêş dikin. Dengbêj bi awayekî etîmolojîk hem deng hem jî gotinê di nava xwe de dihewîne; bi qasî ku bi gotinê re têkildar e, bi dangan re jî bi awayekî xurt têkildar e. Lewre çîrokên Kurdan di heman demê de stran, kilam û nawayên Kurdan in.

Ji ber ku Kurd demeke dirêj e ku ji desthilatîyê bêpar mane rastî zilm û zora serdestan hatine. Eşkerekirina hest û ramanên wan hatîye qedexekirin. Di ser de jî hin sedemên wekî nezanî û paşdemayîne jî rê li ber azadîya ramanê teng kirine. Kurdan jî hest, rexne, êş, bertek û gazine xwe bi rêya muzîkê destnîşan kirine.⁷ Di hemû van hêst û ramanan de dengbêjî bi awayekî rêkûpêk derketîye holê, dengbêj jî bûne aktorên vê hunerê.

1.2.1. Zimanê Dengbêjîyê

Taybetmendîyeke dengbêjîyê ya sereke ji ber ku berhemên wê malê çanda devkî ne, jê re qebîlyeteke vegotinê ya xurt divê. Bi gotineke din dengbêjek çî qasî di nav çanda devkî de be, divê ew qas ji çanda xwendin û nivîsandinê dûr be. Hetta bi awayekî xwezayî dikare bê gotin ku xwendin û nivîsandin ji ber ku hiş û bîra dengbêj teral dike, nezanîna çanda nivîskî yek ji hêmayên sereke yên dengbêjîyê ye. Li ser vê yeke Pariltî di pênaseya denbêjîyê de wisa qalê dike: *Dengbêj ew kesên vegêr in ku bi giştî xwendin û nivîsandinê nizanin, bi taybetîyên çanda devkî xwe gihandî; ên kevneşopî, nakokî û şert û mercên civaka ku lê dijîn başbaş dizanin. Yên*

⁷ Tekin Çiftçi, *Di Kilamên Evînî Yên Dengbêjan De Temaya Jinê*, Teza Lîsansa Bilind a Zanîngeha Mardin Artukluyê, Mêrdîn, 2013, r. II.

*xwedî bîr û hafizeyeke xurt, ên teşeyî didin deng û gotinê û wan estetîze dikin, ên çîrokan bi awayê newayan distrên û wan bo guhdaran îcra dikin.*⁸ Têkildarî mijara me, li gorî hemû zanyarîyan tu peywendîya Mihemed Arif bi nivîsê re çênebûye. Beşîr Ant bi vî rengî destnîşan dike: *Mihemed Arif tu mekteb û medrese nexwendine. Xwendin û nivîsandina wî jî nîn e. Bi Soranî jî gelek caran strandîye. Her çî qas di peyîvînê de, di dirêjkirina sohbetê de carinan ne gelek jêhatî be jî salixdan û teswîrên wî pir xurt in. Kurmancîya wî xurt û xurî ye.*⁹ Bi kurtasî mirov pê derdixe ku çî qas nivîs tune be ew qas hêza bilêvkirina zimên di dengbêjîyê de xurt dibe.

Her çendî di nav civakên Kurd de zarave û devokên gelekî ji hev cihê hebin jî hev girtina zimên a di kilamên dengbêjan de, pêkan kirîye ku kilam di erdnîgarîyên berfireh de bî guhdarkirin û zanîn. Çîrokên dengbêjan, metnên muzîkan; xwedîyê naverokên cihêreng ên ji nava civak û çandê ne û hetta civak û çand bi van ava dibin. Dengbêj ew kes in ku çavkanîyên ramanî yê ji serdemên kevn tîkelî nav kilamê xwe dikin.¹⁰ Dengbêj bûyer û hêmanên kilamê tenê ji ber nakin û wan bi awayekî jiberkirî venaguhêzin; di heman demê de xwemalîyên serdema tê de, rengê civaka heyî, serborîyên xwe, raman û hespêkirinên xwe, bi deng û sewta xwe ya resen jî tîkelî malê gelêrî dikin û berhemên gelêrî ji nû ve diafirînin û li gor teghiştina civakê wan amade û pêşkêş dikin. Dema bi baldarî mirov dêhna xwe dide zimanê ku dengbêj bi kar tînin, tê dîtin ku ji bo tîgihîştin û hêsankirinê, dengbêj li gel gotin û peyvên resenê ên kilamê; peyv, gotin û hêmanên din ên herêmî jî weke xurtkirin û rojanekirina kilamê bi kar tîne. Têkildarî bikaranîna zimên a dengbêjan mirov bi hêsanî dikare bibîne ku dengbêj hostayên zimên in. Dengbêj bi tenê ne bi devoka gund, eşîr, êl û bajarê xwe; di heman demê de serwextên dîyalekt, devok û zaraveyên din ên Kurdî ne jî. Mirov dikare bibêje ku dengbêj hemû berhemên çandên cuda yê erdnîgarîyan kom dikin û ji ber dikin û di nav berhemên xwe de bi cih dikin. Vê yekê jî sudeke gelekî nirxdar ji bo strandarkirin û hev girtina zimanê Kurdî kirîye. Bi saya vê berhevkarîya dengbêjan a hêl û hêzên zimên tîkelî hev dikin û civakek ji civakeke din haydar dibe û tîkelîyên civakan ên li gel hev xurt dibin. Bo mînak li herêma Botanê peyva “kundir” nayê bikaranîn, di dewsa wê de “kulind” tê gotin. Strana

⁸ Abidin Parıltı, *Sözün Yazgısı Dengbêjler*, İthaki Yayınları, 2006, r. 6

⁹ Beşîr Ant, *Bilbilê Kurdistanê Mihemed Arif Cizîrî*, weş. Ba, Stenbol, 2012, r. 63.

¹⁰ Besime Şen, *Devlet Piyasa Partî (Nizamettin Ariç ve Kürt Müziği)*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2016, r. 51.

gelêrî ya “Kundirê Mîrani” ya herêma Tor û Omerîyan ku bi saya strîna Mihemed Arif Cizîrî li herêmên Botan û Behdînanê jî ev stran hatîye zanîn. Bi guhdarîkirina vê stranê rîtm, newa, peyv û hemû kitekitên stranê li van herêman jî bi cih dibin û bi saya hêla veguhêzerîyê ya dengbêj, civak bi ser cîyawazîyên hev ve dibin û di navbera civakan de hevgirtina ziman û çandê ava dibe. Bi kurtasî mirov dikare bibêje; di serdemên ku amûrên ragihandinê neyî de dengbêjan hêman û hêlên cîyawaz ên zimên kom kirine û bûne pevgihîner û veguhêzerên zimanê Kurdî. Ji vî alî ve dengbêj ji bo civaka Kurd a di serdema modern de ji perwerdehîyên nivîskî yê zimanê xwe bêpar mayî de standart û orjîneke zimanî ava kirine û rista pêşengîya pêşxistin û berfirehkirina zimanî jî lîstine.

1.2.2. Dînamîzma Dengbêjîyê

Wekî hemû heyberan têkildarî hêmanên manewî jî çand û huner tim di nav dînamîzmekê de û guherînan li xwe zêde dikin an jî ji xwe kêr dikin. Huner ji serdemên ewilîn ên mirovan ew derxistî û heta weke vê kêlîkê di nav guherînan de ye û li gorî dem û mekan û kesayetîyan ev guherîn bivênevêyek e. Di vî warî de wekî hunerekê dema em dengbêjîyê hildin dest dê dengbêjîya tu heyam û devara ji derveyî rûdanên dîrokî nekare were nirxandin. Di dawîyê de hunerên her serdemê, her çend şibandînen bi giştî û hevparîyên wan hebin jî dê bi tu awayî her huner ji bo her serdemê nekare yeksan bê dîtin.

Têkilîyên gelên din ên ku ew û Kurd bi hev re jîyane, ji bo mijara me ya hevbendorîya li ser hunerê xalên pêwîst in ku li serê bê rawestin. Lewre ev têkilî li ser tevna çandê ya erdnîgarîya Kurd lê dijîn, bandorên mezin hiştine. Li vê erdnîgarîyê pevrejîyîna neteweyên Kurd, Erebi, Farsi, Tirkmen, Ermenî, Suryanî, Tirk û bawerîyên wekî Xiristîyanî, Misilmanî, Êzdayetî û Cihûyan danûstandina çandê kirine û wekî gelek waran ji hêla muzîkê ve jî hin hevbendorî çêbûne. Li herêmê çandên serdest bi demê re çandên mînor şibandine xwe. Her çawa şibandibin xwe jî çandên serdest jî ji van çandan dermale bûne. Ev hevbendorî gelek caran jî bi şeweyên asîmîlasyon û entegrasyonê bi destê dewletên desthilatdar pêk hatine. Hin caran jî bi çandên serdest ên di nav civakan de pêk hatine. Her çawa be ev pevbendorî bi deq û kodên xwe yê newayî, rîtmî, wateyî û hemû dîyardeyên çandî

yên di nav berhemên folklorîk û muzîkê de xwe nîşan didin. Ev dîyarde rasterast bi dînamîzma jîyanê re têkildar in ku dengbêjî jî di nav vê dînamîzmê de teşe digire.

Tevgerên bi gotinên newayî pêk tên, naverokên wan, qadên bikaranîna muzîkê, bikêrbûna wan, hêza wan a sembolîk, dîroka muzîkê ya têkildarî dîroka çandê, bestekar û jîyana wan, rêjeyên guherbarîya çand û muzîkê û hwd mijar ji bo hevşengîya çand-muzîkê divê pev re bîn nirxandin. Muzîka ku yek ji hêmanên cîyawaz ên pergala çandê ye, bi sazîyên din ên çandê re di nav hevkarîyeke xurt de ye. Guhertina yek ji van hêmanan, bandorê li hemû hêmanên din ên çandê û muzîkê jî dike.¹¹ Bo mînak piştî elektrîk hatî gundekî û pê re alavên pê dixebitin ketî nav malê û muzîka ku ji radyoyê ya yek ji van alavan e bê guhdarkirin, bi demê re şevbêrk û şewêyê guhdarkirina muzîkê jê bibandor dibe. Repertuarên ji vê radyoyê jî di nav wê malê de bi cih dibin û bandora terz û stîlên din li newayên ferbûyî yên vê malê zêde dibin. An jî weke ku di kilama “*Têlî*” ya “*Huseynê Farê*” de derfetên serdemî pêk hatibin û belkî cara yekemîn di kilama wî de enstrumanên weke girnate, keman hatibin bikaranîn û teşeya dengbêjîya wî di nav wê çandê de tiştin li xwe zêde kiribin. Her wiha vedîtineke sedsala bîstan ji bo serwextbûna teşbîhên xweşîkbûnê mînakên aktuel ji zimanekî serdestan derbas ser zimanê rojane bûyî, dikare ji têgihîştina dengbêj binizile û xwe di nava risteke kilamê de wekî “*gaz ocaxîyên ceylanlı*” bi cih bike û ev yek bandorê li vegotina dengbêjîyê bike û bi van mînakên hûrik berhem bibe xwedî pergal û varyanteke din. Wekî din bi fêrbûna Tirkî ya Mihemed Arif Cizîrî re ji nav newayên straneke Tirkî bi hemdê xwe an bê hemdê xwe di nav stranên wî de bi cih bibe û newaya strana Tirkî “*Yürü yavrum yürü*” ji bo gotinên strana “*Kela Asîna*” ya Mihemed Arif bibe newayek. Hemû ev hêmanên dînamîk di nav çandê de kêlî bi kêlî guherînan pêk tînin ku encamên wê di nav muzîka wê çandê de bi awayekî şênber û veşartî xwe didin der. Wê çaxê her hêman û dîyardeya ketî nav çandê û jê derketî an jî bandor li ser çandê kirî, bi awayekî têkildarî xweserbûn û rengînîya wê çandê ne.

Bi awayekî giştî ger em li dor wêfên dengbêjîyê rawestin; dengbêj gotinê vedijîne; nirx, raman û hestên civakê bi efsûna peyvên ku hunera xwe pê jîyandî dixemilîne û ji serdem, mekan û derdorekê, radigihîne serdem û mekan û derdoreke

¹¹ Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 24.

din. Dema vê yekê dike jî bûyeran bi trajedî, xem, şahî û hezkirinên wan dihûne, bi rîtm û melodîyan dixemilîne, bi sira muzîkê teşeyî dide wan û wan vediguhêze bo dem û serdemên din.

1.2.3. Stranên Gelêrî

Stranên gelêrî bi piranî bi awayekî hevpar tên afirandin, ji serdema hatî afirandin û heta îro dijîn, li herêm û devara ku jê tê hezkirin li ser hev tên guhdarkirin û gotin. Bi piranî weke muzîkên anonîm tên pênamekirin. Ji stîl û pêkhatayên muzîkên gelêrî yên di nav çandê xwemalî de ava dibin. Stranên gelêrî, berhemên muzîkê yên civakê ne ku di naverok û teşeyê wan berhemên de şop û dewşên têgihîştin, îfade, rê û rêbaz û karakterîstîkên wê civakê yên di seranserê dîroka çandê de bi awayeke kod û motîfan derdikevin holê.

Stranên gelêrî daraz û nêrînên civakê yên derbarê jîyanê de di hundirîn. Nêrînên felsefî û nirxên madî û manewî yên komeke etno-çandî dihewînin ku ev nirxên rûniştî û kemilî yên ji serdemên dirêj ên dîrokî mayî bi form û teşeyên xusûsî wê civakê li xwe zêde dikin û belav dibin û ji serdemên kevnar digihêjin serdemên ayende. Stranên gelêrî gelek zanîn û agahîyên derheqê çandê de carinan bi awayekî kompakt û tîr, carinan bi awayekî saf û sade digihînin guhdar û stranbêjan. Di heman demê de pêzanînen gelekî girîng ên wek kodên etno-çandî û nasnameya muzîkal a civakî diparêzin û vediguhêzin bo siberojê. Mîrov dikare van form û daneyan; wek newa, amûrên muzîkê, rîtm, teşeyê gotinan destnîşan bike. Ev dane bi karakterîstîk û taybetmendiyên xwe carinan ji hev cihê dibin carinan jî ji ber dîroka hevpar, erdnîgarîyên nêzî hev bi ser çandên din ve jî diçin û nêzî hev dibin. Her çendî ji hev cihê bin an jî bişibin hev jî rewşa wan a “yekane” bi awayekî xwe dide dîyarkirinê.¹²

Stranên gelêrî ew qas hêsan in ku piranîya gel ji wan fêhm dike. Newayên wan rêkûpêk û rûniştî ne. Lê belê bikaranîna weznê di piranîya wan de ne rast e. Her wiha piranîya wan bi heman newayê nayên strîn. Bo mînak straneke li herêma Botanê ya bi gotin û newayeke dîyar tê strîn dibe ku li herêma Behdînanê hin guherîn lê bibin. Ji serdemên kevnar heta îro sebaba bingehîn a bandordariya wateya stranê

¹² Sibel Paşaoğlu, Müzikal Kimlik Oluşumu ve Kültürel Aidiyet Duygusu Gelişiminde Geleneksel Müzikler, *İzmir Ulusal Müzik Sempozyumu Bildiriler Kitabı*, İzmir, 2010, r. 172.

ya ku nehêlîştîye ew winda bibe, domdarîya gotin û vegotina stranê ya ji do heta îro ye ku xwe digihînin hev. Di vir de çemê stranê bêyî astengî diherike û rêya xwe dibîne. Ev herikîn ne bi nivîs û çapê lê bi vegotina navgînîya zimên ji herêmekê digihêje herêmeke din. Heke em bizanin bê çima stranek weke xwe namîne û diguhere jî gelek sedemên vê hene. Nivîskar û helbestkar *Xelîl Duhokî* van xalan wisa dîyar dike:

- a) Ji ber ku stran ne nivîskî lê bi devkî belav dibe weke xwe namîne, rasta nêzîkahîyên curbicur ên mirovan tê.
- b) Dema gel hest bi stranê dike, çend gotin û rêz têrî hestên serdem û devera wî nake. Wê demê jî gel li gorî xwe bi zanebûn dikare di nava stranê de guherînan bike û hin girîftan derdixe holê da li gorî jîyana xwe saz bike.
- c) Gelek caran dibe ku beşeke stranê jê qut bibe û bikeve nav straneke din. Ji ber vê yekê mirov nikare bibêje di stranên folklorîk de divê yekbûna mijarê ya weke helbesta îroyîn hebe. Ji ber ku di navbera her duyan de hem ji aliyê mijarê ve hem jî ji aliyê formatê de cudabûnên mezin hene.
- d) Stranbêj û îcrakerên stranan gotin û newayan di stranan de hin guherînan çêdikin. Ji ber ku ew dihizirin ku destkarî û guherîn, stranê berz û xurt dikin û bi vê yekê bêhtir xizmetî gel dikin. Ev guherîn nabin asteng ji bo stran bê ragihandin.¹³

1.3. Muzîk

Peyva muzîkê ji ‘*musîkî*’ya ku bi binyada xwe ji zimanê Yewnanî tê û her netewe vê peyvê bi şeweyên cihê bi lêv dikin. Tesbît û nirxandinên dûvdirêj li ser binyada muzîkê hene lê ji ber ku babeta me ya sereke ne ev e, bi tenê em ê qîma xwe pê bînin ku jê re pênaseyeke giştî bikin, ji bo vê jî pêdivî pê heye ji çend nêrînên çavkanîyên cuda hin jêderkan rêz bikin.

Şopandina li dû etîmolojîya muzîkê bi xwe jî bi şeweyê çand û şaristanîyeke dîyarkirî berê me dide hêmanên etnomuzîkolojîk. Bêguman bi ragihandina teknolojîk li dor pênasekirinên hunerî û zanistî lihevkerinên lîteraturî yên giştî hene. Lê her çendîm peyva muzîkê niha li cîhanê bi giştî bê zanîn jî em pê dizanin ku hê gelek

¹³ Xelîl Duhokî, Folklorik Kürt Stranlarında Aşıkların Gamları, *İnatçı Bir Bahar*, edit. Vecdî Erbay, Ayrıntı yayınları, Stenbol, 2012, r. 266.

civak ji bo vê çalakîyê navên din jî bi kar tînin an jî di serdemên berê de bi kar anîne. Di civaka Kurdan a kevna de bi awayekî gelêrî mirov rasta binavkirina “muzîk”ê nayê. Bêtir ji bo çalakîyên ku hêman û rîtuêlên muzîkê tê de heyî -bi taybetî jî di serdemên berîya pêşketina ragihandinê- mirov li her herêmên cuda li rasta binavkirinên cîyawaz ên weke “*stran, kilam, goranî, lawik, bêlîte, çêrok, dengbêj, dilok* û hwd.” tê. Peyveke di şûna muzîkê bê bikaranîn a van hemû çalakîyên deng ên hunerî di nav xwe de bihewîne bi giştî tune ye. Ev yek bi serê xwe jî nîşan dide ku peyva “muzîk”ê li dor şaristanîyeke ku hemû civakan nahewîne derketîye holê. Wê çaxê heke ji bo serdemên berê em bi hûrgilî balê bidin serê her çalakîya civakekê ya bi dangan tê afirandin û pêşkêşkirin têkildarî pêdivî û sînoren wê civakê ne. Anku muzîk bi awayekî temirandî (embeddedness) di nav rîtuêl, çalakî, kar, dansên civaka Kurd de bi navên cuda cuda hatîye bikaranîn. Ji ber vê yekê jî binyada etîmolojîk a peyva “muzîk”ê, sêdeke bi giştî li têgihîştina çandên derveyî Rojava nake. Lê ji ber qada zanyarî û lihevkerin li serê hatî kirin, şêweyê têgihîştina muzîkê ya Rojavayîyan a bibandor pêdivî pê heye em qala hêl û hêzên wê yên sereke bikin.

Wekî gelek qadên derbarê jîyana civakî de tevgera muzîkê ku mirovan ew wekî bîo-psîko-sosyal derxistîye holê, heta roja me ya îro jî bi nêrîn û şîrovekirinên cihê tê nirxandin û pênasekirin. Hin pênasekirin di nava xwe de hevgerîbûnekê bihewînin jî têrê nake ku hêmana muzîkê bi awayekî dorfireh bide nasandin. Hin kesan muzîk bi hêla wê ya hêz, bikêrbûn, bandor, cihê wê yê di fêrkerinê de, alîyê wê yê civakî, gîyanê wê yê civakî û mirovî û bi taybetmendîyên van rengan ên derbarê mirovan de xwestine pênase bikin. Hin kesan ji hêla hunerî ve anku ji hêla deranîna afirandinê ve xwestine li serê rawestin. Bi gotineke din bi awayekî azad teşedayîn û gihiştina behreya zagon û nirxên navxweyî yên muzîkê û bi wan nirx û zagonan hewldana berzkerin û nemirkerina manewî ya mirovan karekî afirênerîya bingeîn e. Ev hêman nîşan dide ku muzîk hem weke hunerê hem jî weke zanistekê bê nirxadin.

Dema em muzîkê weke hunerekê hildin dest jî pêşî bi awayekî giştî divê em çavekî li hêl û taybetmendîyên hunerê bigerînin. Huner jî mîna zanînan berhemên hin nêrînan e. Ev berhem îfadeya pêwendîya di navbera obje (bireser) û suje (kirde) de ye. Pêwendîya di navbera obje û sujeyê de bi malzemeyên weke deng, reng, hecim û kutle, tevger (hereket) tînin vegotin. Mebesta hunerê bi van malzemeyan avakirina

tevgera tēghiştin, hizirandin, dîtina nepenî, hespêkirin, pejinandinên bi mirov re ye. Tiştê pēzanînên zanistî û pēzanînên hunerî ji hev cihê dike ew e ku huner tiştê ji heyîne wêdetir “niha-li vir” dide heyîkirin. Ev yek pêwendîyeke ku têkilîyeke nedomdar a demeke dîyar a di navbera suje û objeyê de ye. Huner tiştê tekane û bêhempa dixwaze, ji bo serwextbûna wê rêçikên giştî nade mirov. Divê her hunermend serwextî objeya xwe, malzemeyên xwe yên taybet, pêşkêşkirina xwe ya xweser be. Divê mirov hay jê hebe ku sujeyê (mirov) din a pêwendîya di navbera obje û sujeya heyî de, individualite (tekîfî) heye an na. Di qada hunerî de ya girîng ew e ku obje hûr û kûr bê fêhmkirin.¹⁴

Muzîk hunerek e an, şahînetek e an, zanistek e an, coşek e? Di dawîya sedsala 19’an de Littré, ew ji hêla rehenga armonîyê hilgirtîye dest û ji bo bi pênasekirina hevokazîyeke xwerû ya zanistî têkel bike, gotîye; “*zanista dengan a bi zîrektî hatî bikaranîn*”. Michel Serresî berovajî vê balê dikişîne ser ku muzîk; “*rewşa herî xwerû ya sînyalan*”, “*peyameke sînkirî, ragihana gerdûnî ya şîfrekirî*” ye û bi vê yekê bi bîr tîne ku muzîk, ji qurînîyê wêdetir veguhêzereke peyaman a ne girêdayî tu pergala e û “helwesteke dîyalektîk a li hemberê zemanî ye.” Ji ber ku ji bo em lê nefikirin bê zeman çî qasî kurt e divê em wê mijûl bikin û înkâr bikin û tune bikin. Muzîk hem teorîyeke saf, hem şeweyekî derbirîna civakî û maweyê, hem jî rawirtin û mijûlandina xwe, dia û bazirganî ye. Agahî (ya nayê tēghiştin), madde (yên pev tēn guhertin) û zeman (yê razmend) e.¹⁵

Jacques Attali di pirtûka xwe ya ‘*Bruits*’ de ku destpêka muzîkê ji dengê ewil dide destpêkirin, destnîşan dike ku: *Li Cîhanê çalakîyeke bingehîn nîn e bêyî qurînîyê (dengê bêwate) pêk bê. Muzîka ku yek ji van dengên qurînî ye, herî kêr bi qasî zimanî vedîtineke kevn e. Gelek filozof li ser muzîkê hizirîne, mesela Jean-Jacques Rousseau dibêje: “Dema em binyada huneran lê dikolin an jî çavdêrîyê li firoşkarên ewil ên li kolanan dikin, em dibînin ku a rast ev hemû karên ji bo debara xwe pê bikin in. Karl Marx ji bo muzîkê dibêje “awêneya rastîyê”. Ji bo Friedrich Nietzsche jî muzîk “Gotina ku heqîqetê dibêje” û “awêneya Cîhanê ya aîdî Dionysos” e. Ji bo Sigmund Freud jî muzîk “Metneke ku şîfreya wê bê vekirin.” Li*

¹⁴ Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 26-27.

¹⁵ Jacques Attali, *Gürültüden Müziğe*, Ayrıntı Yayınları, wer. Gülüş Gülcügil Türkmen, İstanbul, 2014, r. 18-19.

gor Pierre Schaeffer jî “Pênasekirina mirovan e ku mirov bi zimanê heyberan pênase dike.”¹⁶

Bi van hêmanên hevpar û bingehîn heke bê pênasekirin, weke hunerekê muzîk, bi kurtasî yekpareyek e ku hest, raman, tesewir û çavdêrîyan bi vegotîneke dengên estetîk pêk tîne. Lê ji bilî ku fikra ku muzîk tiştêkî vedibêje, nêrînên ku dibêjin; “muzîk bi tenê ne hunera vegotinê ye” jî hene.

Bi awayekî giştî mirov dikare muzîkê wisa li dor pênaseyekê kom bike: Mûzîk hêman û kiryareke xususî ya mirov e ku wekî armancên estetîk, ayînî, semiyolojîk, perwerdekar û tedawîker hwd; wekî hevsengîyeke hevghandî ya kevneşopîya civakî û afirênerîya takekesî; wekî hêmanên bi rîtmîk, newayî, modal, armonîk, gotin û deng hatine sazîkirin.¹⁷

1.3.1. Deng

“Deng” an jî “sewt” a ku koka muzîkê teşkîl dike, her wiha qeyde û wesfên ji bo ku ev deng bibin muzîk hêja ne ku em berê xwe bidinê û bi agahî û daneyên zanistî rave bikin. Ji bo em bizanin bê çalakîyeke dengî muzîk e an na ji bilî hêmanên bingehîn ên muzîka Rojavayîyan ên wekî “melodî (newa), armonî, rîtm, perde, gotin, entonasyon” di dest de rêbazên din nîn in ku em pê bipîvin. Tevî fenomenên çandî bîn piştçavkirin û tevî mercên civakî derveyî hêmanên çandî bîn hiştin jî muzîk di civakên cuda de di nav çandê de temirandî (embeddedness) û hebûna wê ya rastîn neyê zanîn (adumbration) jî heke hêmanên wê yê bingehîn bîn dahûrandin, hebûna wê ya ontolojîk a di nav dengên din de dê her hebe.

Deng ku hêmaneke fizîkî ye, ji bo derkeve holê û bê îdraqkirin hin şert û merc pêwîst in. Ev merc wekî “çavkanîya deng, derdora veguhêzer, guhekî ku vê derdorê îdraq bike û mejîyekî ku vî dengî binirxîne” dikare bê rêzkirin.¹⁸ Çavkanîya deng di derdoreke heyberî anku sê rewşên heyberî; hişkemenî, şilemenî û gazê de dikare belav bibe. Ji bilî van nêvengên deng nikare belav bibe û bi rê bikeve.

¹⁶Jacques Attali, *Gürültüden Müziğe*, Ayrıntı Yayınları, wer. Gülüş Gülcügil Türkmen, İstanbul, 2014, r. 13-14.

¹⁷Banu Mustan Dönmez, *Müziğin Kökeni Üzerine*, Gece Karanlığı Yayınları, Ankara, 2015, r. 44.

¹⁸Ayhan Zeren, *Müzik Fiziği*, Pan Yayıncılık, İstanbul, 1995, r. 11.

Tişta deng ava dike bi tenê ne derdor û mekan e. Deng maweyekê jî teşkîl dike. Ev mawe dikare wekî bi pêvajoya dem û zeman bê binavkirin. Îdraqa lezê ya zemanî ji hêla fizîkî ve bi îzafiyeta giştî û erdkêşîyê (gravitasyon) re û ji hêla psîşîk jî bi jîyînê re têkildar e. Bêyî ku ev rasteka zemanî hebe; weşandina pelan, jidayîkbûn, mezinbûn, pîrbûn, mirin, tevger û tu çalakîyên bûyîn û xerabûnê elbet deng jî wê pêk neyê. Wekî hemû tevgerên ku bûyîn û xerabûnê deng jî di encama tevgerînekê de pêk tê û girêdayî pêvajoya zemên e.¹⁹ Tevî çavkanî, derdor, zemanî ji bo deng pêk were pêdivî bi guh û mejîyekî wergirekê/î heye. Hin mercên îdraqkirina vê/î wergirê/î jî hene. Ev wergir heke mirovek be frekansên di navbera 20-20.000 hertzê (hz.) de dikare îdraq bike. Her wiha asta şideta deng a mirov bikare bibihîze di navbera 0-120 desibelê (dB) de ye.²⁰ Asta vê şidetê li gorî her heywanî tê guhertin.

Têkildarî hêlên deng ên fizîkî her deng dibe ku bibe hêmayeke muzîkê. Lê ev biryar jî girêdayî nirxandina mejîyê mirov e. Helmholtz dîyar dike ku merca deng a di mejî de wekî muzîk bê qebûlîkirin; rêkûpêkî, aheng û rîtm a deng e. Bi saya bihîstina rêkûpêk a deng, hêmanên muzîkê yê weke melodî (rêkûpêkiya tonal a di pêvajoyê de), armonî (aheng û rêjedarîya çend deng a ku di heman maweyê de tevî hev tên bihîstin), rîtm (newakirina şideta deng a li gor qalibên maweyî yê dîyar), tingîn (bihîstina dengên li guhî xweş tên, xwedîbûna rengê dengî), gotin (fesilandina gotinên helbestî yê li gor van qaliban) pêk tên.²¹

1.3.2. Weke Qadeke Xwederbirînê Muzîk

Ji bilî ku em muzîkê weke huner û zanistekê pênase bikin, em cih û girîngîya wê ya di jîyanê de dîyar bikin jî wê kêrhatî be. Muzîk di heman demê de motîvasyon û rêbazekê ku manewîyat û heqîqetên mirovahîyê nemir dike û dibe abîdeyên fêrkirin û kodên zanînê yê civakê jî. Bo mînak îro jî ji bo gelek ol û bawerîyan cihê muzîk û berhemên wê ji girîngîyekê wêdetir wekî ferz û teqezîyekê ne. Gelek îbadet û rîtuêlên olî bêyî wê nikarin bên kirin. Di banga melayê Misilmanan de, di bangewazîyên duayên Êzîdîyan de, di merasîmên olî yê Xirîstyanan de, di ayînên gelek bawerî û kevneşopîyan de, bikaranîna muzîkê ji rêbazê wêdetir wekî

¹⁹ Banu Mustan Dönmez, *Müziğin Kökeni Üzerine*, Gece Karanlığı Yayınları, Ankara, 2015, r. 28.

²⁰ Ayhan Zeren, *Müzik Fiziği*, Pan Yayıncılık, İstanbul, 1995, r. 141.

²¹ Banu Mustan Dönmez, *Müziğin Kökeni Üzerine*, Gece Karanlığı Yayınları, Ankara, 2015, r. 33.

heqîqetekê bi cih bûye. Tenê ne ji bo bawerî û kevneşopîyan; di heman demê de di serdemên modern de muzîk di fêrkirin û perwerdekirina nifşên nû de rêbazekê dîyarker e. Mirov nikare hizr bike ku hest û ramanên mirovan ên îro bêyî bikaranîna muzîkê hilde dest. Ev rêbaz bi qasî ku nebe aîdê tu kesî jî qadeke berfireh e. Ji bo her desthilatdarî, çîn, civakê qada lêgerîn û berdevkîyê ye.

Di berhemên muzîkê yên xwedî gotin de anku di stranan de elbet zimanê ku gotinê radigihîne bi xwe jî dibe ku bibe semboleke wateyî/civakî bo derbirînê. Bo mînak muzîkên çandên ku di bin zext û qedexeyan de bin, ji hêla peywend û mercên hatî avakirin de wesfên sîyasî û hizrî werdigirin. Li gorî cih û demê ev wateyên sîyasî dibe ku ji nû ve û dîsa bîn avakirin. Bo mînak straneke evîndarîyê ya Kurdî li Başûrê Kurdistanê her çend wekî muzîkeke apolîtîk a popê bê dîtin jî li Tirkîyeyê heman stran tenê ji ber zimanê wê dikare weke xwedî nasnameyê sîyasî bê nirxandin. Bi gotineke din carinan tercîha zimanekî ya di bikaranîna muzîkê de bi serê xwe helwesteke sîyasî ye.²² Anku muzîk bi zimanê xwe dikare bibe qada xwederbirînê ya mirov û civakan. Dema mirov li muzîka Kurdan dinêre qadeke gelekî berfireh a muzîka wan li ser têkoşîn, daxwaz û armancên wan ên civakî ava dibe. Ji vî alî ve em dikarin bibêjin ku hêla muzîkê ya fêrkirin, şopandina zanînê û xwederbirîna hizr û hêstan wekî rêbazekê li gor her serdem û deverê xwe ava dike û ji bo mirovan dibe metodolojîyek.

1.3.3. Muzîk û Nasname

Mirov di derdoreke civakî-çandî de ji dayîk dibin û dimirin. Xet û xêzên sereke yên nasnameya mirovan ên civakî-çandî di vê derdorê de teşe digirin. Di nav demê de tebeqeyên resen ên nasnameyê çêdibin. Cudabûnên di navbera civak û nasnameya mirov a çandî-muzîkal de ji hêla naverokê ve di serdemên bîo-psîşîk ên krîtîk de xetên wan dîyar dibin û bi xwe re nasnameyê muzîkal ava dikin.

Nasnameya muzîkal; bi têgehên çanda muzîkê, nasnameya çandî û xwedîtîya çandê re di têkilîyê rasterast an jî nerasterast de ye. Dîyardeya nasnameya muzîkal a mirov, bi çanda wan mirovan a civakî û bi îmajên wê çandê yên derbarê muzîkê de

²² Günay Koçhan Flower, Têkilîya Sîyaset û Muzîkê, wer. Yûnis Das, *Kovara Ziryab*, h. 2, 2019, r. 26.

teşe digire. Ji bilî faktorên sereke yên weke zeman û zemînê, bandora gelek faktorên talî jî li ser mirovên endamê civakê çêdibin û di nav pêvajoya dîrokî de bi teşeyên cihêreng dîsa ava dibin Ev teşegirtina nasnameya civakî-çandî ya mirovan bingeha xwe ji mîrateya çand û civakê werdigire. Hêsta aîdîyeta etno-çandî ya mirov ew e ku bi heyînên bîo-psîşîk û çandî, qismî an bi tevahî hestpêkirina mirov a xwehesibandina ji etnîsîteyekê ye û ji bo hilberînên madî û manewî yên resen ên civakî, nirxdayîn û watedarkirina mirov e.²³

Muzîka ku hevsengîya pevrebûna civakan pêk tîne û şênberbûna nasnameya civakê bi tecrûbeyên hêzdar ên hestî ava dike, ji bo avakirina hişmendîya hevpar gelekî bibandor e. Têkilîyên bi muzîkê tevgerîyayî, dibe ku hemû civakê bigire nav xwe. Di hin “civakên dîyar” de dans û muzîk, tekane mînaka “wê” civakê ye ku ew civak xwe tê de dibîne.²⁴

Weke ku di muzîkolojîya dîrokê de tê çavdêrîkirin, di vegotinên ronesansê û serdemên zêrîn de taybetmendiyên xweserî civakê yên bi rêya muzîkê tîpên pênasekirin bo netewe û etnîsîteyan dibin mît. Ev qonaxên girîng di pêvajoyên avakirina nasnameyê de ji bo lêgerîna otansîtîseyê darîçav dibin û bersivê saz dikin.²⁵ Ji vî alî ve hêleke muzîkê ya ku mirov û civak xwe pê heyî dikin û bi wê xwe didin nasandin darîçav e.

1.3.4. Muzîk û Civak

Têkilîya muzîkê rasterast bi çawanîya civakekê re tîkildar e û di vî çarçoveyê de her muzîk xwesere û tîkildarî etnomuzîkolojîyê ye. Di serdemên cuda yên dîrokê de, di beşên cihêreng ên civakî de û di civakên hev cihê yên cîhanê de, serwerîya kevneşopîyên muzîkên gelek hev cuda, pir eşkere nîşan dide ku di nav civak û hunerê de tîkilîyeke berbiçav heye. Di ser de jî ev çavdêrî, bi çalakîyên dîtir ên civakî yên mirovan re yeksan e.²⁶

²³ Sibel Paşaoğlu, *Müzikal Kimlik Oluşumu ve Kültürel Aidîyet Duygusu Gelişiminde Geleneksel Müzikler, İzmir Ulusal Müzik Sempozyumu Bildiriler Kitabı*, İzmir, 2010, r. 172.

²⁴ Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 14.

²⁵ Burcu Yıldız, *Ermeni Müziği Tarih yazımında 'Millî Kimlik' Kurgusu*, Vol: 10 Issue:1, 2013, r. 68.

²⁶ Güneş Ayas, *Müzik Sosyolojisi*, Doğu Kitabevi, İstanbul, 2015, r. 53.

Ayhan Erol wisa balê dide ser hevbandorîya civakî ya muzîkê: “*Muzîk bi hevbandorîya civakî heyî dibe û tevgerîneke hatî fêrkirin a ji bo mirovan e. Ji ber vê yekê jî di hundirê xwe de her tim pêdivîyê bi mirovan dibîne ku mirov wê biafirînin, piştgirîyê lê bikin û biryarên derbarê wê de bidin bê çi ye û ne çi ye. Li gorî J. Blaking muzîk dengê e ku di nava qalibên civakî yê hatî pejirandin de ava dibe û çêkirina muzîkê tevgerîneke fêrbûyî ye. Li gorî A.P. Merriam muzîk di nav dengên watedar ên çandî de dikeve nav qalibekî ku wekî hevpareya çalakî, raman û heyberê ye.*”²⁷

Muzîk di bandordarîya civakî de awêneyeke bêhempa ye, bi tenê di nava xwe de û ji bo xwe pêk nayê, her tim pêdivîyê dibîne ku mirov wê biafirînin, guhdar bikin û li ser wê nirxandinan bikin. Ji ber vê yekê jî têgihiştina me ya “*muzîk çi ye û ne çi ye, cîyawazîyên muzîkal ji çi pêk tên*” hêmaneke sosyo-kulturel e.²⁸ Pênaseyên wekî ol, ehlaq, hêmanên asayî û ecêb li gorî her civakê cudahîyên bingehîn dihundirînin. Bi heman awayî muzîka ku awênêtîyê bo şeweyê jîyana civakê dike, li gor her civakê xwedîyê xuyanîyeke cîyawaz e.²⁹

Muzîk di bingeha xwe de jîyana takekesî û jîyana civakî ya bestekar e ku dixwaze wê ragihîne. Bestekar û îcraker wekî mirovekî di nav civakekê de dijî. Bestekar û îcraker ew kes e ku kevneşopîyê û nirxên çandî dide jîyandin û wan vediguhêze. Ev pevbandorîya xwezayî ji bazirganîyê ta sîyasetê, ji perwerdehîyê ta tendurîstîyê, ji xerabûna çandê ta avakirina çandê din a bîyanî, ji binyada etnîk ta netewebûnê dikare bê dûvdirêjkin.³⁰

Çêkirina muzîkê û tevgera guhdarkina wê çalakîyek e û ji nirxên me yê çandî tê. Muzîk di encama tevgerê civakî de xwe dispêre binyadeke çandî. Anku bûyereke têkildarî çandê dîyarkirî ye. Yê wê diafirînin û guh didinê ji wê çandê ne. Beste/stran xuyanîya tevgera mirovên ji “wê çandê” ne. Heta rêgez û

²⁷ Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 20.

²⁸ Resul Bağ, Songül Karahasanoğlu, Türkiye’de Yaşayan Arap Alevileri (Nusayriler)’İN Etnik ve Müzikal Kimliği, *Elektronik Sosyal Bilimler Dergisi*, bahar 2015, c.14, r. 56.

²⁹ Onur Şenel, Müziğin Evrenselliği Varsayımı ve Etnomüzikolojide Evrensel Arayışı, *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, 2014, c.7, r. 873.

³⁰ Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 21.

bendewarîyên “wê çandê” neyên fêhmkirin bê “ew beste” çima hatîye bikaranîn; heta felsefeya hilberînê neyê zanîn jî nixx û asta berhema muzîkê nikare were dîyarkirin.³¹

Civak weke awêneyeke ku hemû aktîvîteyên wê nîşan dide û bi wan deforme dibe. Wekî René Girard qalê dike, weke awêneya Nueran û nîşandarîya wê ya garana gamêşan, muzîk jî bi paralelîya civakên mirovan digihêje. Weke wan teşe digire, bi wan re tê guhertin. Hem jî berî wan. Dîyar e ku hemû ihtîmalên di kodekê de lê dikole û vê yekê ji rastîya maddî zûtir pêk tîne. Di demên pêş de darîçav dibe û xwe serdest dike û tiştên ku bînan sazîkirin, radigihîne. Muzîk ji estetîka olanî ya serdemekê wêdetir, rojanebûnê derbas dike û siberoja wê radigihîne.³²

Muzîk awêneyek, gokeke krîstal, rûbereke ku kiryarîyên mirov nîşan dide, şanîdanîya kêmasîyekê, parçeyê utopyayekê ye. Hafîzeyeke taybet a ku her guhdar hestên xwe lê tomar dike, anamnezek, hafîzeyê hevpar a pergala û şecereyan e. Ne berhemeke çalakîyê xweser ne jî berhemeke bingeha ekonomîyê ye. Ew berhemeke gel û hunermendan, berhemeke mirov û Xwedeyan, berhemeke şahî û duayan e.³³ Her çawa be jî di dawîyê de muzîk kitekitên mirov û civakê di hundirînê û civak bi wan xwe heyî dike û muzîka wê civakê jî bi jîyana wê civakê heyî dibe.

1.3.5. Muzîk û Bîr

Mirovatî ji bo gencîneyên xwe yê çandî di hişê xwe de bigire, di serdemên ku tenê bi gotinê çand tevdiqerîya gelek stratejîyên di bîra xwe de hiştinê bi pêş ve birine. Şêweyên wezn, pîvana peyv, qafîye, qalib di nav van stratejîyan de cih digirin. Bolhman bal kişandîye ser ku di nav stratejîya çanda devkî ya di hişê de girtinê, nîrxekî heyatî yê muzîkê heye. Koka peyva “muzîk”ê bi xwe ji “Musayî”yan tê ku ji bo peyv û gotinên xwe yê pîroz di bîra xwe de bigirin rêbazên muzîkê bi kar anîne.³⁴ Wekî din ji Qurana Kerîm, îlahî, Pirtûka Muqades, Qewlê Êzîdîyan û destanan û hwd dîyar e bikaranîna muzîkê da ku gelek metnên pîroz neyên jibîrkirin vê angaşte piştrast dîkin. Her wiha kilamên dengbêjîyê yê Kurdan ku naverokên wan mişt bi bûyerên girîng ên ji bo civaka wan in, bi stratejîya newayî di bîra civakê

³¹ h.b. 22-23.

³² Jacques Attali, *Gürültüden Müziğe*, Ayrıntı Yayınları, wer. Gülüş Gülcügil Türkmen, İstanbul, 2014, r. 15.

³³ h.b. 15.

³⁴ Banu Mustan Dönmez, *Müziğin Kökeni Üzerine*, Gece Kitaplığı, 2015, r. 16-17.

de de bêtir mayînde bûne. Taybetîyeke dengbêjîyê ya sereke jî bibîranîn û bibîrxistina bûyerên dilsoj e ku bi sewta dengbêj mirov bibandortir bi êşên xwe yên raborîyê dihesse û ev hemû xizmetê dikin ku bibîranîn wekî hêmayeke berxwedêr xwe heyî bike û têsîrekê li ser rewşa niha bike ku tiştin bên guhertin. Ji bo hefizandina gotinê jî stratejîya formên newayî û rîtmîk di nav berhemên çanda devkî de pir xuya dibin. Bo nimûne di biwêj, gotinên pêşîyan, mamik, levanînok, zûgotinok de mirov lê rast tê ku gelek rêzik û qaydeyên jêner an jî rêbazên fêrkirina hêmayên çanda civakî di teşe û qalibên bipîvan de ne da ku zû ji bîr neçin û ji bo bibîrxistinê li raserê mirov tim amade bin. Bo mînak, *Çavê li derîya/xwelî li serîya, kevirê havîna/bavêjin kadîna, bi xwezîya/kesî ranehişt baqê kezîya, bi dûro/bi nûro, jê keto/pê keto, çi kiro/li xwe kiro, kalo tê ji deştê/barê stirîya li piştê, rovî li rê livî/rê li rovî livî, kengê/roja pengê* û hwd. Teşeyên van berhemên çanda devkî xwedîyê qalib û rîtmekê ne, hin caran jî bi alîkarîya newayê ev gotin û bêtir û zûtir di bîra endamên civakekê de dimînin. Mirov dikare bibêje ku rîtm û newayên bo bikaranîna van berhemên folkorîk teqez têkildarî muzîkê ne. Anku formên muzîkê rasterast bi bîrxistin û bîranînan ve zeliqî ne. Bi tecrubeyan sabît e ku dengbêj bêtir newaya (forma muzîkê) stran an jî kilamê pirî caran gotinên berhemên wan nehatine bîra wan ku bi awayekî axaftinê hevok bi hevok rêz bikin. Di vir de jî eyan e ku hêleke hefizandin û bîrê yê muzîkê di serborîya mirovahîyê de her hebûye û ev jî taybetmendîyeke muzîkê bo parastin û zindîhiştina bîrê ye.

1.3.6. Ecibandina Muzîkê

Zewq gelek caran bi naskirin û eyankirina sir û nepenîyan ve girêdayî ye. Di hemû huneran de hêman û diyardeyên ku bi zewq û ecibandinê bi encam dibin; ji fêrbûnîyên çandî, ji matmayîn û nepenîyên di hişê mirov de rû dayî ne wêdetir in. Rasterast reaksiyona di gîyanî de derketî holê her çend xwedî hêlên kollektîf be, di heman demê de hêlên wê yên takekesî jî hene.

Hêmaneke ku muzîkê weke hunerekê dide pênasekirin, îzafiyeta wê ye û li gor her kesî dibe ku hestpêkirinên cihê derxe. Afîrênera/ê ku muzîkê îcra dikin û wê diafirinîn, li gor rûdan, hestpêkirin û ramanên di gerdûna xwe de tevdişerîn û ev tevgera ku di avabûna berhemê de dibe kirde; bivê nevê di awêneya berhemê de xwe dide der. Anku her hestpêkirin û raman, xusûsî xwedîyê xwe ye û tekane ye.

Hestpêkirina her mirovî ya li hember bûyer û dîyardeyekê ne pêkan e ku bi her hêlê xwe heman reaksiyonê derpêş bike. Ji ber vê yekê jî berhema muzîkê ku awêneya hest û ramanan a hin kesan e, tevî motif, kod û resenîyên çand û derdorekê ji hêla ecibandin, şopandin û domandinê de gelek caran li gorî her kesî dibe xwedîyê wateyên jev cihê. Kesên bi heman berhemê, hestîyarîya nêzî hev di gîyan û hişê wan de ava bûyî têkildarî hinek an jî piranîya dîyarde û hêmanên wê berhemê ne.

Ahmet Adnan Saygun di derbarê wesfên ecibandina berhema hunerî de wisa ramanên xwe tîne ziman: Wênesaz, helbesvan an jî muzîkjen ew mirov in ku xewna xwe ji me re vedibêjin û berhema hunerî îfadeyeke bêrîkirin û rewşa gîyanî ye. Ew kesên ku heman bêrîkirinê seh bikin û di heman rewşa gîyanî de bin, dê bikarin xwe tê de bibînin. Û madem “heyber (made)” û “wate” (mane) du bend in; divê mirov xatir ji “mantiqê rastîyê” û “ramanên li benda xweferzîkirinê” bixwaze. Ha wê demê dê derîyê xewnên xwe binhişî vebe û em ê dûrî “têgeh”ên fêhmîkirinê yên hişkûhola, war bi war bigerin. Ha wê demê dê madeya wêneyê tenê bibe xîzik, madeya helbestê tenê bibe peyv, madeya muzîkê jî tenê bibe deng. Û heke em di rûpela firçeyê hatî xêzkirin an jî newayeke ji sazê herikî de xewn, bêrîkirin û rewşa gîyanê bibînin em ê pê ve bîn girêdan.³⁵

Meliha Doğuduyal balê dikîşîne ser berhema şexsî ya hunermend û wisa çêl li naveroka wê dike: Derbirînên bi rêya muzîkê ji alîyê afirîner ve derpêş bûyî, çavdêrîkirina şayesandina hest û ramanên hunermend in ku dixwaze veguhêze. Ew tevgerên takekesî ne ku ji hêla hunermend ve hatine dîyarkirin (musical metaphors). Derbirîna hestan nayê wateya resimandina hestan. Rewşa ruhî ya hunermend, azwerî, hêrs, dilmayîn, tirs, xemgînî coş û hestên din, bandorên yekser li wê/wî û berhema wê/wî kiribe, hetta pêvajoya di nav psîkolojîya afirandinê de, rol û rist di zimanê hunermend de lîstibe, hespêkirina bestekar a di çalakîya afirandina wê kêlîyê de ku wekî guhdaran em nikarin bi ser ve bibin. Encex em dikarin bi ser tiştê wî/wê weke huner derpêş kirî ve bibin. Hemû hestên bi van tevgeran ên bi guhdaran re çêbûyî, bi awayekî şênber nikarin bîn tomarkirin. Hest ne ew dîyarde ne ku di hundirê me de bi awayê îzolekirî mayî û ne ew tişt in ku ji alîyê terzeke muzîkê ve û bi encama şêweyekî deduksîyonî bê deranîn. Dema ramanek, bîranînek, xeyalek hestan hişyar

³⁵ Ahmed Adnan Saygun, *Yalan - Sanat Konuşmaları*, Bağlam Yayınlar, İstanbul, 2009, r. 14-15.

dike û guherînên fîzyolojîk otomatîk çalak dibin, (ên ji hêla mejîyê paş ve tèn birêvebirin) di bedenê de hin guherînên hestewarî çêdikin. Ji ber ku di vê xalê de bertekên hestewarî yên derdikevin li gor her şexsî guherbar in, watedarkirina parçeyê muzîkê jî wê guherbar be. Fikrekî muzîkî dibe ku em wekî xembar, nepenî, bicoş hwd. pênase bikin lê em çî qasî bînin ziman jî em nikarin tiştê di muzîkê de bi dengên hatî gotin, bi peyvên bi awayekî eşkere dîyar bikin û bipeyîtînin. Ji ber ku her heyber, bûyer, çalakî ne mimkun e ku di muzîkê de wekî şîfreyekê bê kodkirin. Muzîk jî weke hunerên din nikare rastîya teqez û bêalî kopî û dubare bike.³⁶ Ji vî alî ve muzîk her çendî li derdor û di nav girseyan de xwe heyî bike jî divê bê gotin ku alîyekî muzîkê yê şexsî heye ku têkildarê vê şexsîbûnê ecibandina wê jî tiştêkî îzafî ye.

1.4. Etnomuzîkolojî

Etnomuzîkolojî, di nav qadên erdnîgarîyan de, li ser hêla peywenda mûzîkê ya dîrokî, sîyasî, fêrbûnîyên kevneşopî û afirandinên olî disekine û hewl dide ku wan vebêje. Ev şaxa zanistî di nirxandina xweser de jî ji parzûna şîrovekirina lêkolîner re derbas dibe. Hewl dide ku peywenda mûzîkê ya civakî, çandî û têkilîya civak û mûzîkê fêhm bike. Bi nêrîna lêkolîner û qada lêkolînê ya li serê dike, çarçoveya pênasekirinê dîyar dike. Ji ber ku lêkolîner zanînen berhev dike û wan têdigihêje, vediguhêze; xebatên etnomuzîkolojî bêhtir li ser vekolînên qadê dimeşin. Ji ber ku muzîk hem şaxeke hunerê ye û hem jî zanistek e, nirxandina wê ji bo etnomuzîkologan dibe karekî zehmet. Dahûrandina jîyana navxweyî ya mirovekî û qada xwe dispêre ecibandinan qet ne karekî hêsan e.³⁷

Binyada peyva etnosê ji zimanê Yewnanî tê. Etnomuzîkolojî di peywenda muzîkolojîyê de li ser çandên herêmî hûr dibe û wateyên wan ên di çandên herêmî de dinirxîne. Bêhtir peyveke Ewrûpî ye. Ji bo mûzîkên çandên ji derveyî mûzîka hunerî ya pirdeng a rojavayî fêhm bike, zayîn û binyada vê şaxê li Ewrûpa hatîye honandin. Lê piştê di wate û naveroka wê de hin guherîn û veguherîn pêk hatine. Di destpêkê de li ser mûzîkên derveyî Ewrûpayê anku mûzîkên xelkên din dest pê kirîye lê piştê bi guherîna nêzîkbûn, teorî, bergehên cihê re li ser têgeha mûzîka cîhanî, bêyî ku

³⁶ Meliha Doğuduyal, *Müzikten Söze*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2016, r. 35.

³⁷ Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 26.

cudahî û curebûnekê bixe di navbera mûzîkan de bûye xwedîyê rista vekolîn û teswîrkirinê.³⁸

Di binbeşên pêş de em ê li ser kurtedîroka etnomuzîkolojîyê rawestin lê ji ber destpêka pênaseyê em ê qîm pê bînin ku çend agahîyan destnîşan bikin. Di salên 1880'an de lêkolîneran cara pêşîn navê “*Muzîkolojîya Berawirdî*” (Comparative Musicology) li vê şaxa zanistî kirin. Bi vê yekê mûzîka hunerî ya Ewrûpayî û muzîkên derveyî Ewrûpayî dihat berawirdkirin. Lê belê Jaap Kunsê Hollendî ku wekî pisporê muzîka Endonezyayê tê nasîn ev rêbaz, tê ewle nedît û di salên 1950'an de, têgeha ‘*Etnomuzîkolojî*’yê derxist û pêşnîyar kir ku mûzîkên derveyî Ewrûpayî di nav etnomuzîkolojîyê de bînin vekolîn. Di sala 1956'an de antropolog û muzîkjenan “*Komeleya Etnomuzîkolojî*”yê damezrandin. Bi demê re qada xebatên etnomuzîkolojîyê berfirehtir bûn.³⁹

Têgiha etnîk an jî etnîsîteyê di pênasekirina etnomuzîkolojîyê de hîmekî sereke ye. Etnomuzîkolojî, bi awayekî giştî hemû tevger û fenomenên muzîkê yên bi awayekî etnîk tînin pênasekirin û di vê çarçovê de hemû sedem û pêkeran vedikole.⁴⁰

Bi awayekî giştî wekî peywenda muzîkê ya çandî, etnomuzîkolojî; hêmanên hebûnî yên civakan ên pîralî di şeweyê mûsîkî de nîşan dide. Ev hêmanên girîng bi tenê pêvajoya dîrokî ya civaka xwe nîşan nade, di heman demê de ji bo çawanîya siberoya civaka xwe rênîşandirîyê dike. Etnomuzîkolojî şaxeke zanistî ye ku muzîka çandekê an jî bineçandekê; reng û berfirehîya dengên wê, şeweyên îcraya wê, têkilîya wê ya bi çanda jê xuliqî, ji alîyên cuda ve vedikole û danberhevîya wê bi muzîkên çandên dîtir re dike.

Bruno Nettl etnomuzîkolojîyê wekî têgihiştin û watedarkirinên muzîkên mirovan ên derveyî şaristanîyên rojavayî pênase dike. Jeff Todd Titon jî mûzîka mirovan wekî xebatê pênase dike. Hemû ev pênase li ser nivîstin û neqilkirina “kesên din” in. Di rêbaza xebatên xwe de jî li gorî şîroveya lêkolîneran a li ser xebata qadê teşe digire. Navên alternatîfên vê şaxê yên wekî “*muzîkolojîya berawirdî*,

³⁸ Etnomuzîkolojî Üzerine Yard. Doc. Dr. Mehtap Demir Söyleşisi, <https://www.youtube.com/watch?v=z0eU2Yg1YG0>, (drk. jgr. 03.07.2018).

³⁹ Seyit Yöre, Müzikoloji, Etnomuzikoloji ve Müziğin Bilimsel İncelenimi, <http://muzik-sanat-dusunce.blogspot.com.tr/2011/10/muzikoloji-etnomuzikoloji-ve-muzigin.html>, (drk. jgr.15.04.2018).

⁴⁰ Murat Bulgan, *Müzik Etnolojisi*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2016, r. 54.

muzîkolojîya çandî, muzîkolojîya dîrokî” hene. Di heman demê de mirov dikare weke “*antropolojîya muzîkê*” bi nav bike. Ji ber ku antropolojî maka zanistên civakî ye ku di serî de naskirina mirov, hewld dide çand û civakan binase. Etnomuzîkolojî di nav van çand û civakan de hewl dide ku mûzîkê watedar bike. Ji ber vê yekê jî li her dera ku mirov û çand lê hebin etnomuzîkolojî lê heye û bi gihandina şaxên din ên zanistî û civakî re mirov dikare wê rave bike.⁴¹

Ji aliyê îcrayê ve dema mirov lê binêre ya rast her mûzîkolog muzîsyenek e, her muzîsyen jî etnomuzîkologek e. Ji ber ku afirandina mûzîkeke ku navenda wê îcraker be di heman demê de keseke/î nûner e û nîşan û sembola wê çandê ye. Ji ber vê yekê jî her berhemeke îcraker û mûzîkjen, daneyeke etnomûzîkolojîk e. Lê ji bo akademîyê nîrxadina teorîk a li ser van berheman envantereke zanistîtir e.

1.4.1. Muzîkolojîya Çandî an Etnomuzîkolojî?

Nîqaşên derbarê pênasekirina etnomuzîkolojîyê mijareke rojane ye û ji serdema etnomuzîkolojî wekî “muzîkolojîya berawirdî” derketî û pê ve nîqaş tim derbarê vê qadê de hene. Di Kurdî de hêj nîqaş li ser vê qadê nehatine kirin û ji bo pejirandinê hêj navekî ku mirov li serê li hev bike derneketîye. Tevî ku ne hêmaneke sereke ya vê xebatê be jî ji bo haydarkirina vê şaxa zanistî dê sûdewer be ku çend îtirazên li pênasekirina “etnomuzîkolojîyê” yên bi zimanên din em li vir destnîşan bikin.

Ayten Kaplan a ku di binavkirina pirtûka xwe ya bi Tirkî de jî navê “Kültürel Müzikoloji” (Muzîkolojîya Çandî) tercîh kirî, wisa dîyar dike: Etnomuzîkolojî têkildarîya têgihiştin û wateyê çandên etnîk dihundurîne. Lê di serdema îroyîn de civakên sînorên wan ên etnîk bi awayekî teqez û xwerû kêmbin. Civakên di encama dan û standinên çandî de dişibin hev jî dibin mijarên vekolînan. Her çanda avabûyî, ji muzîka ku xwe pê îfade dike jî pêk tê. Muzîk tevgerên mirovan û hemû hêmanên avabûnê çandî dihewîne. Ev binyadên çandî dibe ku ol û bawerîyek an jî kevneşopî û toreyek jî be ku rasterast ne têkildarê etnîsîteyê bin. Muzîkên bi vî rengî yên ne têkildarê etnîsîteyê bin wê di kîjan qadê de bîn vekolîn? Ji ber wê jî

⁴¹ Etnomüzikoloji Üzerine Yard. Doc. Dr. Mehtap Demir Söyleşisi, <https://www.youtube.com/watch?v=z0eU2Yg1YG0>, (drk. jgr. 03.07.2018).

qada etnomuzîkolojîyê wekî “muzîkolojîya çandî” bê berfirehkirin dê di zemîneke çêtir de bikare bê bicihkirin.⁴²

Derbarê vê nîqaşê de Ayhan Erol li dijî pênasekirina muzîkê ya li ser etnîsîte û çînan derdikeve û wisa destnîşan dike: Etnîsîte di roja îroyîn de; wekî pêvajoyeke sosyal, sînor û nasnameyên livdar ên takekesî an jî kollektîf ên mirovan a di jîyana wan a civakî de tê fêhmkirin. Di vê çarçoveyê de, têgeha çîniyê ne ji ber sînordarî û dûrî çandîyê lê ji ber ev pênase ne li gor sazbarîya analîtîk e, di dewsa “çîn”ê de pênaseya “nasnameye çandî” ya çîniyê jî di nava xwe de dihewîne, mirov dikare pêşniyar bike. Pîvang û wesfê nasnameya çandî her çawa be, hişmendîya aîdiyetê ye ku komên li ser bingeha “cîyawazîyên çandî” yên lev kom bûyî ji bo daxwaza bawerkirin, dijderketin an jî xwebûnê bi pêş xistîye. Anku naverok û populasyona wê her çi be, “nasnameya çandî” têkela hêmanên cîyawaz e ku civakan jev vediqetîne. Di vir de tişta dibe sedema “cîyawazîyên çandî” di çarçoveya “ziman, ol, binyada nijadî, çîn, netewe, bîrdozî, dîroka hevpar, an jî terza jîyanê de dikare teşe bigire. An jî dibe ku ev nasname hêmanek an jî çend hêmanên hatî rêzkirin û yên hêj nehatî rêzkirin dibe ku di nava xwe de bihewîne. Heke em bibêjin motîvasyonên ku mirovan ber bi hişyarbûnê ve dibin pirhêl (multiple) in û em bipejirînin ku piştgirî ji aliyê kollektîvîteyên cihê ve li van motîvasyonan tên kirin; wê demê “nasnameya çandî” ji bo fêhmkirina muzîkên cîyawaz ên bi referansên serdem û aktorên cuda ve hatî afirandin jî herî baş dikare bi vê têgeha çandî diyar û pênase bike.⁴³

Bi awayekî giştî ji ber ku her etnîk di heman demê de çandekê îfade dike lê her çand nayê wateya etnîsîteyê, binavkirina “muzîkolojîya çandî” ku her çandê hembêz dike, ji bo vê şaxê guncawtir e bê bikaranîn. Lê ji ber ku di vê xebata me de rêbazên lêkolîn û vekolînê yên etnomuzîkolojîyê ta roja me dê bînin bi kar anîn, bi zêdebarî navê wê yê nasyar anku “etnomuzîkolojî” dê bê pejirandin.

1.4.2. Bi Çavê Etnomuzîkolojîyê Gerdûnîbûna Muzîkê

Di bin banê etnomuzîkolojîyê de mijareke ku gelek nîqaş li serê hene jî angaştê “gerdûnîbûna muzîkê” ye. Di vê çarçoveyê de hem muzîkolojîya ku muzîkê

⁴² Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 15.

⁴³ Ayhan Erol, *Müzik Üzerine Düşünmek*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2015, r. 75.

bi awayekî analîza sîstematîk dinirxîne hem jî etnomuzîkolojîya ku taybetmendîyên mûzîkê yê cîhanî û herêmî dinirxîne, dijberî fikra gerdûnîbûna mûzîkê ne. Dibe ku deng û tingîn (tîm) di peywenda frekansê de gerdûnî bin anku her dengên li cihekî dinyayê nirxekî frekansê bihewîne lê ji ber ku mûzîk wateyên çandî û peywendên civakî dihundurîne ji cîhanîbûnê wêdetir xwedîya avanîyeke çandî ye, mûzîk ne gerdûnî ye.⁴⁴

Bestekara/ê ku hêza xwe ji civakê werdigire, dengê di xwe xwezayê de li gorî fêhmarîya xwe ya estetîk saz dike, nirxên ku ji alîyê wê/wî ve hatî pejirandin tîne ziman. Bi teşedayîneke azad berhema xwe dihune û bi rêya îcrakirinê pêşkêşî bendewarîyên çandî yê civakê dike ku nirxandin lê bê kirin. Heke muzîka hatî çêkirin, di guhdarkirinê de hevparîyek di asta fikrî, hestîyarî, tevgerî de dabe avakirin û nirxandinên qada ku çalakî pêk hatî erênî be, di navbera muzîk û civakê de hevsengîyeke navxweyî tê bidestxistin. Ev hevsengîya di xuyanîya muzîkal de, ji bo dahûrandina binyada civakî hêmaneke alîkar e. Lê belê ji daneyên hatî bidestxistin li ser navê muzîkê mirov nikare gelemperîbûnan bike. Encam tenê ji wê civakê derbasdar in. Ev yek jî nîşan dide ku angaşt gerdûnîbûna muzîkê ne di cih de ye.⁴⁵

Muzîk heke bi rîtm û sazûna dengan bi mirovan re bibîrxistin, hest û kelecane takekesî ava bike û di jîyana wan de têkilîyan saz bike tê pejirandin. Zimanê hatî bikaranîn, peyvên hatî hîlbijartin û tesbîtkirina van peyvên a di perdeyê dengan de wê ji me re bibe alîkar bo têgihîştina vegotina muzîka binyadî ya di wê çandê de. Wateya hestên a di sazûna newayî de, wê li gorî daneheva çandî û nirxan guherbarîyan nîşan bide.⁴⁶ Bo mînak strana gelêrî ya Cizîrê “Kefyûkê” ya ji bo birina bûkan tê gotin ku bi kesên ji wê çandê re hestewarî û xembarîyan ava dike, dê li herêma Deştê Rihayê nikaribe heman hêsta tîr ava bike. An jî hestên xurt ên ribaba Miradê Kinê yê li herêma Torê ji bo civakên Serhedî dibe ku pir ne bibandor be. Ji alîyê bawerîyan ve jî her çawa muzîka merasîma mirîyan a Xiristîyanên Ewrûpî ji bo civakên Rojhilatî ne xwedî watedarîyeke diltezîn be, dê ji bo Ewrûpayîyan

⁴⁴ Etnomuzîkoloji Üzerine Yard. Doc. Dr. Mehtap Demir Söyleşisi, <https://www.youtube.com/watch?v=z0eU2Yg1YG0>, (drk. jgr.03.07.2018).

⁴⁵ Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 21.

⁴⁶ h.b. 23.

têgihîştina gotin û newayên zêmarên dilsoj ên li ser mirîyên Rojhilatîyan jî zêde ne pêkan û hêsan be.

Muzîk weke hêmanekê di her civakê de, wekî pîvana mîkro jî di jîyana her kesî de heye. Mirov dikare qalê bike ku kevneşopîya muzîkê ya her çandê heye. Lê dema em pirsyar bikin bê kevneşopîyeke çawa, mirov di rêzkirina denga û naverokê de rastî cîyawazîyan tê. “Ew muzîk” bi tenê di peywenda çandî ya wê çandê de dikare bê fêhmîkirin. Li gor ku di nava endamên heman civaka xwedî nîrxên hevpar de jî asta pejirandin û redkirina berhemên muzîkê guherbar be, dê angaşt “gerdûnîbûna muzîkê” ne nêzîkahîyeke tekûz be.⁴⁷

Hetta dikare bê gotin ku her teşeyê muzîkê di binyada xwe de etnîk e. Di vê babetê de Onur Şenel wisa dinirxîne: Muzîk tevî pergala denga bê pênasekirin jî ya rast ji denga zêdetir pewendîdarê şîrovekirina mirov û civakê ye. Ji xwe peyva muzîkê bi xwe jî vê yekê piştrast dike. Ji bo kesekî ku têgeh an jî têkildarî hêstan, watedarîyên metaforîk ên muzîkekê tecrube nekirî, çawa ku tiştêkî pê nede hîskirin an jî ji bo mirovên ji çandên cuda “ecêbhatina” mûzîka wan a ji hev re, dide nîşandayîn ku cudahîyên têgihîştina muzîkê, bi tecrubeyên çandî pêk tên.⁴⁸ Li gorî vê yekê her muzîka resen ji binyada etnîsîte û têkildarî wê ji erdnîgarîyekê zayîye û têgeha ‘gerdûnîbûna mûzîkê’ ne hêsanî ye ku ji xwe re qadeke derbasdar peyda bike.

1.4.3. Kurtedîroka Etnomuzîkolojîyê

Etnomuzîkolojîya ku çandê ji binyada muzîkal ve dinirxîne û çavkanî, guherîn, pêşveçûn û pîrgirêkên cîyawaz li gor rêgez, encam û zagonan hewl dide çareser bike, di nav serdem û sînorên dîyar de pêdivîya me pê heye ku em çavekî li dîroka wê bigerînin.

Di lêkolînên derbarê muzîkên derveyî rojava de, ji bo bersivdayîna pîrsa “fonksîyona muzîkê di nav çandê de çi ye?” pêdivî bi lêkolînên qadê çêbûye. Lêkolînên qadê meyl ber bir muzîka berawirdî ve birine. Bi weşanên berev dawîya sedsala 19’an ve wesfê zanistîbûnê lê bûne. Derbarê dîyarkirin, pênasekirin û

⁴⁷ h.b. 21.

⁴⁸ Onur Şenel, Müziğin Evrenselliği Varsayımı ve Etnomüzikolojide Evrensel Arayışı, *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, 2014, c.7, r. 888.

binavkirina etnomuzîkolojîyê de gelek gotar hatine nivîsandin. Bi awayekî giştî her çend lihevkirinek hebe jî çavlêgerandina pêşketina serborîya vê qadê ji bo têgihiştina mijare dê sûdewer be.

J.T Titon pêvajoya etnomuzîkolojîyê bi çar qonaxan dîyar dike:

- a) Muzîkojîya Berawirdî
- b) Folklor Muzîkê: Berhevkerin, notakerin, vekolîn û tevî berawirdîkirinê çar taybetmendiyên din lê zêde dike.
 - i. *Îdeolojîya Netewparêzîyê*
 - ii. *Derxistina pêş a etnografîk a li ser peywendîdarîya civakî*
 - iii. *Hêla etik*: Parastina muzîkên kevneşop ku hema bêje li hemû deverên cîhanê bawerî pê heye di bin xetereya tunebûnê de ne.
 - iv. *Armancên perwerdehîyê*: Muzîk dê bibe beşek ji mufredatên dibistanên dewletê û ji bo kesên gihayî bê pêşkêşkirin
- c) Di salên 1950'an de girêdayî antropolojîya Emerîkayîyan bi avabûna Komeleya Etnomuzîkolojîyê re, bi giraniya etnomuzîkologan a xebatên qadê û çandê li ser çandîbûnê (acculturation) û guherînê hûr bûn. Heke bi modela Merriam bê daxuyakirin: Raman, tevegerîn û deng.
- d) Titon çê li vê qonaxê dike ku hêj ne hêsan e bi navekî tenê bê binavkirin. Dide dîyarkirin ku bi awayekî giştî ev qonax çêkirina mirovan a muzîkê û lêkolîna tecrubeyên li ser muzîkê ye.⁴⁹

Li gor B. Nettl vekolîna terza muzîkê ya giranî dayî ser avanîya rêz û newayî stranên Çermsorên Bella Coola ku ji aliyê Carl Stumpf ve di sala 1855'an de di cilda duyemîn a "*Vierteljahrschrift für Musikwissenschaft*"ê de cih girtî, di etnomuzîkolojîyê de xaleke sereke ya girîng tê dîtin. Bi vê lêkolîna xwe Stumpf li gor gelek kesan wekî avakerê etnomuzîkolojîyê hatîye pêjirandin. Lê Jaap Kunst wî etnomuzîkologekî sereke nabîne û vê rûmetê dike para bîrkarê Îngilîz Alexander J. Ellis. Ji ber ku Ellis bi pergaleke pêşxistî (cent system) nîvdeng bi 100 parçeyên wekhev parî kirîye. Vê pergale jî lez daye ku navbeynên dengên di stran û rêzên derveyî welatên Ewrûpayê de bi awayekî objektîf were pênasekirin. Li gorî Kunst

⁴⁹ Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 58-59.

xebata Ellis ji sûda çandê an jî lêkolîna li ser terzên mûzîkê zêdetir, ji ber sùddayîna metodolojîyê girîng e.⁵⁰ Bi pergala pîvandina bilindahîya deng a Ellis pêşxistî, ramana nînbûna tekanebûnê û bêsinorîya rêzên deng derketîye pêş ku serdestîya pergala muzîkê ya rojavayîyan bûye mijara nîqaşan û derî û dergeh li muzîkên çandên din vebûne ku tu cure û stîlên muzîkên çandan ne kêmi hev in.

Ji bilî xebatên metodolojîk û lêkolînên qadan, fonografa ji aliyê Thomas Edison ve 1877'an de hatî dahênan, ji ber ku deng û axaftinên berê hatî kirin bi rêya mekanîk êdî dikarîbû bide xwendin û hilandin, di pêşxistina disîplîna etnomuzîkolojîyê de dewlemendî û hêskirin derxistîye holê. Bi dahênan fonografê her deng û newaya hatî tomarkirin û berhevkerin li qadên cuda bi her hêlên xwe ve ji hêla lêkolîneran ve dikarîbû were vekolîn û lêkolandin. Li gorî tesbîta B. Nett silîndîra Edison cara yekem di sala 1889'an de ji aliyê Walter Fewkes ve ji bo belgekirina stranên Şênîyên Zuni û Passamaquoddy hatîye bikaranîn. Piştî demeke kin Carl Stumpf bi spartina li ser van belgeyan “Vekolîna Muzîka Xwecihî” weşandîye.⁵¹

Di vegotina serborîya mebestên xebatên zanistî yê destpêka etnomuzîkolojîyê de hin rexneyên li hişmendîya serdestî û mêtîngerîyê tên kirin jî hene ku ji bo nêt û armanca vê şaxê bi gelemperî bê zanîn pêdivîya me pê heye em berê xwe bidinê.

Jacques Attali rexneyê tîne ser mebesta xebatên muzîkolojîyê, her wiha etnomuzîkolojîyê yê serdemên dûvdirêj û wiha destnîşan dike: Kevneşopîya muzîkolojîyê serdemeke gelek dirêj hewl da ku îstîqametê bide dîroka muzîkê û ew wekî “kevnare”, “klasîk” û “modern” senifand û bi nav kir. Her wekî ku bixwaze nîşan bide; tevî pêşketina zanist, teknoloji, exlaqê di xweşîktîyê (estetîk) de jî pêşketin pêk hatîye. Tezeke bi vî rengî elbet êdî ne derbasdar e. Tu kes nikare îdia bike muzîka îroyîn ji ya berî niha bi şêş sed salan pêşketîtir e. Her çend derbarê muzîka civakên berê de di dest de daneyên têr di destê me de nebin jî.⁵²

⁵⁰ h.b. 61.

⁵¹ h.b. 62.

⁵² Jacques Attali, *Gürültüden Müziğe*, Ayrıntı Yayınları, wer. Gülüş Gülcügil Türkmen, İstanbul, 2014, r. 20.

Pêkanîna tomarkirina dengen di dawîya sedsala 19'an de bi cih bûye, gelek pişpor bêyî pêşekîbûn û cîyawazîyê bixin navberê gelek çandên muzîkên nêzîk tomar kirine. Pêkanînen rojavayîkirin û mêtîngerîyê li ser çandên muzîkên cîhanê jî xebatên guherîne ceribandine û di encama van pêkanînan de gelek terzên muzîkê tune bûne. Ev tesbîten B. Nettl angaşt A. Yürür û Y. Erdener piştrast dike ku etnomuzîkolojî bi mebesta piştgirîkirina mêtîngerîyê derketîye holê.⁵³ Pêkanîna tomarkirina dengen ên bi mebestê têgihîştin û serwextbûna çandên derveyî rojavayîyên Ewrûpa û Emerîkayîyan bi nêrinê antîkolonyal hatine raçavkirin û şîrovekirin.

Ji bilî pergala centê ya Ellis û dahênana fonografê, bikaranîna navê “Muzîkolojîya Berwirdî” ya ji alîyê G. Adler ve û daxuyanîyên wî yên li ser naveroka vî navî ji bo etnomuzîkolojîyê gelekî girîng in. Muzîkolojîya Berawirdî ya heta salên 1930'an xeta xwe parastî, bêyî ku li ser hêmanên çandî raweste li ser notayê; şêweyê muzîkê, binyada newayê û analîzê hûr bûye.⁵⁴

Dibistana Muzîkolojîya Berawirdî ya Berlîne ya di salên 1930'î de dibe bingeha etnomuzîkolojîyê ya 1950'ê ku J. T. Titon wê weke qonaxa sêyemîn bi nav dike. Xebatên heta 1930'an hatî kirin, rexne û dijderketina li ser navê muzîkolojîya berawirdî bi xwe re tine. Di sala 1949'an de bi daxuyana Fritz Bose “Muzîkolojîya berawirdî ya Almanan, bêtir etnolojîya muzîkê ye, zanista muzîkal a dîrokî û çandê ye” dibe bingeha sereke bo navê Etnomuzîkolojîya ku Kunst piştire pêşnîyar bike. Piştî 1950'an girîngîya mijarên wate û bikêrbûna muzîkê zêde dibe. Her wiha vê dibistanê vekolîn li ser taybetmendîyên muzîka gerdûnî û tevgera muzîkê dikirin û bi Carl Stumpf, Robert Lach, Eric von Hornbostel, Otto Abraham, Curt Sachs û Marius Schneiderê ku aktorên sereke yên vê her kê ne, dihat temsîlkirin.⁵⁵

Etnomuzîkologên Emerîkayî yên bêtir li ser binyada etnolojîk radiwestîyan, ji kitetkitên muzîkê zêdetir bala wan li ser lêkolîna muzîka çandê bû. Li gorî wan rêya encamên ewledar vekolîna muzîkê ya li ser binyadeke civakî bû. Alan Merriam dida xuyakirin ku qedrê “etnomuzîkologên li ser masê” kêr bûye û divê “muzik di nav çandê de bê vekolandin.” Di sala 1964'an de pirtûka *The Anthropology of Music*

⁵³ Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 63.

⁵⁴ h.b. 64.

⁵⁵ Ayhan Erol, *Müzik Üzerine Düşünmek*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2015, r. 36.

nivîsand ku tê de dîyar dikir bingeha etnomuzîkolojîyê gihandina hev a muzîkolojî û antropolojîyê ye. Di 1970'an de Merriam pênaseya xwe ya salên 1960'an berfireh kir û etnomuzîkolojî wekî “lêkolîna muzîkekê ya têkildarî çanda wê” veguherand. Bi yê yekê ne ku muzîk bi çandê ve tê peywendîdarkirin, muzîk parçeyekî çandê bi xwe ye.⁵⁶ Bi nêzîkbûna pevgihandina antropolojî û muzîkolojîyê mijarên vekolîna etnomuzîkolojîyê dewlemendtir bûne. Bi awayekî giştî her çend di sînorên qada mijarê de lihevkerin nebe jî serborîya xebat û keftûlefa li dor etnomuzîkolojîyê weke “teorîya lêgerîna muzîkên cîhanê” dikare bê destnîşankirin.

1.4.4. Têkilîya Etnomuzîkolojîyê bi Disîplînên din re

Yek ji taybetmendîya etnomuzîkolojîyê ew e ku bi gelek disîplînan re di nav hevkarîyê de ye. Mirov dikare van disîplînan bi vî rengî rêz bike:

- *Akustîk*: Şêweyên belavbûn, geşbûn, olandayîna dangan lê dikole.
- *Antropolojî (mirovnasî)*: Pêvajoyên bîyolojîk û çandî yên kompleks ên derbarê mirov de hewl dide serwext bibe an jî lêkolînên derbarê taybetmendîyên çalakîyêke dîyar û têkildarî pêşveçûna dîroka mirovan şîrove dike.
- *Dîroka muzîkê*: Derbarê avabûna muzîka di nav demê de dinirxîne, şîrovekirin û vegotina çalakîyên dem û cihê wê dîyar ên bandorê li vê avabûnê dikin û biblîyografyaya muzîsyenenan dihundirîne.
- *Estetîka muzîkê*: Xweşikbûna bêalî û di berhem û îcrakirina muzîkê de li xweşikîyê her wiha bandora xweşikîyê ya di bîr û hestên mirov de digere.
- *Felsefeya muzîkê*: Li pey bersivên “muzîk çi ye, sedema hebûna wê çi ye?” dikeve.
- *Gelnasî (folklor)*: Berhevkarî, dabeşkirin, tehlîlkirin, şîrovekirina berhemên madî û manewî yên welatekî an gelekî li herêmekê dike û mebesta hevgihandinan van xebatan pêk tîne.
- *Muzîko-arkeolojî*: Muzîka serdemên berê û amûrên muzîkê wan serdeman lê dikole.
- *Muzîkolingûstîk*: Li peywenda ziman û muzîkê dikole.

⁵⁶ Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 68.

- *Muzîko-semantîk*: Li vegotin û watekirina muzîkê dikole.
- *Muzîktoterapî*: Bi hêstên berhemên muzîkê û bandora van hêstan a li ser mirovan ji bo mebesta tedawîyê pêk tîne.
- *Organolojî*: Çêkirin û cureyên amûrên muzîkê, cihê wan ên di nav mekanî de, fiqênî, tingînîya wan li gor çendanî û çawanîyê vedikole.
- *Psîkolojîya muzîkê*: Li pey bersivên “mirov çima muzîkê çêdike, çima guhdarî muzîkê dike, hîlbijartina derdora çêkirin û guhdarkirina muzîkê çi ye çawa ye?”
- *Sosyolojîya muzîkê*: Li têkilîya civak û muzîkê digere.
- *Termînolojîya Muzîkê*: Di huner, teknîk û zanista muzîkê de peyv, biwêj, têgehên taybet û xweser lê dikole.

Her wiha têkilîya etnomuzîkolojîyê bi dîrok, civaknasî û gelek zanistên civakî re heye. Ji hêla çarçoveya teorîk ve jî berhem û bergehên teorîsyenên li ser van şaxan, etnomuzîkolojîyê dermale dikin. Etnomuzîkolog di domahîka xebatên qad û etnografîk ên lêkolînên wan li ser de ji bo van lêkolînên xwe derbasî ser teorî û kaxezê bikin jî van şaxên zanistên li jor bi kar tînin. Bi demê re zimanzanî, psîkolojîya bîrbirî, psîkolojîya civakî, hetta zanistên norolojîyê lê zêde bûne.⁵⁷ Her çend şaxên zanistê yên ku etnomuzîkolojî ji wan sûdê werdigire bikare bê dûvdirêjkirin jî bi giranî du şaxên zanistê di etnomuzîkolojîyê de xwedî rist in: *Etnolojî û muzîkolojî*. Em ê berê xwe bidin van her du şaxên zanistî.

1.4.4.1. Etnolojî

Etnolojî, ji du peyvên Yewnanî “ethnos”(qewm, netewe, gel) û “logie” (zanist) tê. Ev şaxa zanistê veqetandin, binyad û çêbûna mirovan a nijadî; têkilî û wêsfên nijadan ên li gel hev lê dikole, berawirdî û dabeşkirina wan dike. Guherîn, pêşveçûn û çavakanîyên di nava avanîya çandê de lê dikole; hewl dide ku bi dane, zagon, rêgez û encaman ve girê bide. Etnolojî, dîyardeyên bi baldarî hatî vedan, bi dubarekirinan hatî piştrastkirin û bi rêkûpêk hatî senifandin hildigire dest. Ji heman

⁵⁷ Etnomuzîkolojî Üzerine Yrd. Doc. Dr. Mehtap Demir Söyleşisi, <https://www.youtube.com/watch?v=z0eU2Yg1YG0>, (drk. jgr. 03.07.2018).

bûyerên bi şewêyên cuda rû dayî hewl dide zagon û rêzikên gelemperî derxe. Ji dema niha zêdetir hewldana keşfkirina dema borî dike.⁵⁸

Cudahîya di navbera zanista “antropolojî”ya ku taybetmendiyên mirovan ên civakî-çandî, her wiha taybetmendiyên fizîkî-bîyolojîk jî bi giştî dihewîne û “etnolojî”ya têkildarî çandê; di sedsala 18’an a Ewrûpayê de teşe girtîye. Çi antropolojî çî jî etnolojî û etnografyaya şaxên wê, li ser nûnertî, şîrovekirin, têgihiştin, vekolandina “ên din” bi cih bûye û xwe ristîye. Bi taybetî jî civakên ne rojavayî yê wekî “kevnare” , “bênivîs” , “bêdewlet” û “qebile” hatî binavkirin, bûne mijara lêkolîn û vekolînên etnolojî û antropolojîyê.⁵⁹ Lê belê ji bilî civakên wekî “kevnare” û “xwezayî” bîn binavkirin, li ser gelek civakên serdest û xwedî şaristanî jî xebatên zanistî yê etnolojîk û antropolojîk hatine kirin.

1.4.4.1.1. Mijarên Etnolojîyê

Etnolojî mirovan ne weke hêmaneke bîyolojîk lê weke afirênerên çandê hildigire dest. Bi giştî li ser 5 mijaran radiweste:

- a) *Çanda maddî û Teknolojî*: Ji bo bidestxistina qût û xwarinê, hemû amûr û alavên pêwîst; şeweyên xaniyan û avakarina wan, îmalata firax û amanan, kargeh, amyar (wesayît), çek û sîleh, amûrên nêçîrê, xefk, daf, kemîn, cil û berg, alavên xemlê hwd.
- b) *Aborîya demên berê*: Hilberîn (karbeşîya xwezayî, karbeşîya teknîk, destkarî/zenaat, zibare) , mezaxtin (parvekirin, pevguherîn, bazirganî) , mal-milk, bazar, amûrên hilberînê û bikaranîna amûran, bandora aborîyê li çanda manewî û bandora çanda manewî li aborîyê, bandora derdorê li ser aborîyê, ahenga li hawîrdorê, aborî û guherînên li hawîrdorê bûyî.
- c) *Organîzasyona civakî*: Kevneşopî, nerît, tore, adet, qeyd, cureyên malbatan, komên xizman, pîr û kal, fêrbûnîyên civakî, çînên civakî, sazîyên aborî û olan, bi kurtasî avanîya civakî tev.

⁵⁸ Jean Servier, *Etnoloji*, wer. Mehmet Ali Kayabal, İletişim Yayınları, Cep Üniversitesi, Presses Universitaires de Fransa, 1992, r. 65.

⁵⁹ Sibel Özbudun, Balkı Şafak, *Antropoloji: Kuramlar/Kuramcılar*, Dipnot yayınları, Ankara, 2005, r. 75

- d) *Ol û efsûn*: Bandora hêzên derxwezayî û wesfên wan, şêweyên têkilîyên mirovên pîroz (sêhrbaz, şaman, rahib hwd)
- e) *Huner*: Wêne, peyker, muzîk, şano, reqs, wêje, mîmarî, lîstik.⁶⁰

Etnografî ji bo etnomuzîkolojîyê rêbaz û teknîka herî bingeîn e. Zanistekê ku mulakata dorfirehî, hevdîtinên rû bi rû, xebata lêkolîner a salekê li qadê kirî jê re pêwîst in.

1.4.4.2. Muzîkolojî (Muzîkzanî)

Muzîkolojî şaxekê zanistî ye ku bi awayekî giştî, taybetmendî û guherînên muzîkê ji hêla akademîk û zanistî ve vedikole. Mijarên weke şêweyê muzîkê û nivîsîna notayê jînenîgarîya bestekar û stranbêjan, peresîna amûrên muzîkê, teorîya muzîkê (armonî, melodî, rîtm, form, mod, rêz) estetîk, akustîk û deng, fîzyolojîya guh û destan dikevin nav qada xebata muzîkolojîyê.⁶¹ Muzîkzanî, pêşveçûna dîroka muzîkê û binyada zimanê muzîkê vedikole; derbarê hemû hêmanên muzîkê de dane, belge û dîyardayan berhev dike û ji bo bikaranîna wan pêşkêş dike; vekolîn û şîroveyan li serê dike.⁶²

Feza Tansuğ a etnomuzîkolog di hepveyvîneke li gel wê hafî kirin de muzîkolojîyê wisa pênase dike: Ev şaxa zanistî ya civakî di hemû cure û şêweyên muzîkê de pêvajoyên hilberîn, îcra, belavkirin, mezaxtina çalakîyên amator û profesyonel ên muzîkê û li ser encamên wê, li ser zagonên bikêrbûn û binyadî yên di nav çanda muzîkê de lêkolînan dike û ji bo wesfîkirina muzîkê pêşniyaran dike.⁶³

Têgeha muzîkzanîyê, di dawîya sedsala 19'an de dema zanista muzîkê li zanîngehan bi cih bûyî, ava dibe. Lê elbet xabatên zanistî yên li ser muzîkê digêhêjin serdamên berê. B.Z di sedsala 6'an de tê îdiakirin ku filozofê Yewnanî Pîsagor têkilîya navbeynê bingeîn ên rêzên dangan bi pêjimarên matematîkê re danîye. Lê derbarê vê angaşte de îro tu belge nîn in. Ji serdema Pîsagor û vir de muzîkzanî cihê xwe di nav zanistan de parastîye, demake dirêj li gel bîrkarî û zanyarîyên xwezayî yên îro cih girtîye. P.Z di sedsala 500'an de Boethiusê serkêşê dewleta Romayîyan bi

⁶⁰ Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 78.

⁶¹ Vural Sözer, *Müzik Ansiklopedik Sözlük*, Remzi Kitabevi, İstanbul, 1996, r. 112.

⁶² Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 86.

⁶³ Vural Yıldırım, Tarkan Koç, *Müzik Felsefesine Giriş*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2003, r. 23.

xabatên xwe yên zanistî yên li ser muzîkê daye xuyakirin ku tevî arîtmêtîk, geometrî û astronomîyê, muzîk jî zanistêke têkildarî bîrkarîyê ye.⁶⁴

Serdema girîng a bersiva “muzîk çi di hundirîne?” yê li Ewrûpayaya ku jîyana ramangerî û rewşenbîrî êdî dewr li xwe gerandî ya dawîya sedsala 17’an heta nîveka sedsala 19’an derdikeve holê. Berhema Bourdelot Bonnetê Fransî ya bi navê “Historie de la Musique” ya 1715’an de çap bûyî, yekemîn pirtûka dîroka muzîkê tê pejirandin. Di sala 1792’an de Johann Nikolaus Forkel bi bîblîyografyaya xwe ya bi navê “*Allgemeine Litteratur der Musik*” muzîkzanîya dîrokê weke “lîteratura teorîk” û “lîteratura pratîk” kirîye du beş. Peyva muzîkzanîyê cara yekemîn di sala 1827’an de, di sernivîsa gotara pedagogê bi navê Johann Bernhard Lagier de wekî “*System de Muzisk-Wissenschaft*” (Pergala Muzîkzanîyê) derbas dibe. Di salên 1960’an de têhega muzîkzanîyê bi awayekî berbelav tê bikaranîn. Di sala 1885’an de bi derxistina kovara bi navê “*Vierteljahrschrift für Musikwissenschaft*” (Xebatên Muzîkzanîyê yên Çaryeka Sedsalê) têhega muzîkzanîyê bi awayekî giştî bi cih dibe. Yek ji hevkarê avakerên vê kovarê Guido Adler e di gotara xwe ya bi navê “Rêç û Bergeh û Hedefên muzîkzanîyê” de muzîkzanîyê weke “dîrokî” û “pergalî” dike du bir.⁶⁵

Diroka muzîkê, di van xebatên navborî de weke muzîka Ewrûpayê ya pirdeng û muzîka klasîk a rojavayî tê nirxandin û vekeolandin. Di peywenda nirxandina xebatên ewil ên li ser muzîkolojîyê de ji bilî muzîkên Ewrûpayî tu normên muzîkên gel û civakên dîtir nehatine nirxandin. Jixwe ji ber van kêmasî û pêşveçûnan piştê bi dermalebûna muzîkolojîyê ya ji zanistên din, fikr û ramanên pêşxistina etnomuzîkolojîyê derdikevin holê. Bi pêşketina zanistên weke etnomuzîkolojîyê yên derbarê muzîkê de muzîkzanî heta roja me ya îro pênaseyên xwe her rojane kirine. Heta xebatên li ser muzîkê hebin û pênase lê berfireh bibin jî wekî her şaxa zanistî wê nirxandin lê bîn kirin.

Li gor daneyên li jor hatî destnîşankirin bêyî ku mirov bikeve nav kitekitên dûvdirêj, pênaseya muzîkolojîyê (muzîkzanî) bi vî rengî dikare bê berhevkirin: Muzîkolojî ji hunera muzîkê tê û li nivîsîna nota, enstruman, teorîya muzîkê, dîroka

⁶⁴ Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 88.

⁶⁵ h.b. 90.

muzîkê, hêmanên akûstîk û estetîkê dikole. Her wiha bi rêbazên zanistî û akademîk, xebatên muzîkê weke hêmaneke civakî hildigire dêst û bi taybetmendiyên fîzyolojîk, psîkolojîk û sosyolojîk zagonên bikêrbûn û binyadî yên wê derdixe holê, derbarê wesfên muzîkê de pêzanîn û pêşniyaran pêşkêş dike.

1.4.5. Nêzîkahî û Modelên li ser Etnomuzîkolojîyê

Ji ber ku her nêzîkahîyek modelekê bi xwe re tîne û her model jî xwe dispêre nêzîkahîyêkê, di vê beşê de em qîma xwe pê tînin ku nêzîkahîyên teorîk ên ji bo geşbûna etnomuzîkolojîyê derketî pêş, têkildarî çand û muzîkê bi çend agahîyên sereke û bingeîn ên zanistî pêşkêş bikin.

1.4.5.1. Peresanparêzî

Peresan (Evolution) ew teorî ye ku hewl dide guherîna bi demê re ya mirovan û derdora wan bide xuyakirin. Rêgezên peresanê ku di sala 1859'an de ji aliyê Charles Darwinî ve hatî dîyarkirin, tenê ne di qada bîyolojîyê de, li ser zanistên derbarê mirov û civakê de jî bandorên mezin ava kirin. Li gor teorîya Darwinî, hemû zindîyên li dinyayê ji xwerûbûnê ber bi kompleksbûnê ve veguherîne. Li gorî neqandina xwezayî, mayîna zindîyên xurttirîn ên li jînê (survival) û di encama ahenga zindîyan a hawîrdorên cihê de, zêdebûna gelek cureyan (variant) xalên sereke yên vê teorîyê ne. Mebesta vê teorîyê bo bikaranîna zanistên civakî ew e ku bi bikaranîna daneyên zanistî avakirina "ji nû ve" ya mirovahîyê û deranîna qonaxên zû yên di derenceya pêşketina mirovahîyê ye.⁶⁶

Di salên 1870'an de Edward B. Tylor, Henry L. Morgan û Herbert Spencer, rêgezên Darwinî ên peresana bîyolojîk ji bo civakên mirovan şîrove kirine û pêşengîya vê nêzîkahîyê di zanistên civakî de pêş xistine. Tylor di sala 1871'an de bi weşandina xebata bi navê "Çanda Kevnare" (Primitive Culture) angaşt dike ku di navbera terz û kevneşopîya jîyanê ya civakan de û di navbera ol û têgehên edebî de hin manendî hene. Li gorî wî sedema vê manendîyê dêhn, raman û xwezaya mirov û

⁶⁶ Ayhan Erol, *Mûzik Üzerine Düşünmek*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2015, r. 33.

pêşveçûna çanda mirovatîyê bi heman rêyên manendî de derbas bûne. Her wiha dibêje ku berdewamkirina zindîyên xurttirîn ên li jîyanê, ji bo çandê jî derbasdar e.⁶⁷

Kesê yekemîn ê teorîya peresanê xwestî ji bo xebatên li ser muzîkê bê pêkanîn, Guido Adler e. Adler û hevalbendên wî pê derxistine ku stranên bavikên wan ên Ewrûpayê dişibin stranên “kevnare” yên mirovên Awustralya, Afrîka û Asyayê. Bi alîkarîya perspektîfa peresanê bi ser ve bûne ku ev stranên navborî yên van gelan bi çî rengî guherîn bi wan ketîye û piştî pêvajoyên peresanê gihiştine civaka wan a îroyîn. Pêşniyarên Adlerî, ji bo Carl Stumpfê ku li ser stranên Çermserên Bellakula vekolînên binyada newayî kirî; piştî jî ji bo E. M. Von Hornbostel, M. Kolinski û G. Herzog dibin mînak.

Di vekolîn û lêkolînên li ser zanistên weke muzîk, etnolojî û etnomuzikolojîyê de bi her hêla xwe ve her çend teorîya peresanê rûnenê jî dikare ji bo geşbûna rêbazên zanistî bibe ronahî, feyz û nêzîkahîyeke nû.

1.4.5.2. Fonksîyonelî

Fonksîyonelî ew nêzîkahî ye ku tevî binyada bûyer an jî hêmanan xwe dispêre metnê û bi çalakîyên guhdarîkirinê û bi bertekên piştî çêbûyî pêşekîyê dide peywenda tevayîya civak-çandî û mercên fîzîkî. Fonksîyon dikare weke peywira heyber an jî kesekî ya di qonaxa xwe de girtî ser xwe bê binavkirin. Hêmanên çandê yên li gor pêdivîyekê derketî holê, binyadeke fonksîyonelî dihewîne. Mirov di nav binyada civakî de ji bo armancên xwe bibin sêrî û pêdivîyên xwe pêk bînin mecbûrî rêxistinbûn û sazîbûnê ne. Sazî û hêmanên çandî di nav têkilîyeke simbiyotîk de ne. Di vê têkilîyê de dema guherîneke organîk a giştî çêbibe, hêmana çandî yan nema têrê dike an jî ya derbasdarîya xwe ji dest dayî û sazîyên wê; dê peywira xwe bo yên nû bihêlin. Bo nimûne, ji bo pêdivîya ronahîyê alavan bi vî rengî fonksîyona xwe dewrî ya nû kirîye: Çira-find-fanos-lembeya gazê-lembeyên elektrîkê... Her wiha ji bo hilanîna dangan amûran wisa peywira xwe derwî ya din kirîye: Gramafon-plak-kaset-CD-DWD...

⁶⁷ Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 105.

Pêşengên Franz Boas û xwendekarên wî ne ku di avabûn û pêşveçûna vê nêzîkahîya teorîk de rolên wan ên sereke çêbûne. Avakerê vê teorîyê B. Malinovski û Radcliffe-Brownê ne ku bi xebatên xwe yên qadê yên bêyî haya wan ji wan heyî gihiştine heman çarçoveya teorîk. Nêzîkahîya fonksîyonelî muzîkê weke parçeyekî tevahîyeke organîk hildigire dêst û bi giranî li pey vî parçeyî ye ku di nav pergala çandê de çî fonksîyona wê heye.

William Bascom di folklorê de dahûrandinên fonksîyonel pêşniyar kirine. Yên herî girîng bi çar xalan bi awayekî sade komî ser hev kirine. Ev xal binyada di dahûrandina fonksîyonî ya muzîkê de tîk bikaranîn.

- a) Fonksîyona dembuhêrka xweş, kêfîkirin û kêfanîn
- b) Fonksîyona piştgirîya nirx, tore û sazîyên civakê
- c) Fonksîyona fêrkirina bi neqîlîkirinê bo nîfşên nû
- d) Fonksîyona rizgarbûna ji pêkutîyên civakî û takekesî⁶⁸

1.4.5.3. Dîrokî

Di sedesala 19'an de derketina vekolîna dîrokî ya li Ewrûpayê û nêzîkahîya dîrokî ya bi vê pêlê re derketî, ji nêz ve bi herka netewparêzîyê re tîkildar e. Di sedesla 19'an de herkên netewparêz ên li Ewrûpa derketî ji bo nirxên pêwîst ên fikra xwe pêdivî bi nêzîkahîya dîrokê dîtine. Li gorî Yetkin Özer dîrokîbûn, çavdêrîkirina bûyer an jî dîyardeyekê di nav mercên dîrokî de ye. Mijara vekolînê di nav perspektîfa dîrokî de dinirxîne. Perspektîfa dîrokî sedeme derketina dîyardeyan li gorî pêşveçûnên dîrokî vedikole. Li gorî vê pênaseyê vekolîna muzîkê ya dîrokî, dîyardeyên tîkildarî raborîyê; di nav pêvajoyên serbixwe yên ne peywendîdarê wan lê yên di derketina wan de bandor kirî, bi belge û daneyan hewl dide ku vekole.⁶⁹

1.4.5.4. Binyadgerî

Nêzîkahîya binyadgerîyê di nîveka sedesala 20'an de derketîye û piştî Şerê Duyemîn ê Cîhanê nemaze bi xebatên pêkanîner û teorîsyenên Fransî çalak bûye. Sedema domdarîya guherbarî, cudahîyên demê û mekanê destnîşan dîke û hedef dîke

⁶⁸ Özkul Çobanoğlu, *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Çağ Yayınları, Ankara, 1999, r. 226.

⁶⁹ Yetkin Özer, *Müzik Etnografisi*, Dokuz Eylül Yayınları, İzmir, 2003, r. 67.

ku gerdûnîbûna di navbera mirovan a di eslê xwe de heyî lê nexuya, derxe holê û hewl dide hêmanên parçebûyî yê civakî bibîne û wan bigihîne hev. Bi pirtûka Structural Anthropolojî ya ji aliyê C. Lévi Strauss ve di 1958'an de hatî nivîsîn, di nav zanistên civakî de dest bi nîqaşa vê nêzîkahîyê bûye. Rêgeza bingehîn a binyadgeran hemû tevgerên mirovan û “zagonên neguher” ên bingeha çalakîyên ramyarî dahûrîne û derxe holê. Ji ber ku neguherîyê derdixe pêş, nêzîkahîyên “peresanî” û “dîrokî” ji xwe re kirine hember.⁷⁰

Di vê nêzîkahîyê de bûyerên ku tu têkilîyên wan bi hev re neyî ne weke yekpareyên jev cihê lê weke rêzikên giştî yê bi hev re têkildar tê vekolîn. Binyadîparêzî ji ber redkirina afirandina takekesî; nirxandina mirovan a wekî veguhêzerên mekanîk û lêhûrbûna pêzanînen ku bi tenê xwe spartî metnê, hatiye rexnekirin.

1.4.6. Dengbêjî di Peywenda Etnomuzîkolojîyê de

Mirov hêj di malzaroka dîya xwe de, bi deng û muzîkê re nasyar dibin û ew têkilî heya mirinê didome. Çawa ku muzîk di nava jîyana me de ye, wisa jî peywîr û kêrhatîyên wê li ser nexşa asoyê me, şopên qewîn ên çandî dihêle. Bi vê yekê re hin çarçûm berdevk û barkêşîya hêstan dike, hin çarçûm jî çavkanîya zayîna hestên nû dike; bi kodên çandî yê muzîkê ku hatine fêrbûyîn sazkirina zagon, ehlaq, raman, afirênerî, perwerde hwd. li gor pêkanîna armancê carinan rêbazên herî bikêr in. Sedema bandorbûna vê yekê jî ji ber ku muzîk di nav zikê çandê de ye û awênebûna jîyana civakî dike. Berhemên dengbêjîyê ji ber ku kitekitên taybetmendîyên jîyana civakekê dihewîne, têgihiştin û watedarîya wê jî têkildarî wê civakê ye.

Di jîyana neteweyêke ku bi awayekî giştî, bi qada vegotina devkî hatî sînorkirin de, muzîk bi awayekî xwezayî û derasayî bûye xwedîyê cihekî taybet û bûye xwedîyê “erkên civakî” yê cîyawaz. Hema bêje hemû tiştên hatî jîyîn -tenê ne bûyerên dîrokî, hemû berhemên epîk, lehengî, pevçûn û destan, çîrokên lîrîk, nirxên

⁷⁰ Ayten Kaplan, *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013, r. 112.

mîstîk- bi saya mûzîkê hatine tomarkirin û bi vê rîyê ketine hafîzeyê kollektîf a civakî. Di vê pêvajoyê de tê zanîn ku ristên dîyarker ên dengbêjan hene.⁷¹

Çanda devkî bi taybetî jî muzîka Kurdî di warê nasnameya etnîk/çandî de bûye xwedî roleke sereke. Hema bêje hemû serpêhatîyên wan ên di jîyanê de ne tenê bûyerên dîrokî hemû berhemên epîk, pevçûn û qehremanî, çîrokên lîrîk nîrxên mîstîk û rîtuêl bi rîya muzîkê hatine qeydkirin. Bi vî şiklî hema bibêje di veguhêstîna û jîyandîna wan nîrxên civakî û kevneşopî de muzîk bûye navgîna sereke. Şêweyên vê muzîkê jî tîkildarî taybetmendîyên dengbêjîyê de di nav etnomuzîkolojîyê de dikare bê nîrxanidîn.

Dengbêj bîranînên xwe an jî bûyerên civakî yê bihîstî an jî dîtî, çîrok û efsane û serborîyan bi meqamên cihê yê guhestîna vedibêjin. Ji ber vegotîna melodîk, ew ji alîyê ve mûzîsyenên ku bîra wan gelekî xurt e. Her wiha mirov dikare bibêje ku çavkanîyên kevintirîn ê dîrokî-kevneşopî yê muzîka Kurdî dengbêj in. Çendîn hêla muzîkê ya dengbêjan hebe jî dengbêjî hunereke pîralî ye ku *Rênas Jîyan* di vê derbarê de dinivîse: Di muzîka Kurdî de şêwaza herî mezin û orjînal dengbêjî ye; çawa di operaya Romantîk de –bi taybetî di operayên Wagnerî de – wêje, wêne, şano, mîtos, dîrok, felsefe û muzîk di yek formê de sentezkirî bin, di dengbêjîya Kurdî de jî ev huner sentezkirî ne; dengbêjî opera ye, dengbêjî roman e, dengbêjî, senfonî ye.⁷²

Di çarçoveya etnomuzîkolojîk de dengbêjî kodên etnîk ên xweser di nav xwe de dihevwîne. *Dönmez* wisa kodên muzîkê destnîşan dike: Kodên nasnameya milî îşaretên ku endamê cemaatekê dişînin bo “ên ji xwe”. Bi gotîneke din şêweyekî ragihandîna û danûstandîna yê endamên cemaateke (ol, etnîk, bîrdozî hwd.) hevpar in.⁷³ Ev kodên navborî pîrî caran ji endamên wê cemaatê pêvetir bo kesên din tişteki îfade nake. Li gorî vê yekê bi naveroka berhemên dengbêjîyê pîr hêsan e ku mirov kod û daneyên veşartî û eşkere yê civaka Kurd derxe holê û bi wan daneyan li ser jîyana wan nîrxandînan bike. Ji vî alî ve di seranserê vê xebatê de ev kod û xweserîyên dengbêjîyê dê bibin rîknên me yê alîkar bo nêrînên etnomuzîkolojîk.

⁷¹ Erol Mutlu, *Kürt Müziği*, Avesta Yayınları, İstanbul, 1996, r. 55.

⁷² *Rênas Jîyan, Çirûskîzm*, weş. Belkî, Stenbol, 2012, r. 456.

⁷³ Banu Mustan Dönmez, *Sosyal Bilimler Araştırma Dergisi*, Bölgesel Müzik Kültürleri İçinde Bulunan Etnik Kimlik Kodları Üzerine Analitik Bir Değerlendirme, c.2, 2011, r. 157.

Li jor pênase û nirxandinên li dor etnomuzîkolojîyê hat dîyarkirin ku ev zanist çarçoveya muzîka çandekê vedikole. Bêguman dengbêjî û her cure û berhemên wê têkildarî muzîka çanda Kurdî didin dîyarkirin. Di vî warê de dengbêjî taybetmendîyeke xweser e ku ji hêla pîvanên etnomuzîkolojîk bê vekolîn û nirxandin.

BEŞA DUYEMÎN

2. VEKOLÎNEK LI SER JÎYANA MIHEMED ARIF CIZÎRÎ

Huner çalakîyek e ku li ser bingeha civakî tê afirandin û îfadeke ku kitekitên jîyanê di nava xwe de dihevine. Têkildarî jîyana kesekî hêmana civakê gelek aliyên avabûna kesayetiyê temsîl dike. Heta mirov kitekitên jîyana kesekî û civakê baş nas neke û tehlîl neke, dê ne hêsan be mirov bikare nirxandin û şîrovevîyên zanistî li ser hunera wê civakê an jî wê/wî kesê/î bike. Ji vî alî ve pêwîstî pê heye di serî de jîyana afirênerê wê hunerê piralî bê raçavkirin da nirxandinên li ser berhemên hunerî baştir darîçav bibin. Ji ber ku huner gelek caran awênetiya jîyanê dike, jînenîgerariya hunermendan yek ji riknê etnomuzîkolojîyê ye. Li ser vê yekê di serî de bi awayekî berfireh em ê berê xwe bidin ser jîyana Mihemed Arif Cizîrî û sosyolojîya tê de ava bûyî û xwe tê de heyî kirî.

2.1. Jîyana Mihemed Arif Cizîrî

Tevî ku gelek berhemên nivîskî û dîtbarî li ser jîyana Mihemed Arif hebin jî pîvanên van berheman gelek caran ne akademîk in, ji analîz û tesbîtên zanistî hinekî dûr in û gelek caran ev dane bi tenê li ser pesn û pendên serborîya hunermend in. Her çawa jî be têkildarî jînenîgarîya Mihemed Arif de heta ji dest hatî em ê sûdê ji aliyên dîrokî yê van berheman jî bigirin. Di binbeşên jîyana Mihemed Arif de, dê jêderk ji çavkanîyên nivîskî, deng û dîtbarî yê wekî pirtûkên çapkirî û yê dijîtal bîn girtin û bi awayekî kronolojîk bîn rêzkirin. Şanseki gelekî mezin e ku Mihemed Arif Cizîrî di dîroka 23.09.1979'an de bi dengê xwe di civatekê de "*Tarîxheyat*"a xwe vegotîye û ev deng ji aliyê Babê Mêhvanî ve hatîye tomarkirin. Bi deşîfrekirina vê tomarê re û bi gelek daneyên din di binbeşên jêr de dê hêl û kitekitên jîyana Mihemed Arifî bîn destnîşankirin.

2.1.1. Zarokî û Malbata wî

Mihemed Arif Cizîrî yê ku naskirî ye, bi navê Mihemed Arif Cizrawî (*bi erebî*), Babê Kerîm, di sala 1912'an de li Cizîra Botan Taxa Mîr Elî çavên xwe li

jîyanê vekirine. Navê bavê wî Arif Mihemed Kerîm e û yê dîya wî Edla Reşîd e. Bi navê Salih birayekî wî û bi navê Fatima û Asîya du xwişkên wî hebûne.⁷⁴ Dîya wî Edla jî dengbêj bû ku di dawet, şahî û şînan de distrand. Mihemed Arif li ber destê dengbêjekê mezin dibe ango dîya wî di heman deme de çavkanîya wî ya yekemîn a hunerî ye. *Kakşar Oramar* derheqê wê serdema dengbêjên jin ên Cizîrê de van agahîyan dide: *Di wan salan de li Cizîrê ji bilî Edla xanima dayika Mihemed Arif, sê jinên din jî hebûn ku ew weke mamostayên hunermendên weke Hesên Cizîrî, Remezan Cizîrî, Mihemed Arifê Cizîrî, Seîd Axayê Cizîrî û hwd dihatin hesabandin. Ji wan; Celoya Kor (Celîla Leylê) ku jinek feqîr û bêkes bû, Êmoya Cizîrî (dayika hunermend Remezan Cizîrî) û Nûrêya dayika mamostayê hemû hunermendên Cizîrê Edoyê Nûran, mîna Edla Xanimê kilam digotin û di civata Kurdan de, gelek hosta bûn. Dema di şahî û dawetan de van xanimên Kurd mil didan hev, bi stranên xwe yê duqulî û sêqulî dewatker dişarandin.*⁷⁵ Li Cizîrê gelek govend, şahî û aheng bi stran û kilam û bêlîteyên dengbêjên navborî tên gerandin û gelek pîrozwerîyên weke; li sinetkirin, xitimkirina Qur'anê, veqera Hecîyan ji Hecê qesîde û Mewlûd dixwendin.⁷⁶ Ev atmosfera dengbêjan bi awayekî xwezayî dibin dibistana hunerî ji bo zarokan. Dema mirov van rastîyên ku Mihemed Arif tê de mezin bûyî li ber çavan bigire, bêhtir dê bê famkirin ku Mihemed Arif çawa dê di salên pêş xwe de berê xwe bide stranbêjîyê. Her wiha mijûlbûna Mihemed Arif ya li ser hunerê ku ji zaroktîyê tê, Babê Mêhvanî yê ku wî ji nêzîk ve nas dike wisa qalê dike: *Gelek stran ji dîya xwe bihîstine. Hindek stran jî ji Edoyê Nûranî bihîstine. Hêj deh salî ji dar û depî tembûrekî çêdike û pê stranên dibêje.*⁷⁷

Ew hêsta du salî ye Şerê Yekemîn ê Cîhanê (1914) dest pê dike û bavê wî bi hukmê leşkerî dibin şer û ji şer venagere. Kes nizane çî bi serê wî hatîye. Bi hilweşandina dewlata Osmanî re qeyran, şer, xela, sefalet û hejarî dibe qedara hemû kesê li vê herêmê. Ji ber wê çendê jî ji bo peydakirina gezek nan, gel bi derbederî dijî. Mihemed Arif, bi sêwîtî mezin dibe hê di temenekî biçûk de mecbûr dimîne

⁷⁴ Zeynep Yaş, *Şakarên Muzîka Kurdî*, c.1, weş. Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2015, r. 191.

⁷⁵ Kakşar Oramar, *Ji girtîgeh û avkêşîyê heya efsaneya Mihemed Arifê Cizîrî*, <http://muzikKurd.blogspot.com.tr/2012/03/efsaneya-mihemed-arife-ciziri.html>, (drk. jgr. 01.05.2017).

⁷⁶ Zeynep Yaş, *Şakarên Muzîka Kurdî*, c.1, weş. Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2015, r.192.

⁷⁷ Hevpeyvîna li gel Babê Mêhvanî, Jîyana Hunermed Mihemed Arif Cizîrî, Zagros Tv 2018 <https://www.youtube.com/watch?v=0wO3zU4hMNs> (drk. jgr. 13.01.2019).

dikeve nav handana kar û barê debarê. Li gel xwişk û birayê xwe alîkarîya malbatê dike û ji kanîyên berkenarê Şetê Botan (Çemê Dîclê), bi qantiran avê dikişînin, pê debara xwe dikin.⁷⁸

Şert û mercên zehmet ên serdema Şerê Yekemîn ê Cîhanê li heremê bi her zorî û dijwarîyê xwe nîşan dide û dikare bê gotin ku ji ber debara jîyanê ya bi her alîyê xwe ve dijwar, Mihemed Arif di temenê xwe yê biçûk de bi mecbûrî fêrî têkoşîneke zehmet li hemberî jîyanê dibe. Ev xizanî û zehmetkêşî dibe yek ji haveynê stranbêjî û dengbêjîya wî. Her wiha ev zorî dibe hêz û motîvasyoneke dehfiner ku kul û derdên xwe û daxwaz û hêvîyên xwe bi rîya stran û kilaman vebêje û ragihîne.

2.1.2. Salên li Girtîgeha Amedê

Malxalên Mihemed Arif ku bi eslê xwe Şingalî ne û ji binemala Şekir Axa ne, li rexê Başûrê Kurdistanê dimînin. Ji ber hejarî û neçarîyê gelek caran malxalanên wî harîkarîya wan dikin û li ser wan dibanin. Mihemed Arif jî tevî xalanên xwe diçe qaçaxê, li ser hidûd tevî xalanên xwe di sala 1925'an de tê girtin. Wê çaxê ji ber qaçaxîyê –sîleh, titûn hwd- wekî sûcên sîyasî dihesibînin û dibin girtîgeha Dîyarbekirê. Her di wê hingavê de li Bakurê Kurdistanê serhildana Şêx Se'îd û hevalên wî li dar e. Bi hinceta malê qaçax ji bo vê serhildanê ye Mihemed Arif û xalanên xwe bi hinceta alîkarîya serhildanê tên darizandin. Her di wê dema wî ya di hefsê de ye Şêx Se'îd tevî 46 hevalên xwe tên daliqandin.⁷⁹

Mahmut Beğik sedema girtina wî û salên li girtîgehê wisa dîyar dike: *Malxalên Mihemed Arif sîyasetmedar bûn di wan salan de li gel xalên xwe hatibû girtin. Di sala 1925'an de dema serhildana Şêx Se'îd de hêj Mihemed Arif 13 salî bû. Tevî hezaran Kurd li zindana Dîyarbekirê tê girtin. Di zindana Dîyarbekir de ew û Şêx Se'îd, Doktor Fuad, Ekrem Cemîlpaşa, Seyît Ebdûlqadir Nehrî (Serokê Îstanbul Tealîyê) li gel hev dimînin. Dema mirov bi sîyasetmedarên bizava Kurd re bimîne, mirov gelek tiştan ji wan fêr dibe. Mihemed Arif dibe şahidê van lehengên serdemê û*

⁷⁸ Zeynep Yaş, *Şakarên Muzîka Kurdî*, c.1, weş. Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2015, r. 191.

⁷⁹ h.b. 191.

*gelek tiştan ji wan fêr dibe. Gelek kes ji wan girtîyan tên bidarvekirin. Xalên wî hatine ber idamê lê ji ber ku ew zarok bû hukmê idamê jê negirtîye.*⁸⁰

Mihemed Arif bi tomarkirineke deng a Babê Mêhvanî girtî ya bi navê *'Tarîxheyata Mihemed Arif Cizîrî'* ya di 23.09.1979'an de wiha behsa wan salên xwe dike: "... piştî wê re mûsîbet hatin serê me: Feqîrî, rezalet... Bi çol û beyaran ketin. Derîyê xurbetê... Derîyê xurbetê çi? Gelek alemê mû'cizat bi serî de hatine. 4 sal û 3 heyîvan ez di hepsa Dîyarbekirê de mam. Imrê min 13-14 salî bî. Hevalên min hemî hepis kirin, hemî ew kirin, hemî şeniqandin, ez li ber hukmî neketim, ez berdama. Ez bo xwe bi dinyayê ketim..."⁸¹ Her çend di gelek çavkanîyan de sedema girtina wî wekî qaçaxî an jî alîgirê Serhildana Şêx Se'îd bê destnîşankirin jî hin îdiayên ku ji ber hin sedemên din hatîye girtin jî hene. Mihemed Arif an ji ber tirsê girtinê, an ji şermê, an jî ji ber sedemên din ên şexsî, dema qala jînenîgarîya xwe dike, qala serdem û mekanê dike lê qala sedema girtina xwe nake. Lê dema em şert û mercên wê serdemê û atmosfera piştî şerê cîhanê yê yekemîn û çewisandinên li dijî serhildanên Kurdan bidin ber çavan, tê texmînkirin ku Kurdbûna wê demê bi serê xwe jî besî tawanbarkirin û mehkûmkirinan bû.

2.1.3. Rêwîtiya wî ya ber bi Başûr ve

Di sala 1928'an de efûya li ser zordana serhildana Agirîyê pêk hatî Mihemed Arif ji girtîgehê derdikeve. Piştî ku ji girtîgehê derketî 3 rojan li Cizîrê dimîne, dû re êdî pê dizane ku nema dikare li warê bab û kalên xwe bijî, ji ber rewşa sîyasî ya wê demê û nebûna şert û mercên aborîyê, bi birayê xwe yê mezin re berê xwe dide Başûrê Kurdistanê ku wê demê di bin desthilatdarîya Îngilîzan de ye û derfetên aborî baştir in. Mihemed Arif berê xwe dide bajarê Zaxoyê ku wê demê warê gelek derbederên sirgûnkirî ye.⁸² Piştî demeke biçûk a li Zaxo derbasî Dihokê dibe. Wê çaxê xwedîtiya wî ya tişteki nebû ji xeynî stranbêjîyê bi şixul û karekî din nedizani. Mihemed Arif di tomara deng de wisa behsa wan salên xwe dike: *"Ez bi dinyayê ketim. Çend salan ji emrê şazdehê ji Cizîrê derketim. Hatim Dihoka Dasinya. Li*

⁸⁰ Bernameya Nûçegihan, Nevzat Aladağ, hevpeyvîna bi Mahmut Beğik re, 2015 <https://www.youtube.com/watch?v=g7XTW6DOEUM> (drk. jgr. 18.01.2019).

⁸¹ Beşîr Ant, *Bilbilê Kurdistanê Mihemed Arif Cizîrî*, weş. Ba, Stenbol, 2012, r. 30.

⁸² Zeynep Yaş, *Şakarên Muzîka Kurdî* c.1, weş. Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2015, r. 192.

*Dihokê hevalek yê min hebî. Navê wî Hesên Cizrawî bî. Ez û wî şairîyê geran. Mala muxtaran, deran, axayan... Me xwe xudan dikira. Piştî wê re me'lime halê me ne xweş bî, em feqîr bîn. Me heta yekê, axayekî an dostekî 3 dîrhem 4 dîrhem bidan me... Heta ma çakît dikirî, şalwarê me diqeta. Heta me cemedanî dikirî pêlav di lingê me de nedima. Me hingî şairî wisa dikir.*⁸³ Her çend di nav xizaniyê de be jî Mihemed Arif di salên pêşîn ên di xortaniya xwe de li herêma Behdînan, deng û awaza xwe dide nasîn. Wan salan Kakşar Oramar wisa destnîşan dike: *“Li bajarê Dihokê piştî ku rewşa jîyana wî hinekî baş bû, li wir xwaringehê biçûk ji xwe re vekir. Di rojên ku li xwaringeha xwe dixebitî jî gel li dora wî kom dibûn û bi bihîstina kilamên wî dilşa dibûn. Jîyanek asayî ji bona wî dest pê kiribû. Bi piranî rojê di xwaringeha xwe de dixebitî û şevê jî di dewat, şahî an jî di nava xem û xweşîyên feqîr û di dîwanxaneyên axayên herêmê de distirî.”*⁸⁴ Bi geryana Mihemed Arif a li gund û bajar û navçeyên herêma Behdînan, dikare bê gotin ku wî gelek repertuar û tecrûbeyên stranbêjîyê li ser mîrata xwe zêde kirine û têkilîyên civakî û berhemên folklorîk ên cihêreng tevî asoyê xwe yê hunerî kirine.

2.1.4. Qehwexaneya Fermanê Çaycî

Di warê pêşxistin û belavkirina huner û hunermendîya Mihemed Arif Cizîrî de divê çêl li Fermanê Çaycî (Fermanê Reşîd) bê kirin. Fermanê Çaycîyê Zaxoyî ku lehengê herî sereke ye ji bo nasandin, tomarkirin û binavûdengkirina Mihemed Arif Cizîrî, bi qehwexaneya xwe ya li Zaxoyê dibe navendeke hunerî bo hunermend û hunerhezên Kurd. Mihemed Arif piştî ji Cizîrê tê qehwexaneya Fermanê Çaycî li wir hunera xwe lê diafirîne û li wir hunermendan nas dike. Li gorî agahîyên Mahmut Beğik dide, piştî Mihemed Arif ji Cizîrê tê başûr li Zaxo Fermanê Çaycî nas dike ku ev mekân cihê hunermendên Kurd e û li wir hev nas dikin û hunera xwe pêşkêş dikin: *Mihemed Arif piştî ji girtîgehê xelas dibe tenê 3 rojan li Cizîrê dimîne paşê bi birayê xwe re derbasî Zaxoyê dibe. Li wir ew û Fermanê çaycîyê ku bi gelek hunermendên weke Meyremxan, Nesrîn Şêrwan, Se'îd Axayê Cizîrî tên cem wî, hev nas dikin. Qehwexaneya Ferman weke navendeke hunermendan e. Li wir hunermend*

⁸³ Beşîr Ant, *Bilbilê Kurdistanê Mihemed Arif Cizîrî*, weş. Ba, Stenbol, 2012, r. 33.

⁸⁴ Kakşar Oramar, *Ji girtîgeh û avkêşîyê heya efsaneya Mihemed Arifê Cizîrî*, <http://muzikKurd.blogspot.com.tr/2012/03/efsaneya-mihemed-arife-ciziri.html>, (drk. jgr. 01.05.2017).

hev nas dikin. Mihemed Arif jî bi nasyarîya Ferman van hunermendan nas dike.⁸⁵ Her wiha agahîyên Beşîr Ant jî di vê derbarê de wiha ne: *Mihemed Arif li Zaxo di qehwexaneyaya Ferman de (Ferman Reşîd, Babê Ebû Mêhvanî) gelek caran hefle (konser) dane. Heta nîveşevan di qehwexaneyên havînî de stran gotine.*⁸⁶ Qehwexaneyaya Ferman dika wî ya xwezayî û cihê civata wî bû.

2.1.5. Kufletên wî

Agahîyên derbarê zewac û kufletên malbata Mihemed Arif de ne pir in. Li gorî çavkanîyan ew di sala 1932'an de li Dihokê, bi jineke bi navê Nazê (*an jî Nazdar: Ji ber ku bi navê "ez pîr bîm Nazdara min" straneke wî heye ku avêtîye ser xwe û wê*) ku bi eslê xwe Colemêrgî re dizewice. Ji vê zewacê ji wan re kurekî bi Navê Kerîm, keçeke bi navê Asîya çêdibin. Nivîskar Beşîr Ant wisa qala kufletên malbata wî dike: *'Asîya heta dawîya temenê xwe nazewice û li gel dê û bavê xwe dimîne. Piştî wefata dê û bav û birayê xwe, di sala 2000'ê de jîyana xwe ji dest dide. Kurê wî Kerîm, sala 1991'an di wan rojên şerê Kendavê de, dema Emerîkayê Iraq bomberan kirî, li Mûsilê bi krîza dil wefat kirîye.*⁸⁷ Ji zewaca Kerîmî 4 kur û 3 keç çêdibin. Ango bi tevahî heft neviyên Mihemed Arif hene.⁸⁸

Piştî bicihbûna bi çend salan a li başûr Mihemed Arif dibe hemwelatîyê Komara Iraqê. Di sala 1932'an de piştî ku dizewice, dîsa di nava heman salê de diçe leşkerîya Iraqê. Mihemed Arif di tomara wekî Tarîxheyata wî tê zanîn de wisa dibêje: *"Ez li wê dê zewicîm. Hingê sala 32'ê ez bîm esker, eskerê Iraqê. Çend salan Min eskerî kir. Di ber eskerîyê de jî min stran digotin. Min sin'etê xwe betal nekir."*⁸⁹

2.1.6. Hevnasîna bi Hesên Cizîrî re

Bi giştî her çend zêde neyê zanîn jî yek ji xizmeta mezin a Mihemed Arif, keşfkirina hunermendê navdar Hesên Cizîrî ye. Mihemed Arif wî ji şagirtîya sefarekî digire û ber bi qada stranbêjîyê ve diqedimîne. Her çend Mihemed Arif herî zêde bi 6

⁸⁵ Bernameya Nûçegihan, Nevzat Aladağ, hevpeyvîna bi Mahmut Beğik re, 2015 <https://www.youtube.com/watch?v=g7XTW6DOEUM>, (drk. jgr.18.01.2019).

⁸⁶ Beşîr Ant, *Bilbilê Kurdistanê Mihemed Arif Cizîrî*, weş. Ba, Stenbol, 2012, r. 44.

⁸⁷ h.b. 31.

⁸⁸ Zeynep Yaş, *Şakarên Muzîka Kurdî* c.1, weş. Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2015, r. 192.

⁸⁹ Mp3, *Tarîxheyata Mihemed Arif Cizîrî*, deş. Yunus Orak, (13.05.2017).

salan ji Hesên Cizîrî mezin jî be -anku ji heman nîfşî ne- hostatî û pêşîvanîya wî dike. Mihemed Arif û Hesên Cizîrî zêdetirî bîst salan bi hevdu re huner afirandine ku ji terz û şeweya wan a nêzîkî hev di gelek civat, şevbêrk, şahî û çalakîyên hunerî de navê wan bi hev re tê hildan. Dikare bê gotin ku ji şagirtî û hostatîyê wêdetir, ji ber ku ew bi Hesên Cizîrî re xwedîyê heman çarenûs û serborîyê ne, terz û şeweya hunermendîya wan û repertuaran wan a hevbeş, endamên heman muzîka etnîk in û yeksanên hev in.

Mihemed Arif di hevpeyvîneke bi Ismaîl Geylanî re di sala 1979'an de kirî çîroka xwe û Hesên Cizîrî wiha vedibêje: *“Min Hesên Cizrawî rojekê li gundekî dît, sefarî dîkit, li ber re stranên dibêjît. Ez jî ji derekê dihatim, çûbîm cem hindêk axalêran, hevalan, koçk û dîwanxana... Dîsa şairê Kurda bîm ez ji berî wê demê. Min gote hostayê wî: ‘Tu nafîroşî vî kurikî? Ez ê ji te bikirim. Ev Cizîrî ye, tu didî min ez ji te bikirim vî?’ Hingî Hesên Cizrawî 13-14 salî tê hebû. Min guhdarî dengê wî kir, min got ev deng wê bi kêr min bihêtin. Dê berevanîya min bikît, li koçk û dîwanxana û deran... Me’lîme dê elimîbîya stranên. Gote min: ‘Dê bi çendê bikirî?’ Min gotê: ‘Te çend divê?’ Gote min: ‘Hema 3 dînanan bide min, bo xwe bibe.’ Min gote kurikî: ‘Hesên tu nayî bi min re, ez te bikim şa’ir?’ Got: ‘Wille dengê min xweş e, min divê li gel te bêm.’ Mi sê dînar da hostayê wî, min anî Dihokê û qedrê wî girt. Ez li Dihokê zewîcî bîm. Min cilên Kurdî êxistin berde. Şalê xwe û cemedanî min da serê wî. Min got: ‘De rabe Hesên Cizrawî em biçin, filan û filan stranê bêje!’ Got: ‘Pa ne ez nikarim weke te bêjim, çawa dê çêbit?’ Kelîmat min jê re gotin, elimî. Hindêk jî ji babê xwe girtibîn. Babê wî li Zaxo şa’ir bî. Bes dengê wî nebî, dengê Hesên hebî. Digotayê wisa kelîmatan bêje. Lê belê nedikarî ne’meya gelek biqulpîne. Ne’mê zehmet e qulpandina wê. Hingî min tembîr lêdida. Wê demê kesekî nedizanî tembîr çî tişt e. Axalêr û hevalan digot, ka ‘timbilbask’a xwe derxe û lê bide. Navê min jî ‘Delû’ bû. Ez û Hesên Cizrawî bûn. Digotin me, va ‘Delû’ hatin! Piştî midetekê navê me bû ‘Şa’ir’. Digotin, wa ye ‘Şa’ir’ hatin. Piştî mideta dî gotin, wa ye ‘Fenan’ hatin. Hesên Cizrawî bîst û çend salan, bi min re ma. Sê, çar rojan min û Hesên du hêk, sê hêk me dixwar. Xwarin jî nebî. Min wisa şa’irî kir. Ez ber seqlanekî de diçûm. Pêlava Hesên Cizrawî pê tîlê tembîrê min didirût. Heta me çakît dikirîya fanêrê me*

*diqeta. Heta me fanêre dikirî, cemedanîya me diqeta. Dê dê dê, me got dê çêbît.*⁹⁰ Li gorî van agahîyên Mihemed Arif, hevnasîna wan dikeve dûv salên leşkerîya 1932'an. Lê bi awayekî zelal sala wê tam ne dîyar e.

2.1.7. Qewanên wî yên Destpêkê

Divê bê gotin ku ji ber derfetên Başûr ku Îngilîzan serwerî demeke dirêj lê kirîye gelek şansên hunermendên vê beşê hene. Şirketên plakan ên Emerîka, Îngilîz û Fransî yên ku piştî şerê yekemîn ê Cîhanê hatî Iraqê ve gelek dengên hunermendên vê erdnîgarîyê tomar kirine. Tomara dengbêj û hunermendên ji nijadên cuda yên rojhilata navîn ên yekem li vir hatine tomarkin. Di vê babetê de divê em destnîşan bikin ku yekem qeydên deng ên Kurdî li vê beşê hatine girtin ku gelek ji wan gihiştine heta îro. Elbet ev derfetên serdemî yên teknolojîk ên we plak û pîkapan, ji nîyet û rastîyên mêtîngerîya Îngilîzan a herême nikare bê cudakirin ku me li jor di nav kurtedîroka etnomuzîkolojîyê ev yek destnîşan kiribû. Anku mebesteke sereke ya pêşxistina etnomuzîkolojîyê jî pênasekirin û berhevkirina çandên derveyî Ewrûpayî ye.

Di sala 1926'an û pê de gelek şirketên Îngilîz, Erebi û Cihûyan li Bexda dengên nû tomar dikin û wan tavêjin ser qewanan. Cara pêşî hunermenda Kurd Elmas Mihemed (*Elmas Xan*) di sala 1928'an de, piştî Meyrem Xan, dûre jî Se'îd Axayê Cizîrî (*Se'idê Hemo*), Kawîs Axa, Seyîd 'Elî Ezxer Kurdistanî, Mele Kerîm Efendî, Sêwe û hwd gelek stranên Kurdî xistine ser qewanan. Wê demê Mihemed Arif xortekî bi stran û kilamên Kurdî têr û tijî ye. Peywendîya wî bi van hunermendên navborî re çêdibe. Li gel Meyram Xanê bi duetekê, di sala 1934'an cara pêşî dengê xwe dixê ser qewanê.⁹¹ Mihemed Arif bi van gotinan qala wan deman dike: *“Cara ewil ez çûm min îstîwanat (plak) gotin. Min ewil 4 qawin gotin. Her kesê stranbêj bîya, kîj stranbêj bîya, mesela Erebi bîya, Tirkmen bîya, Kurd bîya sindoqa wî ya warîdatê (dahat) hebî. Ji salê heta salê li şirketê me stran digotin. Li şirketêke dî me nedikarî em bêjin heta îstîwanata wî xilas bibîya. Heke nacih (serkeftî) bîya serê salê careke din gazî dikirin. Carekê Meryem, min û wê me li hev*

⁹⁰ Bîranîna Mihemed Arif Cizîrî di Gel Hesên Cizîrî, <https://www.youtube.com/watch?v=I2FRISCeZMA>, (drk. jgr.15.05.2017).

⁹¹ Zeynep Yaş, *Şakarên Muzîka Kurdî* c.1, weş. Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2015, r. 192.

vegerand. *Sala 1934'ê heta 1935'ê 11 caran min qawin (plak) gotin.*⁹² Mihemed Arif heta Sala 1939'an 14 qewanan bi kompanîya Ebûl Kelb plakê tomar dike. Piştî ku bi van qewanên wî nav û dengê wî belav dibe, bi tembûra xwe li seranserê başûrê Kurdistanê digere, bi tamamî jîyana xwe bi stanbêjîyê terxan dike. Gelek stranên xwe bi duqolî li gel Meyrem Xan û Hesên Cizîrî dixwîne.⁹³

2.1.8. Geryana wî ya bo Sineta Zarokan û Pîrozbahîyên Olî

Mihemed Arif ji sala 1938'an û pê de bû sinetker û meşa xwe ya ber bi gundên dûr ve dest pê kir. Çentê xwe hildida û ber bi gundên deşta Mûsil, herêma Berwara, Bala, herêma Soran û ber bi zozanên Kurdistanê dimeşîya. Ev kar û xebata nû him Mihemed Arif bêtir bi gel da nasandin û him jî wî baştir dab û nerîtî, rewîşt û toreya gelê xwe nas kirin. Ew di nava kultura resena neteweya xwe de pijîya. Armanca Mihemed Arif jî, ji hîlbijartina vî karî, ew bû ku hem bi renekî bêminet nanê jîyana xwe û zarokên xwe yê rojane peyda bike, hem jî di warê hunerî de kilamên cima'eta Kurdan baştir nas bike û piştî wan bixwîne. Xebatek bi vî rengî Mihemed Arif kir xwedîyê xezîneyeke dewlemend ji huner û stranên netewa wî. Her wiha vî karê han ew di hunera stirînê de hosta û dewlemendtir kir.⁹⁴ Mihemed Arif bi tomara dengê xwe van salên ku sineta zarokan kirî, wisa dîyar dike: *"Ez çûm... Min biçik (zarok) sinet dikirin. Min sinet dikir, ji xwe re bi erbanê digeram. Ez 17-18 salan mam li cem Ereban. Wextê min sinet jî dikir, ez bi rê ve diçûm, min stran jî digotin bo xwe. Min li hev didan. Min dizanî bû dê rojekê bi kêr min bîn."*⁹⁵

Di sala 1946'an de bi pêşengîya wî û hunermend Remezan Cizîrî, Evduyê kurê Eşedê Cizîrî, Lîyas Hacî Lîyas, Hesên Hemdanî û Arifê Hemdanî komeke olî ava dikin, di rojên sineta zarokan, rojên olî yê pîroz de, di mewlûdan de qesîde mewlûd û îlahîyan dixwînin. Li gelek deverên Başûrê Kurdistanê, ji Hewlêrê û derdora wê bigire heya digehije gundên derdora çîyayê Hemrîn, herêma Germîyan (*li derdora bajarê Kerkûk*) û gundên deşta Mûsilê digerin. Heta sala 1949'an li gelek koçk û dîwanxaneyên axa, giregir û xuyayîyan amade dibe. Gelek aheng, dawet û

⁹² Beşîr Ant, *Bilbilê Kurdistanê Mihemed Arif Cizîrî*, weş. Ba, Stenbol, 2012, r. 44-45.

⁹³ Kakşar Oramar, *Ji Girtîgehê û Avkêşîyê Heya Efsaneyê Mihemed Arifê Cizîrî*, <http://muzikKurd.blogspot.com.tr/2012/03/efsaneyê-mihemed-arifê-ciziri.html>, (drk. jgr. 01.05.2017).

⁹⁴ Zeynep Yaş, *Şakarên Muzîka Kurdî*, c.1, weş. Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2015, r. 9.

⁹⁵ Mp3, *Tarîxheyata Mihemed Arif Cizîrî*, deş. Yunus Orak, (13.05.2017).

şahîyan digêrîne û debara xwe bi huner û sunetkirinê dike.⁹⁶ Ji bilî van kesan endamên din jî, di van herêman de gihiştin nava koma wan, lê ew mîna Mihemed Arif û hevalên wî nedigerîn û dema kom diçû gund an jî cihê jîyana wan, ew jî tevî komê dibûn. Li wir û di xebata bi vê komê re bû ku Mihemed Arifê Cizîrî stranên olî jî hîn bû. Piştî nêzî du salan û dûrbûyîna ji malbatê, Mihemed Arifê carek din bi yek carî vegeyîya bajarê Dihokê.⁹⁷

Li gorî van pêzanînan, mirov tê derdixe ku ev geryanên Mihemed Arif yên pîrozbahî û şahîyên cihêreng ji bo berhevkerin û fêrbûna stran û muzîkên herêmên cuda, danberhevîya hunerî ya varyantên stranan, çavdêrîkirina çand û baweriyên cihêreng jê re dibe dibistaneke bingehîn a înfomal. Di encama van geryanan de Mihemed Arif bi sedan stran û kilamên folklorî Kurdî di salên dûmahîkê de bi avêtina ser qewan û kasetan nîşan dide.

2.1.9. Salên li Radyoya Bexdayê

Yekemîn radyoya ku beşa Kurdî tê de ava bûyî, Radyoya Bexdayê ye. Di vê mijarê de gelek lêkolîn û dane hene û ev radyo ji alîyê folklor û avabûna hişmendîya folklorî ya Kurdan de, her wiha bi repertuwarê xwe hê jî qadeke girîng û zengîn a lêkolînên zanistî ye. Mijar bi giştî ne ev jî be, ji bo têgihiştina atmosfera serdemê û avabûna hunermendîya Mihemed Arif Cizrawî, pêwîstî pê heye hin zanyarî derheqê Radyoya Bexdayê û radyoyên din de bînin dayîn. Nivîskar û lêkolîner *Dêrsim Oramar* ku li ser Radyoyên Kurdî xebatên wî hene, di gotareke xwe de wisa destnîşan dike:

Di sala 1936'ê de radyoya Bexdayê bi destê hêzên Îngilîstanê hat damezirandin. Sê sal piştî damezirandina radyoya Bexdayê, di 19'ê Kanûna sala 1939'ê de, para Kurdî li radyoya Bexdayê tê zêdekirin. Ku di serî de hefteyane tenê 15 deqeyan weşanê dike û tenê kesek bi navê Kamil Kakemîn di wê radyoyê de xebitîye. Piştî di salên di navbera 1940-1950'an de çend rewşenbîrên din yên Kurd beşdarî bernameyên wê radyoyê kirin. Wê radyoyê xizmeteke mezin ji bo çand, huner û edeba Kurdî kir û bi sedan strananên Kurdî ji mirinê rizgar kirin. Êdî ji wê

⁹⁶ Zeynep Yaş, *Şakarên Muzîka Kurdî*, c.1, weş. Şaredaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2015, r. 93.

⁹⁷ Kakşar Oramar, *Ji girtîgeh û avkêşîyê heya efsaneya Mihemed Arifê Cizîrî*, <http://muzikKurd.blogspot.com.tr/2012/03/efsaneya-mihemed-arife-ciziri.html>, (drk. jgr.01.05.2017).

rojê xeber û stiranên Kurdî, li her çar parçeyên Kurdistanê û deverên di yên cîhanê belav dibûn û dihatin bihîstin.⁹⁸

Her wiha piştî vebûna Radyoya Bexdayê, di bin banê Radyoya Yafa (1942) a li Filistînê, Radyoyaya Beyrûdê (1941), Radyoya Dengê Kurdistanê ya Komara Kurdistanê ya li Mahabadê (1946) Radyoya Sine (1952) de parên Kurdî vedibin.⁹⁹ Li gorî hin zanyariyan dengê Mihemed Arif gelek ji van radyoyayan jî belav bûye an jî ihtimaleke mezin e ku belav bûbe. Dema mirov vê yekê jî li ber çav digire, tê texmînkirin ku bêyî ku qewanên Mihemed Arif Cizîrî bigihêjin nav civakên cuda, bi saya van radyoyayan derfetên nasîna wî li erdnîgarîya berfireh a weke Rojhilata Navîn pêk hatîye.

Piştî radyoyên navborî yên li jor, divê bê destnîşankirin ku yek ji girîngtirîn radyoyên bi Kurdî jî Radyoya Êrîvanê ye. Piştî vebûna para Kurdî ya Radyoya Êrîvanê di sala 1955'an de, qewanên hunermendên Kurd ên weke Mihemed Arif Cizîrî, Hesên Cizîrî, Meyremxan, Elmasxan hwd ên li Iraqê hatî tomarkirin, li Radyoya Êrîvanê tîrî weşandin. Têmûrê Xelîl bi van agahîyan qala wê pêvajoyê dike: *“Radyoya me di bin banê Radyoya Sovyetê bû, serkarî li radyoya Moskvayê bû. Serokê radyoyê Xelîlê Çaçan ji serokê xwe yê Radyoya Moskvayê ra dikete pêwendîyan, ji wir bi fermî ji hukûmetên welatan (Iraq, Sûrî, Lubnan hwd) ew stiran distendin, me jî yên xwe bi fermî ji wan ra dişandin. Ango mohra radyoya Moskvayê ser stiranên me diketin, gumruk êdî dest nedidayê.”*¹⁰⁰ Yek ji wan hunermendên ku dengê wî ji radyoyê belav dibe jî Mihemed Arif Cizîrî ye. Bi vê yekê re nav û dengê wî li erdnîgarîyeke berfireh a wekî Bakurê Kurdistanê û Sovyetan jî tê nasîn û ev dibe sedema ku hunera wî têsîreke girîng li ser civaka Kurd bihêle.

Mihemed Arif Sala 1949'an de diçe Bexdayê. Li wir cara yekem xanima hunerdost û hunerperwer Elmas Xan nas kir. Di mala wê de hunermendên navdar ên Kurd, weke Nesrîn Şêrwan, Tahir Tofîq, Meryem Xan, Elî Merdan, Fewzîye Mihemed Amêdî, Resûl Gerdî, Cemîl Beşîr û gelek ji hunermend û rewşenbîrên

⁹⁸ Dersim Oramar, Lêkolîn û bernameyek li ser weşana radyoyên bi zimanê Kurdî, <http://www.kulturname.com/?p=1609>, (drk. jgr.10.05.2017).

⁹⁹ Dersim Oramar, Lêkolîn û bernameyek li ser weşana radyoyên bi zimanê Kurdî, <http://www.kulturname.com/?p=1609>, (drk. jgr.10.05.2017).

¹⁰⁰ Agahîyên hevpeyvîna bi Têmûrê Xelîl re ya li ser Facebookê, (drk. jgr. 09.05.2017).

Kurd mîna endamên malbatekê li dora hev kom dibûn û bi hevpişkî xebatên xwe yên hunerî, çandî rewşenbîrî didomandin.

Mihemed Arif li Bexda xwe digihîne hin fîmayên tomarkirina stranan û stranên xwe tomar dike û bi firotina wan stranan rewşa wî ya aborî hinekî baştir dibe.¹⁰¹ Mihemed Arifê Cizîrî bi hevkarîya Elmas Xanê çû radyoya Kurdî a Bexdayê. Li wir piştî ku dengê wî ji alîyê berpirsyarên para muzîk û hunerê ve hat bihîstin, bi germî hat pêşwazîkirin. Berî wê di azmûna deng û stîrînê de ku ji alîyê xwedîyên kompanîyên qewan çêkirinê ve dihat lidarxistin, Mihemed Arif bi başî hatibû pejirandin. Dema bo yekemîn car li ser qewanan hinek ji stranên Mihemed Arifê Cizîrî di nava gel de belav bûn, di demeke pir kêr de bi hezaran qewanên wî hatin firotin. Li para Kurdî ya radyoyê fikra wî hê jî ji berê bêtir vebû û cîhan li ber çavên wî bi rengekî din hat dîtin. Her wiha ji ber stîla wî ya taybet, daxwaza gel û dengê wî yê xweş, her du rojan carekê çend stranên wî bi rengekî zindî di radyoyê de dihatin pêşkêşkirin. Wê demê ji ber pêşneketina teknîkê, piranya stranên ku dihatin belavkirin, bi şiklekî rasterast (*zindî*) dihatin weşandin.¹⁰²

Mihemed Arif bi wan hunermendên navborî yên Kurd re têkilî û dan û standinan dike. Mihemed Arif bi van qisetan qala wê serdemê dike: “*Li Beyrût min got. Li Şeşten Elî min got, li Bexta... Li Helebê jî min got. Min li hemî dera welê gotîye. Piştî wê re çend salekê rabî ez zîvirîm, ez çûm îzaê (radyo) min şûl kir. Îzaa Kurdî, li Bexdayê. Miaşekî baş didan me, me pê xwe xudan kir. Me’lîme ew feqîrî piştî çû, dilê me xweş bî me stran baş te’bîr (şîrove) dikirin.*”¹⁰³ Her bi vê rêkê û piştî belavbûna stranên wî li radyoya Bexdayê, mezinahîya hunerê wî we kir ku Kamil Kakemîn ê rêveberê Radyoya Kurdî daxwaza wî diket û wî tîne radyoyê û hefteyane niv demjimêr ji bo wî terxan kir da ku stranê xwe bi şeweyekî zindî pêşkêşî guhdaran bike. Di çûna wî ya Bexdayê de qonaxeke nû û jîyana wî ya hunerî dest pê kir. Nav û dengê wî li Kurdistanê hemîyê belav bû.¹⁰⁴

¹⁰¹ Abdulkadir Bingöl, *Kulîkên Baxê Botan*, weş. Enstituya Kurdî ya Amedê, Stenbol, 2008, r. 255.

¹⁰² Kakşar Oramar, *Ji girtîgeh û avkêşiyê heya efsaneya Mihemed Arifê Cizîrî*, <http://muzikKurd.blogspot.com.tr/2012/03/efsaneya-mihemed-arife-ciziri.html>, (drk. jgr. 01.05.2017).

¹⁰³ Mp3, *Tarîxheyata Mihemed Arif Cizîrî*, deş. Yunus Orak, (13.05.2017).

¹⁰⁴ Jîyana Mihemed Arif Cizîrî, Zagros tv, 2012, <https://www.youtube.com/watch?v=TNmLbKdhZyA>, (drk. jgr. 16.05.2017).

Li gorî peymanê di navbera Dewleta Iraqê û Mele Mistefa Barzanîyê wekî nûnerê Kurdistan bûyî alî, di seksîyona weşanê (1961) ya Radyoya Bexdayê de ku wekî îzgeheke fermî hatî vekirin, “li dijî biratîya Ereb û Tirkan” dê tu weşan nehata kirin û dê bi piranî weşanên çandî û hunerî bihatana weşandin. Hunermendên weke Mihemed Arif, Hesên Cizrawî, Mihemed Şêxo, Tehsîn Teha, Meryem Xan, Ayşe Şan, Îsa Berwarî, Kawîs Axa gelek peywendîyê dibînin û tînan guhdarkirin. Êdî dengbêjî di erdnîgarîya Kurdistan de nanek pê dihat. Cizrawîyên (Mihemed Arif û Hesên Cizrawî) ku nûnerên herî girîng ên di navbera salên 1930-1970’ê de ji bilî teknîka strîna kilaman, dengê xwe jî terbiye kirin û sûd ji entrûmanên muzîka kevneşopî ya Erebî jî wergirtin. Ev ceribandin nûbûn in di kevneşopîya dengbêjîyê de.¹⁰⁵

Li gor van agahîyan mirov tê derdixe ku Mihemed Arif ji sala 1949’an û wê de (destpêka salên 1950’an) qewand bo radyoyê tomar dike, demêke dirêj li ser radyoyê bi zindî stranên xwe dibêje. Li radyoyê heta sala 1974’an dixebite û di vê salê de xaneşîn (*teqawît*) dibe.¹⁰⁶ Arşîva herî berbihev a Mihemed Arif li Radyoya Bexdayê ye. Di bernameyek ya Radyoya Kurdî ya di sala 1985’an de ku li ser Mihemed Arif hatî pêkanîn de, Xelîl Ebdila Mihemed Emîn agahîyên bi vî rengî dide: “*Li nav defterêd Radyoya Kurdî em lê gerîyan û me xwe pê ve mandî kir, me dît hijmaran wan stranêd Mihemed Arifê Cizîrî yê hatî tomarkirin, ji bilî sirûdan 331 stran in û hijmara wan gihîşte 1877 deqîqeyan yê li radyoyê heyîn.*”¹⁰⁷

2.1.10. Ji bo Konser û Ahengan Serdana li Çend Welatan

Mihemed Arifê Cizîrî wekî xîret û bawerîya derwêşekî li hemû deverên ku derfetên wî têrê dikin gerîyaye. Li gorî pêzanînan heyî bi regeznameya xwe ya Iraqî li gel Hesên Cizîrî di sala 1956’ê de diçin bajarê Amedê, bi Celal Güzelses re çend şevbêrkan digerin.¹⁰⁸ Lê ev agahî bi belgeyan nehatîye piştraskirin. Lewre nivîskar Beşîr Ant destnîşan dike ku: “*Ev gotegot ne esehî ye. Piştî çûyîna wî û Hesên Cizîrî*

¹⁰⁵ Besime Şen, *Devlet Piyasa Parti (Nizamettin Arîç ve Kürt Müziği)*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2016, r. 61-62.

¹⁰⁶ Zeynep Yaş, *Şakarên Muzîka Kurdî*, c.1, weş. Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2015, r. 193.

¹⁰⁷ Beşîr Ant, *Bilbilê Kurdistanê Mihemed Arif Cizîrî*, weş. Ba, Stenbol, 2012, r. 50.

¹⁰⁸ Zeynep Yaş, *Şakarên Muzîka Kurdî*, c.1, weş. Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2015, r. 193.

ya Başûr, ew qet venegerîyane Tirkîyeyê.”¹⁰⁹ Bi îhtimala ku tomareke Mihemed Arif Cizîrî ya ku straneke Celal Guzelses a bi Tirkî bi navê “Ben şehîd-î Badeyim” xwendî û Celal Guzelses jî strana “Ez kevok im” wekî “Hele Yar zalim yar” wergerandî Tirkî û xwendî, ev qinyat bi hin derdoran dabe çêkirin. Xuya ye ku dan û standineke wan a xîyabî heye û hay ji xebatên hev hene. Lê ne teqez e ku dostanî û hevalbendîyeke wan pêk hatibe.

Beşeke mezin ji jîyana wî geryan bû ku sala 1959’ê di gel hunermendê mezin Hesên Cizîrî diçine Rojavayê Kurdistanê, li Qamişlo û gundên wê li ahengan digerin. Her wisa sala 1961’ê bi Hesên Cizîrî û Îlyas Hacinî re diçe Rojhilatê Kurdistanê, li Kermanshan serdana Hesên Zîrek dikan û li Radyoya Kermanshanê li gel Hesên Zîrek çend stranên tomar dikan. Di çend stranên de tembûrê ji Hesên Zîrek re lê dide.¹¹⁰ Sala 1966’ê li ser daxwaza Aşûrîyan diçe Kuwêtê ji bo geryana çendîn ahengan beşdarîyê li gel çend hunermendên Erebiyê dike. Nivîskar û lêkolîner Konê Reş di nivîseke xwe de wisa qala bîranîneke xwe li gel Mihemed Arif dike: “*Di sala 1968’an de ez di qonaxa amadeyî ya xwendinê de bûm, dema ku Mihemed Arif Cizîrî hat Qamişloyê nav Kurdên Binxetê û li seyrangeha Gerbîs ahengek gerand. Di wê ahengê de dilmanî ket navbera Kurd û Ermenan de, li ser mêvandarîya wî û dawî bû mêvanê Ermenan, Kurdan jî li xwe nexweş anî û dilê xwe jê girtin. Di wê ahengê de gelek stranên xweş gotin. Ew hatina wî ketîye bîranînên xelkên Qamişlo de.*”¹¹¹

Di sala 1970’yî de beşdarîyê di çendîn ahengên niştimanî de dike, di heman salê de li gel hunermendên TV û Radyoya Bexdayê ên weke Elî Merdan, Tahir Tofîq, Hesên Cizîrî, Îlyas Xizir, Husên Nîmet û çendîn Hunermendên di yê bi nav û deng re ahenga Newroza Kerkûkê, Silêmanî û Hewlêrê digerin, bi coşeke mezin gel pêşwazîya wan dike ji ber ku bi destkeftiyên mafê otonomîya 11’ê Adara 1970’î bi van şahîyan gur û geş dibû.¹¹²

¹⁰⁹ Hevpeyvîna bi Beşîr Ant re, Yunus Orak, 05.05.2017.

¹¹⁰ Zeynep Yaş, *Şakarên Muzîka Kurdî*, c.1, weş. Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2015, r. 193.

¹¹¹ Konê Reş, *Bilbilê Çiyayê Botan Mihemed Arif Cizîrî*, <http://www.saradistribution.com/ciziri.htm>, (drk. jgr. 07.05.2017).

¹¹² Zeynep Yaş, *Şakarên Muzîka Kurdî*, c.1, weş. Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2015, r. 193.

Her wiha Konê Reş bi van rêzikan behsa konsera wî ya li Beyrûdê dike: “*Di sala 1973 an Mihemed Arif Cizîrî, di gel şagirtê xwe Îsa Berwarî di Qamişlo re derbasî Beyrûtê, nav Kurdên Libnanê bûn. Li Beyrûtê bi Seîd Yûsiv, Îsa Berwarî û Gulbihar re ahengekê di sînemeya Rîvolî de ji Kurdan re li dar xistin.*”¹¹³ Li Beyrûdê çend konsertan didin, paşê jî beşdarî festîvala Ba’edrê dibin ku ev festîvala çand û hunerî gelek bi nav û deng e û di asteke navneteweyî de ye li Lubnanê tê sazîkirin. Li Libnanê hevnasîya wî û hunermend Se’îd Yûsiv çêdibe. Li mala wî dimînin û bi hev re çend konsertan saz dikin.¹¹⁴

Piştî sala 1974’an ji Radyoya Bexdayê xaneşîn dibe, bi tembûra xwe stranbêjîya xwe berdewam dike.

2.1.11. Tomargeha Ebû Mêhvan

Di salên ku amûrên tomarê bi pêş de diçin Fermanê Çaycî dibe tomargerê dengên Kurdî ku ji bo wan salan ev şanseki pir mezin e ji bo pêşvebirina hunera Mihemed Arif û her wiha gelek hunermendên din ên li başûr. Babê Mêhvanî yê kurê Fermanê Çaycî ku kesayetekî gelekî girîng e û di binbeşên pêş de dê li ser hevaltîya wî ya bi Mihemed Arif re û xebatên wî yê li serê bê rawestîn, wisa qala babê xwe û Mihemed Arif dike: *Sala 1955’ê babê min Ferman museccelek (tomargir) çû peyda kir ji Mîsilê. Hingê kirî bi 15-16 dînara. 3 dînar pêşîya wê dan, heyîvê jî nîv dînar qîsta wê dida. Li wê derkê wextê em ketîne çend mîletê me yê Zaxo yê gund û guharê dihatin, mala me wekî za’ê lê hat. Hemû stranbêj dihatin kom dibîn hey hewar! Digotan, Fermanî tiştêkî e’cêb îna ya dengê stranbêjan secil dîkitin. Vêca em pê da çûn. Heta Mihemed Arif hate meydanê. Vêca em mayîne ser Mihemed Arifî. Em gelek mane gel wî. Mi bi xwe we’ed danîye bo xizmeta Mihemed Arifî heta vê gavê. Em pê de hatîn heta em giheştine merheleyekê misecel û kasê ew derketî. Ji berî derkevin jî me berê li çayxanê jî lê didan, me di ber re tescîl jî dikirin bo alemê. Hingî mekere bîn, têyb bîn. Piştî têybê kasê derketin bi kasetan me rabî di wî wextî*

¹¹³ Konê Reş, *Bilbilê Çîyayê Botan Mihemed Arif Cizîrî*, <http://www.saradistribution.com/ciziri.htm>, (drk. jgr. 07.05.2017).

¹¹⁴ Zeynep Yaş, *Şakarên Muzîka Kurdî*, c.1, weş. Şaredaredariya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2015, r. 193.

*da sala 1960 û tişteke da min rabî tescîlat vekir. Em ketîn wê xizmetê heta ev roke jî em ê berdewam in di xizmeta wî da.*¹¹⁵

Di salên 1970'an de ji bilî qewana êdî amûrên dengan ên weke kaset û teyb li pîyaseyê berbelav in. Bi vê yekê re êdî derfetên tomarkirina dengan ji berê hêsantir dibe. Mihemed Arif ji destêpêka salên 1970'î û wêdetir li tomargehên deng dest bi dagirtin û tomarkirina kasetan dike. Di serê van tomargehan de jî tomargeha Ebû Mêhvan (*Babê Mêhvanî*) a li Zaxoyê ye ku gelek kaset û tomarên deng ên Mihemed Arif ên îro li ber dest ji vê tomargehê derketine û belav bûne. Her wiha vê tomargehê qewanên Mihemed Arif avêtine ser kasetan û bi vê yekê karekî girîng bo belavkirina dengê wî kirîye.

Li sala 1976'ê komeke stranên Mihemed Arifê Cizîrî wek nimûne ji Kulturê Kurdistanê, ji layê rêxistina Unesco ve di nav kulturê gelan de dihêne belavkirin. Stranên wî wekî arşîveke sereke û dewlemend ên strana folklorî ya Kurdî tînen hejmartin.¹¹⁶ Mihemed Kemal di weşaneke Radyoya Kurdî ya Zaxoyê de sala 1998'an wisa dîyar dike: "*Zêdebarî 2 istîwanatan Rêkxirawî Unesco parastine ku ta niho gelek caran êzgê Monte Carlo stranêd wî belav diket di programên xwe da.*"¹¹⁷

Di sala 1978'an de dema hunermenda navdar Eyşe Şan diçe Iraqê daxwazîya wê ya herî mezin dîtina Mihemed Arif Cizîrî ye. Piştî Konsera xwe ya li Dihokê diçe serdana Mihemed Arif Cizîrî. Eyşe Şan, Mihemed Arif li mala Îsa Berwarî bi hev re şevêkê digêrînin û kasetekê bi amatorî tomar dikin.¹¹⁸

Li sala 1983'ê Mihemed Arif wek serokê lijneya muzîkê û lijneya hevselgandina stranan li rêvebirîya rewşenbîrî li Dihokê tete damezrandin.¹¹⁹

Babê Mêhvanî derbarê berhevkarîya tomarên Mihemed Arif de ku temenek lê terxan kirî û her wiha derheqê navê tomargeha xwe de van tiştan dibêje: *Stranên Mihemed Arif yê sala 1955'ê yê babê min gotî û heta ev roke jî min ê paristîn. Çend*

¹¹⁵ Babê Mêhvan û Mihemed Arif Cizîrî, Ava Tv, 2018.

<https://www.youtube.com/watch?v=adyGXEPWtd8>, (drk. jgr. 15.01.2019).

¹¹⁶ Zagros tv, 2012, <https://www.youtube.com/watch?v=TNmLbKdhZyA>, (drk. jgr. 16.05.2017).

¹¹⁷ Beşîr Ant, *Bilbilê Kurdistanê Mihemed Arif Cizîrî*, weş. Ba, Stenbol, 2012, r. 44.

¹¹⁸ Zeynep Yaş, *Şakarên Muzîka Kurdî* c.1, Weşanên Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2015, r. 193-194.

¹¹⁹ Zagros tv, 2012, <https://www.youtube.com/watch?v=TNmLbKdhZyA>, (drk. jgr. 16.05.2017).

hefelat û çend stran gotibin li çî erdê gotibin ku min bi dest xistî, li Mûsil, Erbil, Bexda hetta yê ji Fellûce înayit. Wextî de min we'ed dayîye Mihemed Arif. Min gotibîyê: Babê Kerîmî hingî tu li dinyayê sax bî, ez dil nadim navê te deynime ser tomargeha xwe, hingî tu li qeydîl heyatê de bî ez dil nadim navê te deynim ser bandxana xwe. Piştî emrê Xwedê kirî min navê wê kire "Tomargeha Mihemed Arifê Cizîrî". Her tomara deng a Mihemed Arifî, her saetek, her heflek wî her êkê inwalê xwe heye li def min û her yekî ji wan reqemê xwe jî heye. Kesên derwêş û mirîdêt wî dizanin. Dê bêjin ka ya Sîdekan, dê bêjin ya Se'idê Selatî, ya Mala Dêwalî, dê bêjin ya Fermanê Çaycî... Her yekê navê xwe yê heyî.¹²⁰

2.1.12. Çûyîna Hecê

Mihemed Arif di nav ol û bawerîyên cuda de hunermendîya xwe saz kirîye, ji ber wê tenê ne ji hêla Misilmanan ve, ji hêla derdor û civakên xwedî bawerîyên dîtir ve jî hatîye hezkirin. Temaya gelek olên cuda ên weke Êzîdî û Fileh û Cihû di nav berhemên wî de xuya dibin. Tevî ku bawermedekî ola xwe ye jî Mihemed Arif tu cudahîyê nake navbera olan û bo hemû derdoran hunera xwe dike.

Mihemed Arif di sala 1978'an de diçe Hecê. Piştî ji Hecê dizivire demek kurt navberê dide dengbêjîyê. Piştî cewazata ji aliman careke din dest bi dengbêjîyê dike. Babê Mêhvanî wisa qiseta derbarê çûyîna wî ya Hecê de dike: *Piştî ji Hecê hat, mele jê re dibêjin divê tu tobe bikî û êdî tu li tembûrê nedî. Emrê min bibe pênc sed sal û ez her roj Mihemed Arif guhdarî bikim, wextê ku bizivirin ji min re bêjin te li Mihemed Arif guhdarî kirîye? Ez ê bêjim na. Piştî Hecê ku jê re stran û tembûr qedexe kiribûn, rojekê em çûn me ji melayekî me fetwayek derxist û bi wî awayî ji nû ve me wisa kir ku rahêje saza xwe û car din kilaman bêje.*¹²¹

Mihemed Arif di tomara deng a 'Tarîxheyat'a xwe ya 1979'an de wisan qala çûyîna xwe ya Hecê dike: *"Dinya li gorî qeydilheyata me gelekî baş bî, min bi stranan bûrand. Ez memnûn im ji Xwedayê xwe. Ez çûm min Heca xwe jî tewaf kir. Elhemdilillah heta nihû jî ez stranan dibêjim. Me'lûm e heçî Hecî bit, biçin mala*

¹²⁰ Li ser Babê Mêhvanî û Jîyana wî di gel Hunermend Mihemed Arif Cizîrî, WAAR TV, 2017 https://www.youtube.com/watch?v=7SVxdS-Zyîy_, 18.05.2017.

¹²¹ Bernameya Nûçegihan, Nevzat Aladağ, Hevpeyvîna bi Babê Mêhvanî re, 2015 <https://www.youtube.com/watch?v=g7XTW6DOEUM>, (drk. 16.07.2018).

*Xwedê tewaf bikit, şixulê pûçî nakit, axaftinên zêde nakit, ştexalîyan zêde nakit... Ez behsa xwe bikim, rizqê min li ser tembûrê ye. Xwedê Te'ala ew wesîle daye min. Ez ê ji xwe re bêjim, heta zarokên xwe xudan bikim, heta bimirim.*¹²² Mihemed Arif di vir de hunermedîya xwe li gor û edet û rêzikên kevneşopî yê civakê, bi tewafa Hecê sansur û bêdeng nake ku ev yek hêjayî destnîşankirinê ye ku ew çî qasî hez ji hunerê dike û wê di bin tu tiştî de nabîne. Mirov dikare bibêje ku keda li hunermendîya xwe dayî jî pîroz dihesibîne û tevî çûyîna Hecê jî nade rawestandîna. Hetta ne tenê bi çûyîna Hecê, heta nefesa xwe ya dawî nê heye bistrê. Bi van gotinên di tomarê de nêta xwe dîyar dike: *“Heta nûke jî heta quwet di laşê min de, di qirika min de mabit, ez ê stranan bêjim. Li ser tenîştêkê jî be, ez ê ji hevalên xwe re bêjim. Yek kulê wî heye, yek derdê wî heye, çî cefayê wî heye... Her tiştêkî Xwedê Te'ala tiştêk dayîyê. Hindik stranbêj dê stranan bêjit, dê filan di dilê wî de êt.”*¹²³

2.1.13. Koça wî ya Dawîn

Mihemed Arif di sala 1986'ê bi temenê xwe yê 74 salî êdî ber bi kalbûnê ve ye. Bi kalbûnê re êdî hêza wî kêmkirî dibe, 17'ê Berfanbara 1986'an li Dihokê jîyana xwe ji dest dide. Keça wî Asîya di hevpeyvîna xwe ya Beşîr Ant re wisa qala wê roja koça wî dike. *“Êvarî da rabît, mêja êvarî bikitin, ez li metbexê bîm, dengê wî ji jorê hat kete xwarê. Ez hatim, min rakir, serê wî da ber sîngê xwe. Min gazî kirê, ka derdê te çî ye? Xirxir kete gewrîya wî. Min destê xwe bi serê wî de îna, piçekê çavêt xwe vekirin û baş bî. Min xeber rêkir bo Kerîmî da bi hawara min bê. Hatina Kerîmî bi derengî ket, çû tixtor wê îna. Dixtor berê xwe dayê, fêsha (muayene) wî kir. Got, em ê wî bibin nexweşxanê û birin. Piştî Kerîmî hat xebara wî îna got, wille mirîye.”* Mihemed Arif roja di pey wefata wî re li Geliyê Dihoka Dasînya, li binîya Çîyayê Metîna, li Goristana Şaxkê teslîmê axê hate kirin.¹²⁴

Babê Mêhvanî wisa qala merasîma Mihemed Arif dike: *1986'an de termê Mihemed Arif li hemû bajarê Dihokê gerandin bi rê û resmek mezin hate rêkirin. Xelkê Dihoka Şerîf mewtê wî girtin û gotin hewar e, ev Mihemed Arif e, Babê Kerîmî ye emrê Xwedê kirî, hemîyan me da ber girî. Wextê min ew mezel dît çî cara ez ji bîr*

¹²² Mp3, *Tarîxheyata Mihemed Arif Cizîrî*, deş. Yunus Orak, (13.05.2017).

¹²³ Mp3, *Tarîxheyata Mihemed Arif Cizîrî*, deş. Yunus Orak, (13.05.2017).

¹²⁴ Beşîr Ant, *Bilbilê Kurdistanê Mihemed Arif Cizîrî*, weş. Ba, Stenbol, 2012, r. 96.

*nakim heta ez bimirim ew alema kom bûyî ser wê ce'dê pişt melkuba wî li wêrê me berda girîyê. Mego eve ye Mihemed Arifê we! Eve ye ev qa alem xwe lê dike xwudan! Me ew bir li Şaxkê veşart.*¹²⁵

2.2. Kesayetîya Mihemed Arif Cizîrî

Dema mirov berê xwe bide naveroka stran û kilamên Mihemed Arif, bi awayekî xwezayî mirov bi ser kesayetîya wî ve jî dibe. Dema ew qala Çîyayên Kurdistanê dike ev di heman demê de tê wateya ku qala nasnameya xwe ya neteweyî û sirûştî jî dike. Dema qala xizaniyê dike tê wateya ku ne li cem dewlemendan lê ew cihê xwe li cem xizanan dibîne û berdevkîya wan dike. Dema qala heps û zindan û xerîbî û xurbetê dike, di heman demê de xwe li cem bindest û mişetnan dibîne û hest û bêriyên wan tîne ziman. Hemû ev diyardeyên hunera wî derbarê hestiyarî û kesayetîya Mihemed Arif de têra xwe agahîyan didin mirovan. Her wiha kesayetiyên şahidîya jîyana wî kirî jî van agahîyan piştrast dikan. Îsmail Geylanîyê spiker û bernameçêkerê wê serdemê wisa qala wî dike: *Exlaq û şexsîyeta Mihemed Arif berz bû. Insanekî lêhatî, maqûl, stranbêjekî izetil nefsekî mezin hebû. Şexsîyeta wî ji ya hemû hunermendan cuda bû. Çawa bi navê Şahê Dengbêjan stranbêjekî navdar bû, şexsîyeta wî jî wisa bû. Mihemed Arif her car digote min "Smailê delal". Ew kelîma "delal" pir bi kar tîna û "zêrê zer". Kesê ku hijê bikira ev digot wan.*¹²⁶

Babê Mêhvanî wisa derheqê hezkirina wî û kesayetîya wî ya dilnizm de destnîşan dike: *Mihemed Arif ez bi çol û beyara êxistim. Wî we li me kir me mal û eyal ji xwe hinda kir. Mirovekî gelekî muqeder bî, muezez bî, muhterem bî yanî insanekî bi rêk û pêk bî, gelekî izzetil nefş def wî hebî. Tu cara ji bo tu kesî negotîye ez ê bo te stran û bêjim bi pare.*¹²⁷

Beşîr Ant di pirtûka xwe de derbarê Mihemed Arif de diyar dike ku: *Ew xweyî sirûşteke nerm û helîm bû. Ji henek û meseleyan gelek hez dikir. Mirovhez bû û ji nas û dostên xwe re axir derece wefadar bû. Hesên Şerîf wisa qala wî dike:*

¹²⁵ Hevpeyvîna li gel Babê Mêhvanî, Jîyana Hunermed Mihemed Arif Cizîrî, Zagros Tv, 2018 <https://www.youtube.com/watch?v=0wO3zU4hMNs>, (drk. jgr. 20.08.2018).

¹²⁶ Dîroka Me, Hevpeyvîna Mehmûd Lewendî ya bi Îsmail Geylanî re, Kurd1, 2012 <https://www.youtube.com/watch?v=JGDWBcJ5hK8>, (drk. jgr. 25.08.2018).

¹²⁷ Li ser Babê Mêhvanî û Jîyana wî di gel Hunermend Mihemed Arif Cizîrî WAAR TV, 2017 <https://www.youtube.com/watch?v=7SVxdS-Zyîy>, (drk. jgr. 26.08.2018).

*Mihemed Arif çî kesê nas kiriba ji heskirina xwe her yekê navek dida wan. Digote min: Hesên Sindî. Gelek ji mirovan hez dikir.*¹²⁸

Mihemed Arif evîndarê welatê xwe û miletê xwe ye. Ew welê bi derdora xwe, bi bajar û wargeh û cihê rabûn rûniştina xwe ve jî bengî bû. Ji dûrketina cih û warên xwe, ji xerîbîyê aciz dibû. Ew qasî ji welatê xwe hez dike ku hunermend Gulbahar wisa qala bîranîneke xwe ya Beyrûdê ku ji bo konserê pev re çûyî ya li gel wî dike: *Êvarekê em li berbanga otêlê rûniştine, Li pêşberî behrê û li behr û derdorê em temaşe dikin li gel Îsa Berwarî û Mihemed Arif. Me dît carekê kete kul û xeman. Wechê wî tirs bû û çû ji me û wê de li quncikekê pal da, serê xwe kir nav destê xwe de. Min jê pirsî, xêr e ustad çî hewala te ye, bo çî wê xemgîn î? Wisa aciz bersiv da: Ev çî ye hotêl, Şeraton û Beyrûd û ev halê rezîl? Ma nihû em li ber Xabîr, li qehwexaneyê Fermanî bîyan û ew bizmarên wan kursîyên dep yên hişk û biring di qûna me re biçûyan ne xweştir bî ji vî halî! Ew êvarek ya beravê welatê xwe nade bi hezar peravên Deryaya spî. Zaxoya xwe ya rengîn bi hezar Beyrûd û Şeratonan naguhere.*¹²⁹ Di vir de mrov pê derdixe ku Mihemed Arif nexweşî û kêmasîyên welatê xwe nade bi tu konfor û xweşîyên welatên xelkê. Ev yek jî elbet ji kesayetîya wî nikare cihê bê hizirandin.

Hêjayî gotinê ye gelek helbest li ser kesayetî û hunermendîya Mihemed Arif Cizîrî hatine nivîsandin. Îsmâil Geylanîyê yek ji wan hezkirî û nêzîkên wî, di helbesteke xwe de wisa wî bi bîr tîne:

Bendewar e bêyî te

Tembûra çarde perde

Peyv hejar e

Xemgîn e awazê resen

Rondik e stran

Nalîna pir birîn e

Tu mezin î dengê resen ji te ye

Awaz ji tembûra te

¹²⁸ Beşîr Ant, *Bilbilê Kurdistanê Mihemed Arif Cizîrî*, weş. Ba, Stenbol, 2012, r. 54.

¹²⁹ h.b. 55.

*Gelek te me 'şûq kirin
Bi xwedê Zîn û Mem rabûn ber te*

*Di jîyan de serberz bûyî
Belê ax sindirûk tijî xozgeh
Şahê dengbêjan her tu yî
Peyva resen doza te
Kewê ribat bi nalîn bû
Li ber xatirxwazîya te
Mihemed Arîfê Cizîrî
Tu kela hunerê me yî
Heta peyva Kurd mabî
Tu nemir î tu her heyî¹³⁰*

¹³⁰ Dîroka Me, Hevpeyvîna Mehmûd Lewendî ya bi Îsmâil Geylanî re, Kurd1, 2012
<https://www.youtube.com/watch?v=JGDWBcJ5hK8>, (drk. jgr. 26.08.2018).

BEŞA SÊYEMÎN

3. HUNER Û BERHEMÊN MIHEMED ARIF CIZÎRÎ

Mihemed Arif Cizîrî ji hêla îcrakirina berhemên xwe ve û ji hêla cureyê hunermendîya xwe ve li cihekî xweser disekine. Ji ber ku enstrumaneke xweserî wî heye, derfetên wî çêbûne ku çî newa, stran û rîtmên wî bihîstî, li gorî xwe karîye li civat, studyo û ahengan îcra û pêşkêş bike. Her wiha ji hêla derfetên tomarkirina berhemên ve di salên destpêkê yê qewanan û radyoyê bi dest xistîye ku çî tiştê di bîr û hizra wî de heyî, li gel orkesrayê tomar kirîye. Ji vî alî ve hêjayî gotinê ye ku Mihemed Arif di salên rewaca bo pêşxistina tomarkirinên dengên etnîk ên rojavayîyan de û di serdemeke ku teorî û xebatên etnomuzîkolojîyê yê li ser civakên Rojhilata Navîn geş bûyî de jîyaye û ev derfetên henê bûne şanseki pir mezin ku hemû berhemên gelêrî yê di bîrê de û yê wî bi paldayîna mîrateya gelêrî ava kirî, nemir bike. Di vî warî de divê em bînin ziman ku civakên Kurdan di serdemên pir teng ên mafên wan ên dewletî neyî de bi mînakên din ên van tomaran ji bo îro jî xwedî mîrateyeke berketî û hêja ye.

Di vê beşê de ji bo vekolînê, ji nav hemû tomarên deng ên Mihemed Arif yê li ber dest ketî sûd hatîye wergirtin. Temamê van berhemên bi şêweyê dijîtal (torên civakî yê weke Youtube, Facebook, Twiteer hwd wekî formatên mp3, mp4 û formatên vîdeoyan) hatine bidestxistin. Hin berhem ji şîrketên mûzîkê, hezkirîyên Mihemed Arif û hin ji kanalên taybet ên şexsî yê dijîtal hatine wergirtin. Di nav van tomaran de plak û qewanên ji Radyoya Bexdayê yê hatî dijîtalîzekirin, şerîtên wekî şêweyê dijîtal hatî pêşkêşkirin û kasetên ji arşîvan hatî berhevkirin û li ser torên înternetê hatî parvekirin hene. Lê ji ber ku hemû şêweyên berhevkirinan ji înternetê hatine bidestxistin caranin pê nayê derxistin ku resenê tomarê ji kasête ya an ji plakê an jî ji şerîtan e. Ji ber vê yekê jî em ê qîm pê bînin ku hemû arşîv û arşîvkerên Mihemed Arif Cizîrî yê li ser înternetê destnîşan bikin. Ji her tomara deşîfrekirî dê detayên çavkanîyên wê berhemê bînin destnîşankirin. Lê berîya wê wekî çavkanîyên bîngêhî ji bo vê xebatê em di serî de destnîşan bikin ku ji van kanalên tora civakî

sûd hatîye wergirtin. Kanalên Youtubeyê: *MuzikaKurda, Hakkarî Kurdistanî, Cizirabotann, Rojwan Holm, DENGE CIZÎRA BOTAN, Seyran Amedi, Mihemed Arif Ciziri, Mo'tesim Mezher, Qehreman Zaxoyi, Ciziri Radio, Aydın Müzik, KOM MÜZİK, SesMedia, Azadî û Dengbêjî, Botan Müzik, Sadiq sadeeq, Tengezar, kurtçemuzik, Berekat Özmen, Stranên kurdi, CÎLO SES MAVÎ SU AVA ŞÎN*. Rûpelên Facebookê: *Mihemed Arif Cizirî Internet Radio, Omar Surchi, Tomargeha Mihemed Arif Cizirî, Mihemed Arif Cizirî*. Her wiha tomarên mp3 ji arşîva *Seyran Amêdî* hatine wergirtin.

Ji hêla bingeha orjînalîya stran û kilamên Mihemed Cizirî ve mirov piranî caran pê dernaxe ku berhem ji hêla kê ve hatîya afirandin. Lê bi rehetî mirov pê derdixe ku hemû stranên rîtmîk stranên gelêrî û yên govendê ne. Ji hêla xwedîtîya binyadê ve her çawa be jî Mihemed Arif hin motîfên jixweber ên xwe û gelêrî li wan zêde kirine û di dawîyê de stran ketine dirûvên varyantên serbixwe. Ji vî alî ve em ê hemû berhemên Mihemed Arif strîyayî weke varyantên wî yên xweser qebûl û pênasê bikin. Di binbeşên vê beşê de her wiha em ê berê xwe bidin ser hêman û motîfên di nav hunera wî de û wan bi mînakên destnîşan bikin.

3.1. Ji Hêla Rîtmê ve Nirxandina Berhemên wî

Bi giştî ji hêla nirxandina berhemên ve destpêkê em ê berê xwe bidin bingeha peryoda rêveçûna stranê anku rîtmîk berhemê. Ji bo hemû berhemên muzîkê mirov dikare destnîşan bike ku du şeweyên bingehekan ên berhemên muzîkê hene: *Muzîkên bêrîtm û muzîkên rîtmîk*. Em ê ji bo vê xebatê hemû berhemên bêrîtm navlêkirina “kilam”ê, ji bo hemû berhemên rîtmîk jî navlêkirina “stran”ê bipejirînin. Di tomarê dengan (hemû tomarên Radyoya Bexdayê û qewanan) de wekî taybetmendîyeke xweser û sereke ya Mihemed Arif Cizirî ew e ku destpêkê de bi kilameke bêrîtm dest pê dike, çer ku kilam qedand û pê de bi straneke rîtmîk ve girê dide. Bo mînak em dikarin yek ji tomarên wî yên ewil ên Radyoya Bexdayê bidin ku di destpêkê de kilama “*Ay ay Babiko*” distrê û di pey pê re strana rîtmîk a bi navê “*Malan bar kir*” didomîne.¹³¹ Di hin tomarên şerît û kasetan de jî di hin navberên stranan de jî awazên

¹³¹ Mihemed Arif Cizirî, *Babiko û Mala Bar kir*, 1930,

<https://www.youtube.com/watch?v=9PI2291HB-o>, (drk. jgr, 18.06.2018)

kilamê têkel dike û dîsa bi strana rîtmîk berdewan dike. Kêm jî be di hin tomarên vîdeoyî de tê dîtin ku bi stranên rîtmîk şeweyên dîlanê yên wek potporiyê distrê. Bi giştî her bi çî dirêjîyê be jî em ê wan berhemên wî xwendî ji hêla rîtmê ve ji hev veqetînin û wan bi awayekî serbixwe hildin dest û pêşkêş bikin.

3.1.1. Berhemên Bêrîtm (Kilam)

Berhemên bêrîtm anku kilam ew cure berhemên muzîkê ne ku ji hêla jimara matematîkî ve di bingeha kilamê de tu rêveçûyînen perkusyonî lê nayên. Ji aliyê peryod, rêz û dorê ve destpêk û dawîlênanîna gotinên stranên ne bipîvan û rêkûpêk in. Bi vî şeweyî piranî hêla çîrokbêjîya berhemê û hestewarîya deng derdikeve pêş ku hêla sereke ya dengbêjîyê ev cure temsîl dike. Bi vî awayî levanîna kilamê nakeve nav tu qaliban û bi rehetî rê li ber jixweberîya berhemê ava dibe û dengbêj li gorî daxwaza xwe her çî qasî bivê dikare dirêj û kurt bike. Di dengbêjîyê de kilam piranî caran xwedî qafîye ne. Mirov dikare vê yekê wekî kodên levanîne bi nav bike. Armanc jê ew e ku kilam di hiş de bi rehetî bimîne û ahenga vegotinê hêsan be. Di vê formê de dawîya hevok û hin gotinan bi dengdêrên dirêj (*a, ê, î, o, û*) tê dirêjkirin. Bo mînak:

Bilbilo ûy ûy ay

Malik xedaro tu çendî li min dîn î bilbiloooo

Hayê bilbilo çendî tu li min dîn î

Tu li serê seqlanê xir û xalî de têtî yeqîn dixwînî bilbilo oo

Tu li serê seqlanê xir û xalî de têtî yeqîn soregul li gundê me nemane

*bilbiloo*¹³²

...

Gelek motîfên dirêjkirinê yên xweser û giştî yên di kilamên Mihemed Arif Cizîrî hene. Bi saya van pêvekên dirêjkirinê newayên kilamê li gorî hestê wekî xercê di nav berhemê de bi cih dibin û hunermend wan li gorî xwe hevokê dixwe nav teşeyekê.

¹³² Mihemed Arif Cizîrî, Bilbilo, <https://www.youtube.com/watch?v=J9qXZA-q0hc>, (drk. jgr. 26.02.2018).

Bo mînak: *oy oy, ay ay, ûy ûy, lê wayê, dehî lo lo, wey lo lo, ay ay li min, wey lê lê, wey lo lo delaal, wez nemîniim, rebeno dînoo, rebenê dînêê, yelaa yelaa, jaro diloo, rezîlo dilo, hawar e xelkînoo, bo çiii, lê lê yadêê, lo yaboo, gelî gundîyanoo, wey lê lê, wey lo lo, tew lê lê, ha wer lê, nayê rayêê...*

Di dawîya xebatê de dê hemû kilamên bêrîtm bi awayê lîstê li gel çavkanîyên wan ên elektronîk bèn dayîn. Ji vê yekê dê hewl bê dayîn ku hemû berhemên Mihemed Arif Cizîrî bi awayekî rêkûpêk bi navên xwe yên cuda werin destnîşankirin. Ji bo destnîşankirina kilamên bêrîtm em ê qîm pê bînin ku di vir de mînaka kilama *Amînayê* bidin:

*Were were were were ax were were were Amînayê
Wile keçê dînê reşrihanê nêrgizê çav berdayê,
Ew sosinê ûy hawar e gelî gundîyan û cîrana bêhn vedayê
Wile sosinê gazî kirî nêrgizê ûy ûy kupek dayê
Reş rihana devê kanîka îû îû ber rûbara kat vedayê
Hingî qîzik û perî tèn bêhnekê bêhna Amînayê ji keskê nayê
Hingî qîz û perî tene ez ê çî bikim
Ji govendê ji seyrana bêhin kim, bêhna Amînayê ji kesekê nayê*

*Bejna Amînayê ûy ûy ûy li bin kona de rûniştî
Mala bar kir wa li bin kevrî
Reşkonê mala babê min bar kirî
Çûne serbanê Entirbê raserî Cizîra Bota dane pişt kevirî
Piştî serê çendekî wextan e, çend buhar ser min re bûrîn ûy ûy ûy
Ez ê jê re bikim girî ûy ûy Amînayê
Keçê malxirabê heke pirsyar û pirsyara ji xelkê bikin
Wextê Amînayê nabînim
Te bo çî walî li min kirî ez kirim kewê qefesê
Rondikêt çava tenê ji çavê min bî
Rebenê ez kor kirim
Were were were were ûy Amînayê
Wele nêrgizîka weke sosinê*

*Wila reşrihana devê kanîkê qeydek dayê
De wila ez ê çi bikim sebir û sekana dilê min çi cara bi kesê nayê
Talîya paşî û ez ê biçim dîsanê wila xwe bikim
Evdal piştî Amînayê
Were were were hez kî newe
Ez zanime Amîna her dê bêjit te ji min re
Nevêt kul e çend keser e*

*Reşkona bar kir wara dana ser wara
Keçê dinê xema çi car nexwî
Xem giran in xema nexwî ez ê çim
Ji niha pê ve ser kanîya ser seqlana cihê wara
Ez ê gerim ser kanîka ser rûbara
Ser gera şûna wara
Wila ji ber xatirê wê ra bibim hawar
Ebdal dîn û har bim biqetînim bêhn bikim şûna Kona şûna wara
Ez ê dîsa xwe weke dîn û hara bigerim cihê kona barkirinê cihê wara
Ax were were here were Amînayê
Reş rihanê nêrgizê ûy ta bi tayê
Ev serê çendekî çend salan e
Hindî dikim sebir û sekanê min bi kesê nayê
Ax were were em biçin Çemê Cîna¹³³*

3.1.2. Berhemên Rîtmîk (Stranên Gelêrî)

Berhemên rîtmîk ên muzîkê anku stranên gelêrî ji hêla meşîna lêdanî ve xwedîyê bingeh û ahengeke peryodîk in û herîkîna zemanî bi beşkirina ji hev tînd cudakirin. Rîtmên stranên bi taybetî derbarê rîtuêlên reqs û dansa çandekê de bigeheke lêdan û forma peryodîk a pêlêkirinê îfade dike. Dema em berê xwe bidin rîtmên stranên gelêrî yê Mihemed Arif strandî, em rastê tînd ku piranî rîtmên reqs û govendê bi kar anîne, ev in: 2/4, 4/4, 5/4, 5/8, 6/8

¹³³ Mihemed Arif Cizîrî, Amînayê, <https://www.youtube.com/watch?v=5ajyi9cYxbs>, (drk. jgr. 26.02.2018).

Mihemed Arifê di heman demê de berhevkarê folklorê ye, çî cih û devera lê gerîyayî stranên wan herêman ji ber kirîye û li hin cihên din îcar kirine û bi tomarkirinê ew malên gelêrî nemir kirine. Ji vê hêla xwe ve mirov dikare wî weke çavkanîyeke stranên gelêrî jî bi nav bike. Dema qala jîyana xwe dike bi van agahîyan destnîşan dike ku çawa stran berhev kirine: *“Ez mezin bîm. Dengê min xoş bî. Hindik stran min dizanîyan, ji xelkê jî min guhdarî dikir. Min ji xwe re kelîmat didan hevdu. Min ew digotin.”*¹³⁴ Di vir de mirov pê derdixe ku piranîya berhevkarîya stranên wî yê li şahî û ahengan stranên gelêrî yê rîtmîk in.

Stranên gelêrî yê rîtmîk rasterast bi dans û rituelên civakekê ve girêdayî ne. Stranên rîtmîk ên Mihemed Arif Cizîrî piranî stranên herêma Botanê yê ji biçûktahîya xwe ve fêrbûyî û stranên herêma Behdînan ên ji gerîna wan deran fêrbûyî ne. Her çendî bi şeweyên îcrakirinên carinan ji metronomên dansê hinekî derketibin jî seranserê stranên Mihemed Arif strîyayî yê dîlan û dawetan e anku dansên gelêrî ne. Heke mirov çend ji van dansan destnîşan bike: *Dugavî, sêgavî, cihde, bablekan, sixcanê, şexanî, lorke, navincî, giranî, semedanî...*

Em dikarin bo mînak strana *“Çûme Stembûlê”* ya rîtmîk a reqsa sêgavî ku xwedî rîtma 4/4 destnîşan bikin:

*Min mektûb rê kir çûme/tême Herbûlê
Yarê/dostê mi bî esker, çûme Stembûlê*

*De were were de were were
Te sûtîm cano ji bejna/canê te re*

*Çûme/hatim Stembûlê deskere standî
Mi kir hawar dê çendî wî gazî
Te sûtîm cano j' roja tûlaz î/çendî bi lez î*¹³⁵

¹³⁴ Mp3, *Tarîxheyata Mihemed Arif Cizîrî*, deş. Yunus Orak, (13.05.2017).

¹³⁵ Mp3, *Ji arşîva Seyran Amêdî*, deş. Yunus Orak, (20.07.2018).

3.2. Tembûra wî ya Xweser û Enstrumanên di Tomarên wî de

Di nav kodên etnîk ên muzîka herêmî nîşan didin de, hem enstrumanên herêmî hem jî şêwazên herêmî cih digirin. Heke mirov di serî de qala enstrumanan bike; “Amûrên afirandina deng ku em wekî enstrumanê bi nav dikin, li her derê cîhanê teqez di nav çanda muzîka herêmî de veşartî ne. Enstruman di karakterê cureyên muzîka herêmî de ne.¹³⁶ Têkildarî vê yekê mirov dikare bibêje ku sewta hunermendan bi awayekî eşkere bi ser enstrumana wan ve ye. Dema mirov dengê tembûra Mihemed Arif dibihîze bi awayekî mirov hest bi dengê wî yê ku hêj tîkêlî muzîkê nebûyî dibe. Heta radeyekê em dikarin bibêjin dengê wî û tembûra wî li gel hev bûne yeksan.

Ew tembûra xwe ya ku ji 14 perdeyan pêk tê ku ji malxalanên xwe yê Êzîdî fêr bûye, pê kilamên folklorî û yê xwe bi selîqeyek resenî dijene û dibêje.¹³⁷ Mihemed Arif bi lêdana tembûrê ji dengbêjên Kurd cihê dibe. Bi lêdana tembûrê ew dengbêjekî nadir yê serdema xwe, hetta yek ji îstîsnayan e ku ev hêla wî ji seranserê dengbêjan cuda dibe. Ji nav hemû tomarên Mihemed Arif yê li ber destê me ketî, bi tenê em rasta strana varyanteke “*Koçerê*” û “*Mêhvano*” hatine bê enstruman hatîye strîn. Ji bilî van du sê îstîsnayan (ku ew tomarên bê enstruman jî bi îhtîmaleke gelekî mezin, dema li malê an jî cihekî tomarê dike, tembûra wî ne li cem wî ye, an jî pîrsgirêkek heye) bi qasî me lê kolayî, em li rasta tomareke ku Mihemed Arif bêtî tembûr strandî nehatin. Di seranserê strîne de tembûra wî jê re hevaltîyê dike û rengedengê tembûrê bi ser dengê wî ve ye. Akord û pergala tembûra wî xweser e, li kû bê bihîstin bi hêsanî guhdêr pê derdixin ku tembûra Mihemed Arif e. Hetta divê bê gotin ku Mihemed Arif pênaseya tembûra xwe di kilamên xwe de jî derbas kirîye. Ser meseleyê di kilama Eysana Elî de pênaseya tembûra xwe dike ku 14 perde ye û em pê derdixin ku Mihemed Arif tembûra xwe ya xweser ew bi xwe çêdike. Pê tê derxistin ku wî bi xwe tembûra xwe ava kirîye. An jî heke darê wê peyda dike jî navbera perdeyên wê li gorî xwe eyar dike û akora tembûra wî xweserê wî ye. Kilama navborî ya ku tê de qala tembûra xwe dike ev e:

¹³⁶ Banu Mustan Dönmez, *Sosyal Bilimler Araştırma Dergisi*, Bölgesel Müzik Kültürleri İçinde Bulunan Etnik Kimlik Kodları Üzerine Analitik Bir Değerlendirme, c.2, 2011, r. 161.

¹³⁷ Zeynep Yaş, *Şakarên Muzîka Kurdî*, c.1, weş. Şaredaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2015, r. 192.

*Lê lê lê wayê ûy tembûrekê ez ê çêkim ji Eysana Elî re
Tembûrekê vayê çardeh perde way gundîno
Li ber serê Eysana Elî rûnim bi tilîka xwe ji te re lê bidim
Yekê ji mereqa yekê ji xela yekê zecran yekê derda way way way gundîno¹³⁸*

...

Di strîna kilaman de mirov pê derdixê ku tembûr ji dest wî bê girtin dê gotinên kilamê neyên bîrê. Di gelek cihên ku gotinên stran an jî kilamê nayên bîra wî, di cih de tembûr wê valahîyê dadigire. Stranên Mihemed Arif ku piçek jê an jî nîvcoyî dizane bi alîkarîya tembûrê kompozisyona stanê tê tamamkirin. Bi alîkarîya tembûrê gotinên ku ji emprovîzasyonên kêlîyê xulikî, li nava stranê tîr zêdekirin, bi vî awayî kilam an jî stran vediguherin varyanteke din. Anku Mihemed Arif tiştek ji kilama bihîstî, bi motîfên di bîra xwe de û bi alîkarîya muhletdana tembûrê bi awayekî jixweber bi terz û stîla xwe kilamê ji nû ve vedijîne. Dîyardeya sereke ya ku resenîya Mihemed Arif derdixê pêş tembûra wî ye. Bi jenîna tembûra xwe stran û kilama dike nav kirasekî xweser.

Her çendî awantaj û erênîyên enstrumanê hebin jî divê em cih bidin alîyekî din ê enstrumanê ku di warê dengbêjîyê de wek neyînî tê dîtin. Dildar Şeko dîyar dike ku dengbêj bêyî enstruman huner û dengê xwe bi awayekî nûwaze derdixîne. Bikarananîna enstrumanê ya dengbêjan weke veşartin û nixumandin qusûrê wan tê famkirin.¹³⁹ Ev tesbît di her rewşê de bi giştî ne derbasdar be jî alîyekî enstrumanê heye ku dengbêj carinan ji tîrbûn û têrbûna gotina xwe hin ferexatan bike. Dema mirov bala xwe didîyê dengbêjên ku enstruman bi kar anîne tenê ne berhemên dengbêjîyê di heman demê de berhemên rîtmîk jî îcra kirine û bûne stranbêjên govend û dîlanan jî. Elbet ev yek nirxekî ji dengbêj kêr nake lê hin dengbêjan muhtemelen ji ber hêsanbûn û wesetbûna gotinên stranên rîtmîk ên gelerî zêde binirx nedîtine û di serdemên ku tomarkirina dangan a sînordar de hêjayî tomarkinê jî nedîtine. Mirov dikare ekolo Serhedê ya wek Eydela Zeynikê û dûmahîkên wî yê wek Reso û Şakiro mînak nîşan bide ku wan qet enstruman bi kar neanîye û pê re jî stranên rîtmîk jî ji berhemên dengbêjîyê nehesibandine. Lê belê Mihemed Arif ji kêr

¹³⁸ Mihemed Arif Cizîrî, Eysana Elî, <https://www.youtube.com/watch?v=EBvgH0H55SU>, (drk. jgr. 25.03.2018).

¹³⁹ Newzat Çelebi, Vedat Yıldırım, Aytekin G. Atas (2006) *Geleneksel Kürt Müziğine Genel Bir Bakış*, <http://www.kardesturkuler.com/paylasim/28eylul2006.htm>, (drk. jgr. 15.06.2017).

wan kesan e ku bi tembûra xwe ya resen di nav terza xwe de başbaş bi cih kirî û ev yek dayî pejirandin.

Her wiha hêjayî destnîşankirinê ye ku em cih bidin dengên amûrên di tomarên qewan û şerîtan de jî. Ji ber ku Mihemed Arif bêhtir di nav gel de maye zêde derfetên orkesraya pirdeng nedîtîye. Di dîwan û şevbêrkan de li gel tembûra xwe ji bo ahenga rîtmê dimbik jê re hatîye lêdan. Dema dimbik jî nebû di stranên rîtmîk de bi çepik û destkutan di ber re lêdane. Hetta balkêş e ku di hin stranên de guhdêr an jî hunermendên li civatê ji bo bi rîtmê tevkarîya stranê bibin, bi kevçî li firax û îskanan deng derxistine ku em di hin tomaran de rastî van hatine.¹⁴⁰ Di Radyayo Bexdayê de ji ber ku derfet hebûn di nav kilam û stranên wî de li gel tembûra wî; keman, kanûn jî tê bihîstin. Her wiha di hin tomaran de ûd jî jê re lê tê dayîn. Hêjayî gotinê ye ku Mihemed Arif carinan jî tenê bi tembûra xwe stran, bi taybetî kilam lê dane û mûzîka enstrumantal jî îcra kirîye. Di tradîsyona dengbêjîyê de ev xaleke pir balkêş e.¹⁴¹

3.3. Afirandin û Îcrakirina Berhemê

Di ristin û avakarina kilam û stranên Mihemed Arif de hin rêbazên giştî û ên xweserî wî hene ku bîst destnîşankirin. Bi saya van şeweyên vegotinê û pêşkêşkirinê kilam ji hin pêkhatayên xwe ber bi kemilandinê ve diçe.

3.3.1. Jixweberî (Emprovîzasyon)

Jixweberî hêlekî sereke yê hunerê ye ku hunermend bêyî çî plan û bernameyan ava bike bi awayekî fêrbûnîyên binhişî, têkildarî zeman û mekanê dîyardeyên muzîkal bi awayekî xwezayî li xwe zêde dikin û di nav berhemê de dikevin teşeyeke kemilî û resen. Di jixweberîyê de her çendî hêmana ji nişka ve (di cih de) hebe jî bi giştî ji bo jixweberî xurt be pêwîstî bi asteke bilind a hunerî heye ku pala xwe bide wan fêrbûnî û tecrubeyan. Ji ber ku her çendî peyv û gotin weke jixweberîyê xuya dikin jî mirov tê derdixe ku ew qalibên hatî bikaranîn û derketî holê, ji bingehên berhemên din diqetin û dikevin nav berhemeke din û vediguherin diruvekî nûjen. Yek jê hêmana afirînerîya dengbêjîyê û koka zayîna varyantan jî ev

¹⁴⁰ Mihemed Arif Cizîrî, Suha, <https://www.youtube.com/watch?v=2naI97iyhQY>, (drk. jgr. 16.02.2018).

¹⁴¹ Mihemed Arif Cizrawî Enstrumantal, https://www.youtube.com/watch?v=7F-e-nS9xjE_, (drk. jgr. 21.03.2018).

hêla hunerî ya dengbêjîyê ye ku dengbêj bi vê yekê bi sedan kilaman dide zayîn û avakirin. Dema mirov bala xwe dide hin tomarên heman stran an jî kilameke dengbêjekî ku di demên cuda de strîyayî, hindik an jî zêde hin cudahî di navbera gotin û newayên wan de çêdibin. Ev yek jî rasterast têkildarî hêla jixweberîyê ya dengbêjîyê ye. Anku ji ber dînamîzma jixweberîyê ya hêlekî dengbêjîyê, berhem jî her cara ku hatî îcrakirin di şeweyekî resen de ye ku bi tamamî nabe kopyaya îcarakirineke din a heman berhemê.

Di hunermendîya kilam û stranan de hema bêje gotinên tu stranan ne sabît in. Gotin piranî emprovîze ne an jî bi alîkarîya hin qaliban hin gotinên resen ên îskeleya kilamê lê tên zêdekirin. Hin kilam heke temaya wan nêzî hev be, bi beşên cuda yên kilamên din tên bihevvekirin û straneke nû jê çêdibe. Mihemed Arif çî berhem bihîstibe û xwestibe wê berhemê îcra bike, di serî de pala xwe daye rêbazên xwe û gelek tişt li berhemê dane zêdekirin. Mirov nikare her berhema wî gotî tê derxe bê ji kû bihîstîye û wî çî lê zêde kirine. Lê ji bo ku em bikarin sînore jixweberîya wî dîyar bikin em ê li ser straneke ku teqez ne ya wî û teqez bihîstî û xwestî îcra bike, rawestin. Strana “Şev çû” ya ku gotinên wê yên Cegerxwîn in û xwedîyê newayê Aram Tîgran e, mînakek baş e ji bo destnîşankirinê. Varyanta Mihemed Arif ev stran weke “Şev bûrîbî” îcra kirî, xwedî heman newayê ye. Lê di gotinan de ji bilî “Şev Çû” ku Mihemed Arif weke “Şev Bûrîbî” dibêje, tu şibandina gotinan tune ye. Mirov teqez pê derdixe ku Mihemed Arif ev stran ji guhdarîkirina “Şev Çû” ya Aram Tîgran derxistîye. Lê di dawîya gotin û qalibên emprovîzasyonî stran ketîye teşeyeke cuda ku mirov êdî bi tu awayî wan bi ser hev ve nebe. Strana “Şev Çû” ya Aram Tîgran:

Tenê hiştim ay dil îşev çima çû

Wî ez kuştim ay dil îşev çima çû

Rabe pey kev ay dil zû wî werîne

*Te'z biriştim ay dil îşev çima çû*¹⁴²

Strana bi navê “Şev bûrîbî” ya ji vê newayê hatî girtin a Mihemed Arif:

¹⁴² Kakşar Oramar, *Dengê Azadîyê Sembola Biratîyê Aram Tîgran*, weş. Şaredarîya Mezin a Amedê, Stenbol, 2015, r. 232.

Şev bûrîbî mame bi tinê dilo lî lo lo
Şev bûrî bî mame lo bi tenê
Dîv de diçûm li govendê bigihemê
Ber wa kêla lo lo ez li bendê me
Şev bûrîbî ez mame lo bi tenê

Ji wê ve hatin cotek lo lo du sêv in, du sêv in
Ji wê ve têne lo cotek du sêv in
Pêk ve rûniştine herdu diaxişîn
Wê te bikin bi zêr û bi zîvan

Tu nebêje qîmetê wê bejna xo
Ew nergiza hêşîn bûye li Zaxo
Min hêla bî bo lawik lawikê xo
Şev bûrî bî ez mamê wey bi tenê

Eşqekê girtim lo lo lo dijwar e
Rê ve diçûm wek dîn û hindî har e
Rabe ser xwe keçê bîye bihar e
Gul hêşîn bîn kirîye lê lê buhar e

Şev bûrîbî ez mame lo bi tenê
Dîv de bezîm min go belkî bigihimê
Lawikê min ev ê lo lo bidinê
Meke nazî lo lo min bidinê¹⁴³

Di seranserê her du stranên de ji bilî “Şev çû – Şev bûrîbî” tu gotin naşibin hev. Mihemed Arif bi saya motîfên stranên gelêrî û emprovîzasyona xwe stran xistîye teşeyekî serbixwe. Mirov dikare vê yekê ji bo hemû berhemê Mihemed Arif Cizîrî bêje ku tu berhemên wî bi vê rêbazê nabin kopyayên tu berhemên din. Ev

¹⁴³ Mihemed Arif Cizrawî - Şev Burî, <https://www.youtube.com/watch?v=LG7elg5JdJA>, (drk. jgr. 03.04.2018).

jixweberîya xweser ji bo zayîn û xulikîna hunerê tevneke xurt e û mekanîzmaya afirandinê ye.

3.3.2. Neqilkirina ji Devê Jinê

Tevî ku di gelek berhemên dengbêjîyê de yekemîn vegêr û stranbêja berhemê jin in jî ji ber desthilatdarîya mêr a civakî û sedemên olî, jinan di civat û dikan de zêde nekarîne beşdarî îcrakirinê bibin. Dema mirov berê xwe dide naveroka gelek berhemên tê dîtî ku berhem ji hêla jinekê ve hatine gotin. Anku dema mirov bala xwe dide gotinên kilam û stranên evînî û şînê ji bangkirin û zayendîya baneşan û peyvan tê dîtî ku gelek ji wan bi zimanê jinê tên gotin. Mirov dikare bibêje ku koka wan kilaman ji hest û hizrên jinekê afirîne. Dibe ku ev yek têkildarî ji hestewarîya mişt a jinan be ku hestên xwe bi eşkere û vekirî bêhtir û bibandortir vebêjin. Lê îcrakirin û belavbûna van hemû stranên ji hêla mêran ve hatîye kirin. Anku wan berhemên têr hest bi awayekî di berhemên de xwe dîyar kirine. Bi taybetî behemên li ser mêrxasî, şîn, evînî, xerîbî û xurbet û eskerî, heps û zindanan bi piranî ji hest û hizrên jinên bizr bûne û hatine strîn. Di kilam û stranên Mihemed Arif de jî ev hêla neqilkirina ji devê jinê di gelek berhemên de darîçav e. Bo mînak di berhemên; *Qetar çûbî, Babê Şikrî, Bejna lawikê min qelûn e, Besnaya Xelîl, Gidîyano, Gulûka File, Salihê Nûrê, Erê Bazo, Nesaxekî min heye, Babê Seyro, Babê Emîn, Çetero Lawo, Hesênê Mala Mûsa, Melûlo, Sihirbend Mielim, Silêmano, Smailê Xelîl, Xirabo, Xana Elî Begê, Xelîlê Xazî...*

Li ser vê mijarê em ê qîm pê bînin bi kilama “*Xelîlê Xazî*” ya ku seranserê wê bi neqilkirina ji devê hezkirîya Xelîlê Xazî tê vegotin wek mînak li vir destnîşan bikin:

*Îro niza kî ve birîn lo lo Xelîlo lo lo bi kû ve birin
Ez niza lawo Xazî kî ve birin lo lo gidî hoy li min
Ava Şetê Mezin derbas kirin lo lo gidî li min
Welle çawa birin Tora Banî Xelîlo wez rebena Xwedê
Ji canê xwe re rebena Xwedê
Ez rebenê ji canê xwe re helal kirim
De hoy hoy Xelîlo hoy lawo de hoy hoy Xelîlo lawo*

*Welle lawo lawo lo lawê Xazî
Ez zanime tu feqîr bî di zemanê xwe de belengaz î
Were serê xwe dane li ser çok û ranê min yê tazî
Welle berî çendekî çend wextan bî ne min ji xwe re direvînî ne min dixwazî
De hoy hoy hoy Xelîlo*

*Bo te rabim Io lo zêrê serê xwe dê biqetînim lo lo gidî
Ez ê biçim sera Stenbolê bo te
Wez ê rabim zêra bireşînim lo lo gidî li min
Biçim sera Erzirûmê bo te wan zêra bireşînim
Destê lawê Xazî ji xwe re bigirim hemî xelkîno lo lo
Ji xwe re ji eskerîka reş bînim
De hoy hoy mehkûmo hoy Xelîlo de hoy hoy lawê Xazî
Ez zanime di zemanê xwe de tu feqîr bî lo lo belengaz î
Were serê xwe dane li ser çok û ranê min ê tazî
Ev e serê çendekî çend wextan e, bo çi ne min direvînî
Keçikê gotî, lawo, ne min dixwazî, lawo*

*Xelîlo lawo ew çi dar e hişîn dibe di hewşa me de lo lo li min
Çawa wê darê pelçimên xwe werandin lo lo di hemdê xwe de
Xwezî Xwedê miradê min û lawkê Xazî bikira nav doşek û lihêfê lo lo qedîfe
de De hoy hoy, Xelîlo hoy, lawo*

*Ez ê îro rabim zêrê serê xwe jî ji te re lo lo biqetînim Xelîlo
Zêrê serê xwe jî ji te re lo lo biqetînim gidî
Ez ê biçim wa zêra ji te re sera Erzirûmê bireşînim lo lo li min Xelîlo li min
Ez ê biçim destê lawê Xazî bigirim gelî xelkîno
Welle dîsana lo lo ji hepisxana birevînî
De hoy hoy firaro hoy lawo
De hoy de hoy de hoy de hoy hoy Xelîlo¹⁴⁴*

¹⁴⁴ Mihemed Arif Cizîrî, *Xelîlê Xazî*, <https://www.youtube.com/watch?v=aw6wLetedko>, (drk. jgr. 05.04.2018).

3.3.3. Levvegerandina Jin û Mêr

Di nav kilam û stranên gelêrî de yek ji rêbaza din a îcrakirin û avakirina berhemê jî levvegerandina jin û mêran e. Ji vê yekê re duqolî (duet) jî tê gotin. Li gor serdemên ku berhem jê zayî û di nav kar û barên civakî de û di nav civat û bûyerên di navbera jin û mêran de rû dayî, gotinên stranên di vî şeweyî de di nav zargotina û muzîka Kurdî de cihekî taybet digirin. Her çendî metoda berhemana li gorî levvegerandina jin û mêr saz bûbûn jî bi demê re tevahîya berhema mayî dibe ku bi awayekî giştî ji hêla yek hunermendî ve hatibe xwendin û neqilkirin. An jî hunermend dema ji dora jinê derbasî dora mêr dibe qala wî lehengî dike û derbasî berdevkîya din dibe û bi vê yekê her du alîyên diyalogê hevdu temam dikin û berhem weke diyaloga jin û mêrekî teşe digire. Carinan jî dengbêj û hunermendan li ser vê bingehe weke ku bikeve dewsa herdu lehengan berhemek ji nû ve çêkirine. Her çawa be jî divê em destnîşan bikin ku dema lehengên di nava kilamê de li hev vedigerînin, ev jî dibe cureyekî avakirina kilamê. Bi taybetî ev cureyê vebêjerîyê di stran û kilamên evîndarî, mêrxasî, dîlan, govendê de derdikeve pêşîya me ku li her du alîyan jin û mêrek heye. Di nav kilam û gelek stranên Mihemed Arif îcra kirî de ev şewe berbiçav e. Bo nimûne; *Lawikê Simoqî, Felîtê Quto, Were Dotmam, Sebirmalê...*

Li ser vê mijarê em dikarin kilama “*Were Dotmam/Were Pismam*” weke mînak bidin:

Yela domam yela domam yela domam

Keçê dînê tu kulîlka hemû mêrgan û zoman

Bajarê Wanê ji min û dotmama min re nekin gazin û loman

Dotmamê, zerî kubarê, ez bi xulamê

Keçê dînê dîsana av dibarê reş ezmanan pitî pitî

Xwezî ji xêra xwedê re gelî gundîyan û cîrana

Min ê nezani dotmama min ne bi yar e ne bi dergistî

Dotmamê, zerî kubarê, ez xulamê

Pismamê xwe min dîtibû li Banê Xanê li Eyntirbê

Simbêlê pismamê min bîna têlê di qesebê

Wele min ê ji fêhêtîya gundîyan û cîrana bîya

*-Bi serê min hatibî - min ê devê xwe bavêta destê xwe pê re
Qevda xencerê danîba ser rayê di kezebê
Pismamo zerî kubarê, hezar caran dotmamê ez xulamê*

*Ava şetê me şerbet e
Pêlan û pêlan li hevdu kete
Pelçimê dara li min û dotmama min bû kaxet e, pelê ewrê pê re
Evîni bi serdanê pêxembera çendî pir e lo lo pir adet e
Evîniya min û keleş gewra min li Cizîra Botan nav alemê bûye qebahet e
Pismamo, zerî kubarê ez bi xulamê¹⁴⁵*

3.3.4. Çîrokbêjîya Kilamê

Kilamên dengbêjîyê her çendî gelek detayan derbarê bûyerekê de vebêjîn jî gelek caran dengbêj pêdivî pê dibîne ku hin bûyerên di nav kilamê de derbas nabin, bi awayekî teatral û vegotina bînewa di hin cihên kilamê qalê dike. Bi vî awayî di navbera dengbêj û civatê de têkilîyeke berfirehtir û sihetî jî derbas dibe. Bi vê yekê guhdar û dengbêj di hin cihan de bêyî ku têkilîyên çîrokê jev biqetînim bêhna xwe berdidin û diherikin nav bûyerê. Di îcrakirina hin kilamên Mihemed Arif Cizîrî de jî ev şêwe hatîye bikaranîn. Carinan berîya kilamê wek pêşekê pêşkêş dike. Carinan di navbera beşên kilamê de agahîyên din bi awayekî bînewa lê zêde dike. Em dikarin weke çend mînak van kilamên Mihemed Arif destnîşan bikin; *Bihara Simo, Ehmedê Silîvî, Kinê, Şalê, Çiyayê Simrûtîk, Seyrana Mele Mûsa...*

Di kilama “*Ehmedê Silîvî*” (*Siyabendê Silîvî*) de, di serê kilamê de û di nava kilamê de bi awayekî çîrokbêjî qala bûyeran tê kirin. Kilam ji du versiyonên cuda hatîye deşîfrekirin û bi awayekî berfirehkirî ev e:

Pêş axaftina kilamê: Ehmedê Silîvî, xweyê tîr û kevanê zîvî, Xecê sed car ji te re gotîye, neçe serê Çiyayê Sîpanê Xelatê nêçîra heywanê pezê kûvî, çimkî ew xweyîkuj e. Qiseta wî kûr û dûr e...

¹⁴⁵ Mihemed Arif Cizrawî, *Dotmamê*, <https://www.youtube.com/watch?v=Fm2reB6EL7c>, (drk. jgr. 08.05.2018).

Çîrokbêjî: *Ehmedê Silîvî Nêçîrvan bî li serê çîyayê Sîpanê Xelatê, raserê Behra Wanê. Daîmil ew kat ew der mij û moran e û tofan e, her ewr e û baran e. Ehmedê Silîvî destê Xeco girt revand. Bir şikeftê de, binîya Sîpanî. Êvar e, bejneker erd maye roj biçe ava. Ehmedê Silîvî serê xwe danîye ser çoka Xecê. Wextê pezê kûvî bûrî, rabî Xecê qeherî. Kelê girînê dayê, rondik ji çavên wê hatin, ker ser rûyê wî. Ehmedê Silîvî veciniqî. Go ew çi ye Xecê, heke te divê ez ê te vegebin mala babê te? Xecê got, na wile qiseta min ne ew qiset e, ne ew gotin e ne ew şitexalî ye jî. Got pa çi ye? Go ew e, mala babê min welê çelebî jê dibûrîna, mala babê min gelek e, pezê Kûvî jî bûrî. Kela girî li min da, ez ji wan re qeherîm. Got pa wile, madem te welê got, ez ê tîr û kevanê xwe rakim biçim serê Sîpanî, illeh wî pezî bikujim.*

*Hayê ûy ûy ûy ûy li min hayê li min hayê hayê êê
Sed cara li min hayê Ehmedê Silîvî gotî qeda bila bikeve vê dinyayê ûy ey
Xecê
Xecê serê Sîpanê Xelatê mij e moran e wa bi mij e
Serê Sîpanê Xelatê wa bi mij e
Xecê çend caran ez ji te re dibêjim Ehmedê Silîvî neçe nêçîra heywana pezê
kûvî
Ma tu nizanî ew serê Sîpanê Xelatê xweyîkuj e ûy ûy hayê hayê
Ehmedo oy oy oy Ehmedê Silîvî
Xweyî tîr û kevanê zîvî
Min ne gote te Xecê seda caran gote te dîsan e
Neçe nêçîra heywanê pezê kûvî oy oy hayê
Xecê oy oy oy hayê hayê*

Çîrokbêjî: *Bî şev, navbêra mexreb û eşa, befîr sipî ye. Xecê ma û ma nehat. Hingî reşik hebûn, mû. Xelkî reşik dixistan lingê xwe de, di berfê de nedîçûna xwar. Serê Sîpanê Xelatê befîr zor e. Xecê reşik di lingê wê de ye, elimî ye, çîya ye diçîtê. Dê dê serê Sîpanê ket. Ronahî ye ji ber berfê. Êdî fikir çipikê xwîne li wê dê ne. Ser dewsa wî çû, gihîşte wê rastê. Fikir serê Sîpanî pezê kûvî hema çi nemaye wê bikevit ada behrê de. Şerjêkirî ye, kêrik avêtîyê xelas*

*nekirîye. Ehmed ne dîyar e. Holê berê xwe da revezê, da berê xwe biditê.
Ehmedê Silîvî Xecê dît û gazî kitê:*

*Ehmedê Silîvî gotî Xecê hayê hayê
Xecê Xeca şengê Xecê Xeca şengê
Kezîyokê te li mi bîna tengê hayê
Heywanê kûvî ez kuştîm avêtîm binîya Xelatê
Ez ê li benda te bim heta kengê hê*

*Ehmedê Silîvî Xweyî tîr û kevanê zîvî
Min ne gote te neçe nêçîra heywanê pezê Kûvî¹⁴⁶*

3.4. Mijar û Naverokên Berheman

Bi awayekî gelemperî mirov nikare her stran û kilamê bike di nav kategorîyekê de û li gor sînordarîya mijareke derxe pêş. Carinan dema mirov berê xwe dide straneke evîndarîyê di heman demê de tê de mêrxasî jî heye, sirûşt jî heye. Di stranên şînê de gelek caran hêmanên evîndarîyê derbas dibin, an jî di kilamên şerr û mêrxasîyan de hin mijarên din jî dibe ku hebin. Ji ber vê yekê jî karekî ne hêsan e ku mirov bikare her berhemê bi ser navê mijarekê bi nav bike. Hemû berhem pirhêl û pirhêmanî ne.

Di nav 240 stranên ku wek pêvek di dawîya vê tezê de hatî destnîşankin, hêmanên sereke ku em di nava berheman de rasta wan hatî ev in:

- a. Evîndarî/xweşikbûna jinê, erotîzm
- b. Heps û Zindan
- c. Kêf û şahî
- d. Mêrxasî/şerr
- e. Mirin û kalbûn
- f. Sirûşt (Xweza)
- g. Şîn/zêmar

¹⁴⁶ Mihemed Arif Cizîrî, *Ehmedê Silîvî*, <https://www.youtube.com/watch?v=kqSqOjo7Sxs>, <https://www.youtube.com/watch?v=3kQ1HZor2g>, (drk. jgr. 12.03.2018).

- h. Welat/Têkoşîna neteweyî
- i. Xerîbî û xurbet û eskerî
- j. Xizanî û feqîrî

Ji bo vê beşê li ser van hemû temayan em ê ranewestî tenê çend ji van mijar û temayên di nav stran û kilamên Mihemed Arif Cizîrî de derbas dibin, bi hin mînakên hewl bidin destnîşan bikin.

3.4.1. Welat û Têkoşîna Neteweyî

Mihemed Arif Cizîrî bi zêdebarî stran û kilamên gelêrî û folklorîk îcra kirine û afirandine. Li gel vê yekê bûyer û pêşveçûnên serdemê bi awayekî xwezayî li ser hest û hizrên wî bandor kirine. Pêşveçûnên bizavên neteweyî yên Kurdan û bi taybetî têkoşîna şoreşî ya Mele Mistefa Barzanî yên di serdema wî de pêk hatî ji bo hin kilam û stranên Mihemed Arif bûne mijar. Di vê derbarê de Îsmail Geylanî di hevpeyvîna xwe de wisa dîyar dike: “*Sala 1971’ê di navbera Mele Mustafa Barzanî û hikûmeta Bexda mufawezat çêbû. Ewan çar salan medya Kurdî li aliyê ahengan da, beşdarîkirina Mihemed Arif Cizîrî di aliyê şoreşê da stran gotin li ser Kurdistanê û Babê Luqman yê nemir Mele Mistefa rolekî mezin li ser wan hunermendan dît. Wekî her gotina sirûdê şoreşvanî.*”¹⁴⁷

Mihemed Arif carinan jî stranên folklorîk bi gotinên aktuel ên sîyasî revîze kirine û bi vî rengî berhem ava kirine. Di warê Kurdîtî û Kurdistanê de stranên wî yên ku em rastê hatin ev in: *Welatê me Kurdistan, Ew milkê Kurda, Alayê Kurdan Zer e, Partî me (lê yadê) Çîyayê Simrûtik, Segvanîno (Babê Luqman), Gelîyê Zawîtê, Mîrê Botan hwd...*

Ji bo destnîşankirinê em ê qîm pê bînin beşa pêşî ya kilama “*Çîyayên Kurdistan (Welatê me Kurdistan)*” mînak bidin:

...*Welatê me bî Kurdistan e lo wey lo ax*
Hemî pê zanine ber de deşt e, ser de zozan e lo weylo lo weylo lê weylê
Ber de deşt e ser de zozan e

¹⁴⁷ Dîroka Me, Hevpeyvîna Mehmûd Lewendî ya bi Îsmail Geylanî re, Kurd1, 2012
<https://www.youtube.com/watch?v=JGDWBcJ5hK8>, (drk. jgr. 17.07.2018).

Bes heyfa mi tê wê heyfê nîvî ketî destê Tirka, nîvî ketî destê Îran e lo weylo lo weylo
Ez bi serê te kim her mêrekî beramberî geleman e roja qewimandinê lo mamiko
Evraz e bin de gelî girkê asê ye tu rê naçine, ileh Kurdê tinê
Wexta ji berê de heta nûke min gotibû
Xebatê bikin hê li çîyayên evraz e rêka me dûr e lo weylo lo weylo
*Welatê me bî Kurdistan e weylo...*¹⁴⁸

3.4.2. Şer û Mêrxasî

Hêman û mijareke din a sereke ya mijarên berhemên Mihemed Arif Cizîrî stranên epîk û lehengîyê ne ku em vê cureyê wek kilamên “Şerr û mêrxasî”yê pênase bikin. Bi taybetî bûyer û pevçûnên ku Mihemed Arif qala wan dike şerên li Bakur pêk hatî yên di dawîya sedsala 19 û heta nîveka sedsala 20’an de pêk hatine. Ev şer carinan di navbera eşîran û dewletê de carinan şerên eşîran ên li hemberî hev in. Di nav tomaran de çend kilamên şer û mêrxasîyê em dikarin wisa pêşkêş bikin: *Axawo (Emînê Perîxanê), Babê Nûrê, Babê Emîn, Babê Fexrî, Babê Nadirî, Babê Semîr, Babê Şebo, Babê Şikrî, Çeto (Çetero lawo), Derwêşê Evdî, Elîkê Be’tê, Felîtê Quto, Metran Îsa, Mihemed Axayê Germavokî, Mîro (Mîrê Botan), Nadir Beg (Siwaro), Silêmano, Simaîlo (Simaîlê Xelîl), Şerê Eşîreta Herkîya, Xana Elî Begê (Xanê Emyanê)* hwd.

Di vî cureyê kilaman de pirî caran peyv û qalibên ku derbas dibin ev in: *Kozik û çeper, qesr û dîwanxane, çek û sîleh, heyf û mixabin, heyfa min tê wê heyfê, bi sê derba birîndar e, derbeke lê dane, nalîna birandara, rojên qewimandinê, dest hilînîn, terş û talan, nijdevan, êl û eşîr, ferman e, fermaneke giran e, xweşmêr, mêrxas...*

Ji bo destnîşankirinê em ê beşek ji kilama “*Elîkê Be’tê*” mînak bidin:

...

¹⁴⁸ Mihemed Arif Cizîrî, *Çîyayên Kurdistanê (Welatê me Kurdistan)*, https://www.youtube.com/watch?v=IA4aO_jvGEA, (drk. jgr. 18.03.2018).

*Wez ê bi Hafa mîrata Dugurê ketim navbeyna du çîya bî
Hafekê darê darkenêr e, bi kevot e, darkenêr e
Softî Birahîmê Gijalî gazî kirî gorî gelî Gijalîno
Beyana sibê ji wê ve û hatî Elîkê Betê
Siwarê ciwanîkî şînbozî enîstêr e
Gelî Gijalîno roja me mêran e
Tilîtan li çeçmeqên bêşetaşan û çaplîyan bişidînin
Heçî ji pêşîya Elîkê Betê
Ji kozîk û neseb û kevrê xwe derkeve
De biçê malê dîsana jina xwe dewsa keça xwe bi destê xwe bidin mêr e*

*Welle dîsana Softî Brahîmê Gijalî gazî kirî Elîkê Betê
Bi hafa Mîrata Dugurê letim hafeka çawa wa bi gelî
De min dît çawa dengê çaplîyê Mala Hecî ne
Dengê hegnebaşê kurê Henê Heydo li Herzexê
Hatîbû lo lo nalîn lê dikelî
Heyfa min tê wê heyfê
Çawa derbeka ji Zinarexê lédane Mûsayê Fatê
Kuştin semyanê Dêra Zinaraxêr babê feqîr û jara
Ez ê lê lê kurê
De çawa nalîné vî xweşmêrî li guhê min dikelî
Lo lo dêranê...¹⁴⁹*

3.4.2.1. Motîfên Çek û Sîlehan

Di hemû kilamên şer û mîrxasîyê de bikaranîna cureyên çek û tîfîngan derdikeve pêş û navên wan teqez derbas dibe. Di nav kilamên navborî de cureyên çek û sîlehan ku em lê rastê hatî ev in: *Sîstem (sustem), sêrî, şeşxan, bêşetaş, hegnebaş, destqet, eynelî, qamzirav, helqedar, martêlî (martîni), mayzer (mawîzer), canbêzar, çaplî, qontirî, bizmarhêr.*

Di kilama “*Babê Emîn*” de navê “*çaplî û bêşetaşê*” wisa derbas dibe:

¹⁴⁹ Mihemed Arif Cizîrî, Elîkê Be'tê, <https://www.youtube.com/watch?v=qFEed-74D5c0>

...

Lê dayê lê dayê lê dayê lê dayê lê dayê

Kûrê nemayê lê dayê

Sibe ye lo lo bayekê li min sar tê

*Dengê çaplîya bêşetaşa ser qesra Babê Emîn dûrkinar tê lê yadê...*¹⁵⁰

Di kilama “*Babê Nadirî*” de “*canbêzar û mayzer*” wisa derbas dibe:

...

Hatîye gundê me barekî canbêzarê firotinê

Hatîye gundê me barekî ji vê canbêzarê firotinê

Ez ê ketime xelkîno li bextê we û Xwedê de

Ez li bextê we û Xudê me rabin mayzereka

*Bidin segvanê mala babê min, bidinê Segvano...*¹⁵¹

Di kilama “*Emê Gozê*” de qala tifinga “*sîstem (sustem)*” derbas dibe:

...

Bişarî kire gazî gotî

Kevrê kozika Baxemsê hilweşînim ser serê te de

Emero lê zivirî gotî

Sê siwar wê têne ji deşta Mûşê de

Evro sîstemeka ji mi re ji alî Dîyarbekirê û hatî dîyarî ye

Ez ê bi tîfenga xwe bavêjim Emerê Gozê ji Bişar re dibêjî

*Da tu bizanî hikmê sîstema Emerê Gozê çi ye, lo lo maqûlo...*¹⁵²

3.4.3. Şîn û Zêmar

Di gelek kilamên wek mêrxasî û evîndarîyê de li ser mirî û kuştîyan hin gotin û bîranîn hene. Ji van kilaman re “*zêmar*” an jî “*şîn*” tê gotin. Lê hin caran hêmanên şînê di hin kilaman de hebin jî seranserê kilamê ne zêmar e. Lê hin kilam hene ku bi

¹⁵⁰ Ji arşîva Seyran Amêdî wek mp3 hatîye wegirtin. deş. Yunus Orak, (20.11.2018).

¹⁵¹ Mihemed Arif Cizîrî, Babê Nadirê, <https://www.youtube.com/watch?v=1mmDuaGI6uk>, (drk. Jgr. 12.12.2018).

¹⁵² Mihemed Arif Cizîrî, Emê Gozê, https://www.youtube.com/watch?v=42_7leQ3p0k, (drk. Jgr. 23.05.2018).

temamîya temayê li ser şînê ava bûyî. Bo mînak kilama li ser kuştina “*Emînê Perîxanê (Emînê Ehmed)*” yê axayê Reman ji zimanê xwişka wî hatî neqilkirin bi temamî ji pesn û mixabinîyan pêk tê û kilameke şîn û zêmarê ye:

...

*Şeveqa tavê beyanî lê da siba segurî maqûlo
Ji keyfa dilê min û te re sibe bî beyanî sibe segurî
Emînê sê denga li xwişka xwe melesê dikire gazî
Digo pirça serê min û te bi kurr bê
Xwezî min ê bizanibîya birakê min bî Emîno
Li kû dê wê sax e wê de mirî
Axawo tu axa yî, axawo tu axa yî
Tu kelama pêş çavê maqûlan û hemî neyaran î
Wele çawa kuştine birakê min Emîno
Kul û mereq û derd û elem û cefayê vî xweşmêrî
Dilê eşîra giran de mayî gundo
De hoy gundo de hoy gundo şewitîyo*

*Bejna birakê mi bî weke bîna nêrgiza nêr e xelkîno
Hişîn dibe li devê hepisxana Dîyarbekirê
Wele çawa hêşîn dibe bejna Emînê birakê min bî
Devê hepisxana Dîyarbekirê li bara Silê li min sinsile
Xwedê bila canibê xwe de topekê bîne lê bide
Mala qumandara wele çawa dîsan e kuştine lawê mi bî
Heta xira kirine taxima devê wî bî zêr e*

*Axawo tu axa yî tu kelema pêş çavê maqûl û neyaran î
Wele çawa kuştine Emînê lawê min bî
Kul û mereq û derd û elem û cefayê vî xweşmêrî
De dilê eşîra Pencenazê de mayî
De hoy gundo gundo şewitîyo...¹⁵³*

¹⁵³ Mihemed Arif Cizîrî, Axawo (Emînê Perîxanê), <https://www.youtube.com/watch?v=Ta0jmF7vIBg>, (drk. jgr. 14.05.2018).

3.4.4. Xerîbî û Xurbet û Eskerî

Di afirandina hunerê de dîyardeyên ku hilberîn pê dibin gelek caran zorî û zehmetîyên jîyanê ne. Ji van dîyardeyan xerîbî û xurbet û eskerî mijarên sereke ne. Kesên ji ber pêdivîyên dinyayî, bi mecbûrî bi xerîbî û xurbetê ketî an jî kesên bi zorê birîn leşkerîyê di kilamên Mihemed Arif de xaleke sereke ye ku derdikeve pêş. Di kilama “*Xelîlê Xazî*” de leşkerîya Tirkan weke “*eskerîka reş*” hatîye binavkirin:

...

*Bo te rabim lo lo zêrê serê xwe dê biqetînim lo lo gidî
Ez ê biçim sera Stenbolê bo te
Wez ê rabim zêra bireşînim lo lo gidî li min
Biçim sera Erzirûmê bo te wan zêra bireşînim
Destê lawê Xazî ji xwe re bigirim hemî xelkîno lo lo
Ji xwe re ji eskerîka reş bînim
De hoy hoy mehkûmo hoy Xelîlo de hoy hoy lawê Xazî
Ez zanime di zemanê xwe de tu feqîr bî lo lo belengaz î
Were serê xwe dane li ser çok û ranê min ê tazî
Ev e serê çendekî çend wextan e, bo çi ne min direvîni
Keçikê gotî, lawo, ne min dixwazî, lawo...¹⁵⁴*

Her wiha dema ji ber zorî û zehmetî û debara jîyanê berê lawik dikeve xerîbî û xurbetê bêrîkirin û evîna di navbera wî û hezkirîya wî jî dibe hêmaneyek kilamê ji neqilkirina devê hezkirîya wî ji bo wê ji bîr neke hin soz û peyman derbas dibin:

*... Wextê gelî xelkîna û guhdaran û cîrana
Berê te ketî terefê welatê xerîban û xurbetê Xanê
Wele tu bikî gustîlek zêr û zîvî
Rebenê dîne min li tilîya xwe ke
De û xanê ûy xanê de ûy xanê
Beşera dilê min rebena xwedê can nedîyar e ûyy...¹⁵⁵*

¹⁵⁴ Mihemed Arif Cizîrî, Xelîlê Xazî, <https://www.youtube.com/watch?v=aw6wLetedko>, (drk. jgr. 19.05.2018).

3.4.5. Hepisxane û Zindan

Jîyana Mihemed Arif jî wekî ya gelek Kurdan bi girtîgeh, sirgûnî û xizanîyê derbas bûye. Ev hêmanên neyînî di ji bo hunera wî bûne motivîvasyon ku van pirsgirêkên civakî bi awayekî tomar bike û ragihîne. Mihemed Arif jî yek ji van e ku arşîveke berfireh ji van êşan bo mîrateya çanda Kurdî hiştîye. Yek ji van dîyardeyan jî heps û girtîgeh in. Kilama “*Mîro*” (*Mîrê Botan*) a ji hêla Nesrîn Şêrwan ve jî li radyoya Bexdayê bi navê “*Dîlan Dîlan*” hatîye stîrîn, bi hêmanên weke girtî û hepsîbûnê diavêje ser bindestîya Kurdan ku hewara xwe digihîne rojên berê yê mîrîtîyê û bang dike Mîrê Botanê yê Cizîrê.

...

Rojka me derketî Mîro ûy ûy Mîrê Botan lo lo ji alê Wanê ûy Mîroo

Şewqa wê xwe avêtî Eyndîwerê, Cizîra Botan

Xwezî ji xêra xwedê re cabeka xêrê ji mi re bihata, bigota

Hevalê te berdane ji hepisxanê hatin cot bi cotan Mîro

Em hepsî ne em girtî ne oy Mîroo

Wele ji ber vê hepisxanê goştê laşê min helîya Mîroo

Tu canê min tê nema Mîro tu li min nema Mîro... ¹⁵⁶

3.4.6. Evîndarî

Hêmana evîndarî û dilketinê awayê herî berfireh a mijarên berhemên Mihemed Arif Cizîrî pêk tîne. Zêdebarîya berhemên wî li ser xweşikbûn û bedewbûna jinan û pênaseyên erotîk in ku di vê beşê de em ê her du binbeşan bi hin mînakên destnîşan bikin.

3.4.6.1. Bedewî û Xweşikbûn

Hin pênase û ravekirinên Mihemed Arif ên sereke û taybet hene ku di gelek stranan de ji bo pênasekiririna xweşikbûn û bedewîya jinê rêz dike. Di hin stranan de jî bi yekcar stran bi temamî li ser temaya jinekê ava dibe û bi feyz û bandora jinekê

¹⁵⁵ Mihemed Arif Cizîrî, Xanê, https://www.youtube.com/watch?v=PDzckWU5_Xg, (drk. jgr. 16.05.2018).

¹⁵⁶ Mihemed Arif Cizîrî, Mîro-Mîrê Botan, <https://www.youtube.com/watch?v=5HgEspRilbk>, (drk. jgr. 03.05.2018).

dîyar e stran hatîye ristin. Hetta di stranên dawetan de an jî di stranên rîtmîk ên Mihemed Arif de hema bêje li ser navê her jinekê stran hene ku qala xweşikbûna wê dike. Bo mînak: *Bedûlê, Belqîz, Emînê, Êmo, Ermenî qîz, Eyşê, Fehîmayê, Firyal, Gulnîşan, Hacerê, Hey Bano, Hey Maro, Hisna Hesînê, Lê lê Hinê, Lê Gulê, Mellî Mellî, Mem go Xezalê, Mencilê, Meyremê, Nazdara min, Nazê Nazelîyê, Qumrîkê, Recîne, Rehîmê, Sara, Sarê, Selîma Leylo, Selîmam Helîmam, Sînem, Sixcanê, Solîn e, Songul, Suha, Were Şarê, Were esmerim, Xifşê, Xanimê, Xoxê...*

Pênaseyên wî yên sereke bo xweşikbûn û dîyarkirina jinan em dikarin bi vî awayî rêz bikin: *Keleşgewr, reşrihan, sorgul, biskbitêl, xizêmşor, navtengxezal, kofkêl, enîdeq, poşîxwehr, keleşgewr, torîn, xezal, tûlaz, rûsor, xumal, çavreş, gewrê, cindî, bermalî, bejnbilind, gerdenqaz, gerdenmorî...*

3.4.6.2. Erotîzm

Dema hêmaneke ji ber eyb û şermîyên civakî nikabire bê gotin û kirin, bi awayekî ew hêmana ji hêla otorîte û qedexeye lê hatî, bi rêya hunerê bi awayekî rêyekê ji xwe re di nav hunerê de dibîne û xwe tê de dide jîyandin. Di serê van hêmanan jî hêmana erotîzmê heye ku bi awayekî rehet û hêsan nikare bê kirin û vegotin. Ji ber vê yekê jî dengbêjan daxwaz û dilkêşîyên civakê yên bi vî rengî veşartî derxistine nava civatê û ew bi ziman û estetîzmekê ava kirine û pêşkêş kirine. Di stran û kilamên Kurdî de hêmana erotîzmê ji ber ku qedexeyên civakî û olî û serdestîyê zêde ne, bêhtir ji gelê din di hunera wan de derdikeve pêş. Nexasim Mihemed Arifê Cizîrî bêhtir stran û kilamên evîndariyê strayî, hêla hunera wî ya erotîzmê pir sereke û balkêş e. Di zêdebarîya stranên wî yên evînî de ev hêmana erotîzmê bi awayekî xwezayî heye.

Di nav temaya erotîk de, temaya memikê jinan cihekî taybet pêk tîne. Di folklorê Kurdî de tu beşeke bedena jinê bi qasî memikan ew ne xurt û rengîn e. Di hin stranên de em rasta motîfên lêv, sûret, gerden, qirikê tîn. Lê belê ev der ne wek memikan balkêş in, di planeke duyemîn de dimînin û gelek caran bi peyva ramûsanê

de tèn bikaranînin. Di şûna peyva memikê de hemwateyên wek “çiçik, bistan, sîng, pêsr, paşil, sîngûber” jî tèn bikaranîn.¹⁵⁷

Bi taybetî stranên rîtmîk ên ji bo govendê ku piranîya wan li ser jinan e gelek motîf û qalibên li ser sîng û ber û memikan hene. Di strana “*Nêrgiz Nêrgiz*” de wisa pênaseya memikê wisa tê kirin:

...

Hey Nêrgiz Nêrgiz Nêrgiz sorgulê bêrîvanê
Serî sor memik qurmiz Nêrgizê narê ciwanê
Îşev li memka bîme miz Nêrgizê narê ciwanê
*Îşev li memkê bîme miz sorgulê bêrîvanê...*¹⁵⁸

Di strana “*Ho yeman Zeko*” (*Zekîya*) de pênaseya memik wisa dike:

...

Ho yeman Zekîya
Keçê dilê min êşîya
Bêhna misk û emberê
Ji memika pijîya
Memik qeymaxê mîya
*Ser devê lawa helîya...*¹⁵⁹

Di strana “*Gulê wey nar*” de stû û lêv û memik bi şibandina xwarinê ne:

...

Gulê ser sînîya savarê
Keçê mi stû lêvê te xwarê
Gulê ser sînîya savarê
*Gulê min memikê te xwarê...*¹⁶⁰

¹⁵⁷ Rohat Alakom, *Di Folklorê Kurdan de Serdestîyeke Jinan*, weş. Avesta, Stenbol, 2013, r. 98

¹⁵⁸ Mihemed Arif Cizîrî, *Nêrgiz Nêrgiz*, <https://www.youtube.com/watch?v=LKZewVNqW80>, (drk. jgr. 13.04.2018).

¹⁵⁹ Mihemed Arif Cizîrî, *Zekîya*, <https://www.youtube.com/watch?v=ACWmkWcUhCY>, (drk. jgr. 19.04.2018).

Di strana “*Wey li min*” de jî memik weke kanîya vexwarinê pê nase dibin:

...

Wey li min wey li min wey li min
Lo gidî mal û mal serê memka guvajî wey li min
Serê memika xwih dayî ew bo çî
Mi du fincan jê vexwar wey li min
Mi dotin dan jê neqand wey li min
*Yek av bî yek bi derman wey li min...*¹⁶¹

Di kilama “*Befîr Barî*” de jî fonksiyona memikan weke dermanê gelek derdan tê destnîşankirin:

...

Heçî bêtin tewefa memikê min rebena xwedê bejna min pê re
Ji her du qewlê Xwedê bit
*Derman dikim, kor bit, şehî bit, şil bit, seqet be, birîndar be, nîvdîn be...*¹⁶²

Di kilama “*Bêrîvanê torîvanê*” de jî sîng û ber wekî zozan û hêmanên sirûştî hatine dîyarkirin:

...

Tasa serê Bêrîvana min zêrîn e ooo
Sîng û ber û bedana Bêrîvana min çil û çar kanî ne
Wele gelî gundîyan û cîranan
Şevê dibe heta dangê sibê Bêrîvanê
Hingî devê xwe dêxime kanîka nav wê cotê memkê Bêrîvana malxirabê gelî
gundîyan û cîranan

¹⁶⁰ Mihemed Ariff Cizîrî, Gulê wey nar, <https://www.youtube.com/watch?v=kfzNPt6MIFU>, (drk. jgr. 13.04.2018).

¹⁶¹ Mihemed Arif Cizîrî, Wey li min wey li min, <https://www.youtube.com/watch?v=zhPL5mFwniA>, (drk. jgr. 12.05.2018).

¹⁶² Mihemed Arif Cizîrî, Befîr Barî, https://www.youtube.com/watch?v=9_EYo0UUisY, (drk. jgr. 15.05.2018).

*Ez ê dikim nakim ew bo çi hingî devê diêxime kanîka nav wê sing û berî
bedena Bêrîvana min
Wele têhna dilê min naşkîne Bêrîvanê...*¹⁶³

3.5. Di Berhemên wî de Hêmanên Bawerîyên Gelêrî û Olî

Ji bo xurtkirina vegotina kilaman dengbêj gelek caran serî li kodên bawerî û kevneşopîyên civakê didin ku ev hêman dema mirov di rewşên zehmet û neçar de an jî ji bo pêkhatina daxwazan ji bo civakê motîvasyonên sereke ne ku xwe pê bitebitînin û hêvîyên xwe pê ve girê bidin. Di nav van kodan de mirov dikare çend hêmanan bi vî rengî rêz bike: *Fal, sihr, nezer, dîtina xewnan, çêkirina nivîştan û çûyîna ser mişayîx û zîyaretan û hwd...*

Ji bo destnîşankirina vê mijarê em ê qîm pê bînin berê xwe bidin kilama “*Sihirbend Me’elim*” ku tê de ji bo neçarîya derd û êşa evîndarîyê an jî nezerê, çêkirina sihr û nivîştan tê dîtin ku serî li falker û sihirbend û hekîman tê dayîn:

...

*Şevkê ûy ûy serê min êşabî e nizanim çima
Min nezanî ne ji derdê işqê bî ne ji derdê evînîyê yan ji derdê xîzanîyê
Her sê nivîştokê te ji mi re mihbetê çêkirî keçê li doranê Kuma
Rabe rebenê dînê destê te bigirim birevînim
Te bibim Misêrbîna mala xwedî neşewitî cem mala Me’elim
Çunkî sihirker bî, çunkî ez feqîr bîm hal wextê min nebî ji derdê evînîka te bî
Bêjim Me’elim ketime bextê te û xwedê de nivîştokê çêke ji lawikê mi re
Ji qet’a nezerê da nezer li çavê wî nede ji derdê feqîrîyê xizanîyê
Welê sêbarî hewayê cina
Lawikê min nexweş e tawî ye ji derdê evînîkê dihelê mîna şima
Ax ax li min wele derdê dinyayê bêlome be ...*¹⁶⁴

¹⁶³ Mihemed Arif Cizîrî, Bêrîvanê Torîvanê, <https://www.youtube.com/watch?v=lgvac7J69Zw>, (drk. jgr. 13.04.2018).

¹⁶⁴ Mihemed Arif Cizîrî, Sibirbend Me’elim, <https://www.youtube.com/watch?v=FQVbHk0kOtY>, (drk. jgr. 08.04.2018).

3.6. Di Berhemên wî de Hêman û Şeweyên Vegotinê

Di kilaman de hin şewe û hêmanên din ên vegotinê hene ku dengbêj vê yekê ji bo xurkirina gotinê û bawerîpêanîna vegotinê di gelek cihan de bi kar tînin. Ev kod û motîfên vegotinê mirov dikare bi giştî di bin van sernavan de destnîşan bike:

- a) Dijûn/xeber
- b) Dua û lavakirin
- c) Gilî û gazin û lomekirin
- d) Heyfanîn
- e) Nifir
- f) Pesn û pend
- g) Qewl/Şert
- h) Sûnd/soz/ehd
- i) Şîret
- j) Xwezî

Mirov dikare van şeweyan pirtir jî bike lê em ê qîm pê bînin ku ji van tenê berê xwe bidin dua û nifiran ku carinan dijberê hev xuya bikin jî ji ber ku her du jî daxwazan dihundurînin carinan jev nayên derxistin. Hin qalibên duayan ku em rastê hatine ev in:

“Diayekî min heye ez ê bixwazim belkî ezmanê te’ala Xwedê qebîl bike.”

“Xewna te qulwelle û sê ehed bê.”

“Xwedê miradê min û wî bikira.”

“Xwezî ji xêra xwedê re, derîyê mîrê mirada re.”

“Xwedê neke, kes bêxweyî bê.”

“Xwedê bistranda çavê reş û belek weke çavê Koçerê...”

Her wiha em dikarin çend nimûne û qalibên nifiran ên di nav berhemana de jî wisa destnîşan bikin:

“Babê min kor bibî çima ez nedamê...”

“Edûlê mala bavê te xerabê setimîyê.”

“Bila sê sed qeda û belayê dinyayê bikevin bext û tîrê te xedarê.”

“Xwedê topekê bînê lê bide mala fesad û ewanan.”

“Xwedê mala bavê te xira bike.”

“Welle ji canibê Xwedê topekê lê bidê mala wî...”

“Heçî navbeyna min û keleşgewrê qisetkê şitexalîkê biaxive, kulekî bikeve ser wî dilî

“Qeda bila bikeve vê dinayayê”

“Heçî nevbeyna her du dila de, wele wa dîsa qisetkê, gotinekê, şitexalîkê biaxive...”

“Heçî navbeyna min û keleş gewrê de fesadîkê bike...”

Di nav kilama *“Mebrûm Xan”*ê de em dikarin hêmana nifirê wisa destnîşan bikin:

...Bila babê Mebrûm Xanê xêrê bike xêrê nebînê êê

Sed qirxalê dextlê biçînê, şûna wê zîwanê hilînê (dexla wî bişewite)

Kodika durizînê babê wê bi destê xwe bigire, mal bi mal bigerînê

Heta kita/heba zadê xêrê bi çavê serê xwe nebînê wayê

Wez ê çawa dame kurê Nûrê Ecemoka, sebebê çi bî nedame Elî Axayê

*Şikak...*¹⁶⁵

Di nav kilama *“Mihemedo Ronî”* de jî nifirek heye hêjayî destnîşankirinê ye:

...Heçî rabe nevbeyna min û Mihemedê min de fesadîkê bike

Heke mêr bê nezewicê, heke jin be newelidê

*Heke keç bê bi ciwanîkê xwe şa nebê...*¹⁶⁶

Her wiha sînd ew gotin in ku kesê/a pê bawer dike ji bo pêkanîna mirazeke xwe wê yekê weke referansekê nîşan dide ku li ser wê motîvasyonê dixwaze xwezî û miraza xwe pêk bîne an jî berovajî wê yekê li ser ya xwe be ku tişteki pêk neyne. Di nav berhemên Mihemed Arif de hêmanên sîndên ji bawerîyên cuda yên xweser cih digirin. Em dikarin ji nav kilama *“Şemsîxanê”* vê mînakê bidin:

¹⁶⁵ Mihemed Arif Cizîrî, Mebrûm Xan, <https://www.youtube.com/watch?v=CXzJXqeoN0I>, (drk. jgr. 25.05.2018).

¹⁶⁶ Mihemed Arif Cizîrî, Mihemedo Ronî, <https://www.youtube.com/watch?v=p-5KjdV25zs>, (drk. jgr. 15.06.2018).

... *Min sûnd xwarî cardî nakim mêr e nakim mêr e*
Hêvîya girê nadim ûy rebenê dewsa şêr e
Piştî bejna zirav dêmalekî sorê gulê xelekê xizêm e rebenê
Li mi heram bê behra bal û mêra
Şemsîxanê sûndekî bixwim bi Quranê
*Piştî bejna zirav dêmalekî sorê gulê li mi heram bê Gulika Kesrewanê...*¹⁶⁷

Her wiha sûndxwarina li ser kitêbên pîroz jî di hin kilaman de derbas dibe. Bo mînak kilama “*Rûmî*” em dikarin destnîşan bikin:

... *Keçê sûnd nexwe bi Incîlê bi Tewratê*
Min ê sûnd xwarî bi Qur'anê bi Mishefê
*Dî lawikê xerîb tu nabe...*¹⁶⁸

Di hin cihên kilaman de jî şert û qewl hene ku weke sûndê xuya dikin lê hinekî jê cuda ne. Di vir de şert û qewlek bo yekê/î tê dayîn ku bi sûndê xwe pê ve girê dide û li gorî şertekî pêk tê. Bo mînak em dikarin berê xwe bidin kilama “*Lawikê Me'denî*”:

...
Min ê sûnd xwarî bo te bi sûnda qesemê
Bi qanîna Romê, Şêx Îslamê, Şêxê vê silhê
Ez bimirim Gulê gotî ez ya erdê me
Piştî wê re ji darê dinyayê bimînim sax
Ez ya lawikê xwe yê kurê Me'denî me hao ooo hê hê hê
*Hezar cara hayê li min hayê.*¹⁶⁹

¹⁶⁷ Mihemed Arif Cizîrî, Şemsîxanê, <https://www.youtube.com/watch?v=zqTfHF07Ldk>, (drk. jgr. 16.06.2018).

¹⁶⁸ Mihemed Arif Cizîrî, Rûmî, <https://www.youtube.com/watch?v=c0dgVoa0tmc>, (drk. jgr. 17.05.2018).

¹⁶⁹ Mihemed Arif Cizîrî, Lawikê Me'denî, <https://www.youtube.com/watch?v=IG-T1MKMShM>, (drk. jgr. 18.04.2018).

ENCAM

Dengbêj bîranînên xwe, bûyerên civakî yên bihîstî an jî dîtî, berhemên folklorîk ên çanda devkî, li gor hestpêkirin û têgihiştina xwe, bi formên vegotin û melodîk û bi kod û motîfên civakî yên cîyawaz pêşkêş dikin. Tevî ku di dengbêjîyê de gelek çarvan hêmanên vegotinê derdikevin pêş jî hema bêjê piranîya formên degbêjîyê melodîk in. Ji ber ku dengbêjî hunereke pabendî Kurdan e, bi hêmanên xwe yên melodîk di nav disîplîna etnomuzîkolojîyê de hêjayî nirxandin û senifandinê ye.

Etnomuzîkolojî şaxeke zanistî ye ku muzîka çandekê an jî bineçandekê; reng û berfirehiya dengên wê, şeweyên îcraya wê, têkilîya wê ya bi çanda jê xuliqî, ji aliyên cuda ve vedikole û danberhevîya wê bi muzîkên çandên dîtir re dike. Têkilîya muzîkê rasterast bi çawanîya civakekê re têkildar e û di vê çarçoveyê de her muzîk têkildarî etnomuzîkolojîyê (muzîkolojîya çandî) ye. Di serdemên cuda yên dîrokê de, di beşên cihêreng ên civakî de û di civakên jev cihê yên cîhanê de, serwerîya kevneşopîyên muzîkên gelek jev cuda, pir eşkere nîşan dide ku di nav civak û hunerê de têkilîyeke berbiçav heye. Ji vî alî ve pêkhatayên komekê an mezinahîya civakê her çawa be jî muzîka li wê civakê tê kirin bi muzîkolojîya çandî dikare bê pênasekirin. Di peywenda etnomuzîkolojîyê de muzîka Kurdî an jî dengbêjî bêyî ku bi awayekî giştî bê pênasekirin, ji ber ku her stranbêj û dengbêj xweserî xwe reng û resenîyan dihewîne; divê bi awayekî serbixwe û di nav lêkolînên qadê de bi hurgilî bîr vekolîn. Ji bo vê yekê jî mînak Mihemed Arif Cizîrî me hilda dest.

Li jor di pêşkêşkirina etnomuzîkolojî û jîyana Mihemed Arif Cizîrî de armanc ew bû ku têsîra jîyana wî û ya civaka wî ya li ser huner û naveroka berhemên wî bê vekolîn. Di raçavkirina jînenîgarîya wî û sosyolojîya têkildarî etnîsîteya wî de em rast lê hatin ku Mihemed Arif Cizîrî wekî Kurdekî jîyaneke di nav xizanî, nezanî, tunehî û bindestîyê de derbas kirîye û ev hêman bi awayekî dîyar di nav berhemên wî de xuya dibin. Ji bo vê tezê bi awayekî giştî berhemên Mihemed Arif Cizîrî bi du beşên weke kilam (berhemên bêrîtm) û stran (berhemên rîtmîk) hatin dabeşkirin. Kilamên ku taybetmendîyeke sereke ya dengbêjîyê ne, bi forma xwe ya vegotina melodîk her çendî hin hêmanên hevpar ên wan hebin jî hêman û taybetmendîyên Mihemed Arif jî ku rengîniya wî îfade dikin, hatin nîşandayîn. Her wiha ji ber ku

Mihemed Arif bi tembûra xwe strîyaye, di heman demê de di şahî û ahengan de bi formên muzîkên gelêrî û muzîkên govendê jî strîyaye. Stranên rîtmîk ên gelêrî ku nivê repertuara wî pêk tînin, hemû di bîr û hişê xwe de berhev kirine û pê re jî bi behreya xwe ya jixweberîyê gelek stran û kilam afirandine û yên malê gelêrî jî li gorî stîla xwe û rengedengê tembûra xwe kirine teşeyekî xweser.

Mihemed Arif Cizîrî di sedsala bîstan de gelek derfetên sazkirina hunerê jî peyda kirine. Bi ger û geşta ernîgarîyeke berfireh a weke Rojihilata Navîn bi berhevakarîya xwe ya têr û tijî ji bo muzîka Kurdî û dengbêjîyê rol û rista xwe ya serdemî hewl daye ku pêk bîne. Têkilîyên wî yên xurt ên bi civakê re rê li ber geşkirina hunera wî vekirîye. Di sedsala bîstan de ku amûrên ragihandinê yên wekî qewan, radyo, vîdeo, şerît, kaset hwd... û derfetên enstruman û orkesrayê ji bo tomarkirina hunera Mihemed Arif Cizîrî şans û xweserîyên taybet derxistine holê. Bi van derfetan wî repertuwareke berfireh bo siberoja hunera Kurdî hiştîye ku qadên lêkolînên curbicur pêşkêşî me dike. Naveroka berhemên wî yên ku xwe dispêrin serborîyên wî û civaka wî bi kod, motîf û mijarên xwe qadeke xweser û reneçandekê dîyar dike. Hemû serpehatî û serborîyên wî û li gel hêmanên folklorîk di nav berhemên wî de cih girtine û dema mirov berê xwe dide naveroka berhemên wî bi awayekî giştî mirov bi ser detayên çand û fêrbûnîyên civakî ve dibe. Hemû ev dîyardeyên çandî berê me dide muzîka wî ya xweser û resen a çandî.

ÇAVKANÎ

1. Çavkanîyên nivîskî:

- ALAKOM, Rohat; *Di Folklorê Kurdan de Serdestîyeke Jinan*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2013.
- ANT, Beşîr; *Bilbilê Kurdistanê Mihemed Arif Cizîrî*, Weşanên Ba, Stenbol, 2012.
- ASSMANN, Jan; *Kültürel Bellek*, çev. Ayşe Tekin, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2001.
- ATTALÎ, Jacques; *Gürültüden Müziğe*, çev. Gülüş Gülcügil Türkmen, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2014.
- AYAS, Güneş; *Müzik Sosyolojisi*, Doğu Kitabevi, İstanbul, 2015.
- BAĞI, Resul; KARAHASANOĞLU, Songül; *Elektronik sosyal bilimler dergisi*, Türkîye’de Yaşayan Arap Alevileri (Nusayriler)’İN Etnik ve müzikal kimliği, bahar, c.14, s.53, 2015.
- BİNGÖL, Abdulkadir; *Kulîlkên Baxê Botan*, Weşanên Enstituya Kurdî ya Amedê, Stenbol, 2008.
- BULGAN, Murat; *Müzik Etnolojisi*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2016.
- ÇİFTÇİ, Tekin; *Di Kilamên Evînî yên Dengbêjan de Temaya Jinê*, Teza Lîsansa Bilind, Mêrdîn, 2014.
- ÇOBANOĞLU, Özkul; *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Çağ Yayınları, Ankara, 1999.
- DOĞUDUYAL, Meliha; *Müzikten Söze*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2016.
- DÖNMEZ, Banu Mustan; *Müziğin Kökeni Üzerine*, Gece Kitaplığı, 2015.

- DÖNMEZ, Banu Mustan; *Sosyal Bilimler Araştırma Dergisi*, Bölgesel Müzik Kültürleri İçinde Bulunan Etnik Kimlik Kodları Üzerine Analitik Bir Değerlendirme, c.2, s.3, 2011.
- DUHOKÎ, Xelîl; Folklorik Kürt Stranlarında Aşıkların Gamları, *İnatçı Bir Bahar*, edit. Vecdi ERBAY, Ayrıntı yayınları, Stenbol, 2012.
- EROL, Ayhan; *Müzik Üzerine Düşünmek*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2015.
- FARQÎNÎ, Zana; *Ferhenga Kurdî-Tirkî û Tirkî-Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2007.
- FLOWER, Günay Koçhan; *Kovara Ziryab, Têkilîya Sîyaset û Muzîkê*, wer. Yûnis Das, h. 2, 28, 2019.
- JÎYAN, Rênas; *Çirûskîzm*, Weşanên Belkî, Stenbol, 2012.
- KAPLAN, Ayten; *Kültürel Müzikoloji*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2013.
- MUTLU, Erol; *Kürt Müziği*, Avesta Yayınları, İstanbul, 1996.
- NEZAN, Kendal; *Kürt Müziği*, Avesta Yayınları, İstanbul, 1996.
- ORAMAR, Kakşar; *Dengê Azadiyê Sembola Biratiyê Aram Tigran*, Weşanên Şaredariya Mezin a Amedê, Stenbol, 232, 2015.
- ÖZBUDUN, Sibel; ŞAFAK, Balkı; *Antropolojî: Kuramlar/Kuramcılar*, Dipnot Yayınları, Ankara, 2005.
- ÖZER, Yetkin; *Müzik Etnografisi*, Dokuz Eylül Yayınları, İzmir, 2003.
- PARILTI, Abidin; *Sözün Yazgısı Dengbêjler*, İthaki Yayınları, İstanbul, 2006.
- PAŞAOĞLU, Sibel; *İzmir Ulusal Müzik Sempozyumu Bildiriler Kitabı*, Müzikal Kimlik Oluşumu Ve Kültürel Aidîyet Duygusu Gelişiminde Geleneksel Müzikler, İzmir, 2010.

- SAYGUN, Ahmed Adnan; *Yalan - Sanat Konuşmaları*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2009.
- SERVIER, Jean; *Etnoloji*, çev. Mehmet Ali Kayabal, Cep Üniversitesi, Presses Universitaires de Fransa, İletişim Yayınları, 1992.
- SÖZER, Vural; *Müzik Ansiklopedik Sözlük*, Remzi Kitabevi, İstanbul, 1996.
- ŞEN, Besime; *Devlet Piyasa Parti (Nizamettin Ariç ve Kürt Müziği)*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2016.
- ŞENEL, Onur; *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Müziğin Evrenselliği Varsayımı Ve Etnomüzikolojide Evrensel Arayışı, c.7 s.33, 2014.
- YAŞ, Zeynep; *Şakarên Muzîka Kurdî*, c.1, Weşanên Şaredaredariya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2015.
- YILDIRIM, Vural; KOÇ, Tarkan; *Müzik Felsefesine Giriş*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 2003.
- YILDIZ, Burcu; *Ermeni Müziği Tarih Yazımında 'Milli Kimlik' Kurgusu*, Vol: 10 Issue:1, 2013.
- ZERAQ, Dilawer; *Ferhenga Biwêjan/Deyimler Sözlüğü*, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2005.
- ZEREN, Ayhan; *Müzik Fiziği*, Pan yayıncılık, İstanbul, 1995.

2. Çavkanîyên Elektronîk:

Babê Mêhvan û Mihemed Ari Cizîrî, Ava Tv, 2018

<https://www.youtube.com/watch?v=adyGXEPWtd8>, (drk. jgr. 15.01.2019)

Bernameya Nûçegihan, Nevzat Aladağ, hevpeyvîna bi Babê Mêhvanî re, 2015

<https://www.youtube.com/watch?v=g7XTW6DOEUM>, (drk. jgr. 18.01.2019)

Bîranîna Mihemed Arif Cizîrî di gel Hesên Cizîrî

<https://www.youtube.com/watch?v=I2FRISCeZMA>, (drk. jgr. 15.05.2017)

Dersim Oramar, Lêkolîn û bernameyek li ser weşana radyoyên bi zimanê Kurdî,

<http://www.kulturname.com/?p=1609>, (drk. jgr. 10.05.2017)

Dîroka Me, hevpeyvîna Mehmûd Lewendî ya bi Îsmâil Geylanî re, Kurd1, 2012

<https://www.youtube.com/watch?v=JGDWBcJ5hK8>, (drk. jgr. 25.08.2018)

Hevpeyvîna li gel Babê Mêhvanî, Jîyana Hunermed Mihemed Arif Cizîrî, Zagros Tv

2018 <https://www.youtube.com/watch?v=0wO3zU4hMNs>, (drk. Jgr. 20.08.2018).

Kakşar Oramar, Ji girtîgeh û avkêşîyê heya efsaneya Mihemed Arifê Cizîrî,

<http://muzikKurd.blogspot.com.tr/2012/03/efsaneya-mihemed-arife-ciziri.html>, (drk.

Jgr. 01.05.2017)

Konê Reş, Bilbilê Çîyayê Botan Mihemed Arif Cizîrî,

<http://www.saradistribution.com/ciziri.htm>, (drk. Jgr. 07.05.2017)

Li ser babê mêhvanî û jîyana wî digel hunermend mihemed Arif cizîrî WAAR TV,

2017, <https://www.youtube.com/watch?v=7SVxdS-Zyîy> (drk. Jgr. 26.08.2018).

Newzat Çelebi, Vedat Yıldırım, Aytekin G. Ataş (2006) Geleneksel Kürt Müziğine

Genel bir bakış, <http://www.kardesturkuler.com/paylasim/28eylul2006.htm>, (drk. jgr.

15.06.2017).

Seyit Yöre, Müzikoloji, Etnomüzikoloji ve Müziğin Bilimsel İncelenimi,

<http://muzik-sanat-dusunce.blogspot.com.tr/2011/10/muzikoloji-etnomuzikoloji-ve-muzigin.html>, (drk. jgr.15.04.2018).

Zagros tv, 2012, <https://www.youtube.com/watch?v=TNmLbKdhZyA>, (drk.

jgr.16.05.2017).

<http://www.ferheng.org>

<http://www.tdk.gov.tr>

Aydın Müzik,

https://www.youtube.com/channel/UC0_cyfoE3n85cC5YsP3Hhkw , (drk. jgr.2017-2019)

Azadî û Dengbêjî, <https://www.youtube.com/channel/UCowiBNnZ-mfEAj--5ss1u5A/featured>, (drk. jgr. 2017-2019)

Berekat Özmen,

https://www.youtube.com/channel/UCZNMFuKpm_J_yfacU3Lhx8Q, (drk. jgr. 2017-2019)

cilo ses mavi su avaşın,

<https://www.youtube.com/channel/UCXjIHW2k-Pw6ZR5XOqtok7w>, (drk. jgr. 2017-2019)

Ciziri Radio,

<https://www.youtube.com/channel/UCmw3kUJSbvBdEfgDaUpu7Fg/videos>, (drk. jgr. 2017-2019)

Cizre Videoları, <https://www.youtube.com/user/cizirabotann/videos>, (drk. jgr. 2017-2019)

Denge Cizira Botan,

<https://www.youtube.com/channel/UC92eDPg4ZvrKXGrPwHVJY-Q/videos>, (drk. jgr. 2017-2019)

Hakkarî Kurdistanî,

https://www.youtube.com/channel/UCWe7I5qcqq4I6BR7F_5xGdg, (drk. jgr. 2017-2019)

Kom Müzik, <https://www.youtube.com/channel/UCDWOrzgrD0Ksa5aRGu0XRTg>, (drk. jgr. 2017-2019)

Kurtcemuzik, <https://www.youtube.com/user/kurtcemuzik/featured>, (drk. jgr. 2017-2019)

Mihemed Arif Ciziri Internet Radio,
https://www.facebook.com/CiziriRadio/?ref=br_rs, (drk. jgr. 2017-2019)

Mihemed Arif Cizîrî, https://www.facebook.com/mihemedarifciziri/?ref=br_rs, (drk. jgr. 2017-2019)

Mo'tesim Mezher, <https://www.youtube.com/user/dilbercane/videos>, (drk. jgr. 2017-2019)

MuzikaKurda, <https://www.youtube.com/user/MuzikaKurda/videos>, (drk. jgr. 2017-2019)

Omar Surchi, <https://www.facebook.com/omar.surchi.589>, (drk. jgr. 2017-2019)

Qehreman Zaxoyi,
https://www.youtube.com/user/qehremanzaxo/videos?disable_polymer=1, (drk. jgr. 2017-2019)

Rojwan Holm, <https://www.youtube.com/user/rojwanfarqini/videos>, (drk. jgr. 2017-2019)

sadiq sadeeq, <https://www.youtube.com/channel/UCik4H3UimYFyy-Aq0aJ-l6Q/featured>, (drk. jgr. 2017-2019)

Sayran Amedi, <https://www.youtube.com/user/sayrany72/videos>, (drk. jgr. 2017-2019)

SesMedia, <https://www.youtube.com/channel/UCO5mtxILmITQbAHAZJ9zAtw>,
(drk. jgr. 2017-2019)

Tengezar, <https://www.youtube.com/user/agerayis47/featured>, (drk. jgr. 2017-2019)

Tomargeha Mihemed Arif Cizîrî,
<https://www.facebook.com/TomargehaMihemedArifCiziri/>, (drk. jgr. 2017-2019)

PÊVEK 1: Lîsteya Nav û Çavkanîyên Berhemên Mihemed Arif Cizîrî

Berhemên ku Mihemed Arif Cizîrî tomar kirine bi giştî karekî hêsan e ku hemû bê kêmasî bînin berhevkerin. Ji ber ku hin tomarên wî nexuya ne û hin tomarên wî nîvco ne her çî qasî lîste bê amadekirin jî dê ne lîsteyeke sabît û dawî be. Me ji bo vê tezê bi giştî berhemên Mihemed Arif weke “kilam” (berhemên bêrîtm) û “stranên gelêrî” (berhemên rîtmîk) kirin du beş. Di du lîsteyên jêr de 240 berhemên dijîtal ên bi dest ketî, bi navên wan ên alternatîf û yê ten zanîn, bi hin varyant û versiyonên cuda em ê pêşkêş bikin. Mebesta me ya jî vê yekê tevî ku dê ne lîsteyeke dawî jî be, hewldaneke pêşkêşkirina repertuareke rêkûpêk a Mihemed Arif Cizîrî ye. Di serdema me de ku bi rêya ragihandina elektronîk em bi hêsanî digêhêjin gelek tiştan, berfirehkirina vê yekê xebateke girîng e. Bi pêlêkirina lînkên li jêr di qada elektronîk de bi awayekî gelekî lez pêkan e ku dîrekt mirov bigihêje berhemê.

1. Lîsteya Kilamên Bêrîtm ên Mihemed Arif Cizîrî:

	Navê Kilama Bêrîtm (Dengbêjî)	Çavkanî/Lînk Kilamê
1	Amînayê	https://www.youtube.com/watch?v=5ajyi9cYxbs
2	Ax ha wer Delal	https://www.youtube.com/watch?v=ZJkmVw6VkfM
3	Axawo (Emînê Perîxanê)	https://www.youtube.com/watch?v=Ta0jmF7vIBg
4	Ay ay babiko	https://www.youtube.com/watch?v=f0GvvYI7vLo
5	Ay ay babiko [varyant 2]	Mp3 (Arşîva Seyran Amêdî)
6	Ay Delal	https://www.youtube.com/watch?v=rPZAcRf9XL4
7	Babê Nûrê	https://www.youtube.com/watch?v=ZWpnZf1CkY
8	Babê Emîn	Mp3 (Arşîva Seyran Amêdî)
9	Babê Fexrî (Emrê Bûrî)	https://www.youtube.com/watch?v=Gt9IC0jC5IM
10	Babê Nadirê (Segvano)	https://www.youtube.com/watch?v=1mmDuaGI6uk
11	Babê Semîr (Yewnanê File)	https://www.youtube.com/watch?v=xglu1BDoZGA
12	Babê Seyro (Li min lo lo)	https://www.youtube.com/watch?v=WQZqPK2aM-A

13	Babê Şebo (Kezeba dilê min tirsîya)	https://www.youtube.com/watch?v=KznBinz2YFA
14	Babê Şikrî (Hawar Delal)	https://www.youtube.com/watch?v=23CpKW2u_Tc
15	Babê Şikrî (Hawar Delal) [varyant 2]	https://www.youtube.com/watch?v=ME_tWRGMm0E
16	Bajarê Keçikê Mardîn e	https://www.youtube.com/watch?v=_hSUAkcvNjk
17	Baran hatî venekir (Baranê Nîsana)	https://www.youtube.com/watch?v=iErxfv0IwRw
18	Bayê zozanan (Lawiko hinara bêdendiko)	https://www.youtube.com/watch?v=qM82FwrAsZ4
19	Befir barî	https://www.youtube.com/watch?v=9_EYo0UUisY
20	Bejna lawikê min qelûn e	https://www.youtube.com/watch?v=aw6wLetedko
21	Bêrîvanê torîvanê	https://www.youtube.com/watch?v=l_gvac7J69Zw
22	Beroj xweş in	https://www.youtube.com/watch?v=FB3GCr4fXBE
23	Besnaya Xelîl	https://www.youtube.com/watch?v=wkXXDr39aig
24	Beyanê	https://www.youtube.com/watch?v=l5DQyx5yXoA
25	Bihara Simo	https://www.youtube.com/watch?v=R87VbA3HyzY
26	Bilbilo	https://www.youtube.com/watch?v=J9qXZA-q0hc
27	Binevşê	https://www.youtube.com/watch?v=XWKCvWcwYG4
28	Buharekê ser me de hatî	https://www.youtube.com/watch?v=m9e0gOjYfHA
29	Canê (lê lê Canê)	https://www.youtube.com/watch?v=PdRPGgdyXkM
30	Çeto (Çetero lawo)	https://www.youtube.com/watch?v=nP6qw2ao7GU
31	Çeto (Ehmedê Bira)[varyant 2]	https://www.youtube.com/watch?v=da5eLcm7xZw
32	Çîyayê Simrûtik	https://www.youtube.com/watch?v=7GsYyyEk4FE
33	Çîyayê Şingalê	https://www.youtube.com/watch?v=oDiFBN_RwGM
34	Çîyayên Kurdistanê (Welatê me Kurdistan)	https://www.youtube.com/watch?v=IA4aO_jvGEA
35	Çîyayên Kurdistanê (Welatê me Kurdistan) [varyant 2]	https://www.youtube.com/watch?v=c3t8FUKN4uY
36	Çûme Bidlîsê (Çûme Mûşê)	https://www.youtube.com/watch?v=wAtipB

		ZmxZU
37	Derdo bêdermano	https://www.youtube.com/watch?v=TS3NaKVUD3o
38	Derwêşê Evdî	https://www.youtube.com/watch?v=IxkNooDtv-s
39	Dest li mi nede Hecî Mûsa Begê Hesenî (Gulûka File)	https://www.youtube.com/watch?v=oQbACiGa-Q
40	Dîyarbekir neşewite	https://www.youtube.com/watch?v=fRkzWs5ufoE
41	Dotmamê	https://www.youtube.com/watch?v=Fm2reB6EL7c
42	Dotmamê (Wele keçê/pismamo) [varyant 2]	https://www.youtube.com/watch?v=xMDHQp9IhZ0
43	Edûlê	https://www.youtube.com/watch?v=HFLNTPyZz_0
44	Ehmedê Silivî	https://www.youtube.com/watch?v=kqSqOj07Sxs
45	Elîkê Be'tê	https://www.youtube.com/watch?v=qFEd-74D5c0
46	Eman eman te ez kuştim	https://www.youtube.com/watch?v=juHQIUrNvNM
47	Emê Gozê(Bişarê Çeto)	https://www.youtube.com/watch?v=42_7leQ3p0k
48	Esmer (Yela yela Esmer)	https://www.youtube.com/watch?v=RH5M6tEpWkI
49	Êvar e roj tu nema	https://www.youtube.com/watch?v=1S3kHiiEzwQ
50	Eyn û Mecirwim (Leyla û Mecnûn)	https://www.youtube.com/watch?v=iErxfv0IwRw
51	Eyşana Elî	https://www.youtube.com/watch?v=EBvgH0H55SU
52	Eyşê xeberxweşê	https://www.youtube.com/watch?v=IeUrO_8JMgI
53	Ez nexweş im	https://www.youtube.com/watch?v=MMCKyy2k9CM
54	Ez Xezal im	https://www.youtube.com/watch?v=Ur5EixnZLk
55	Falker (Min nezanî)	https://www.youtube.com/watch?v=a3tL4kLGFSY
56	Fatimê	https://www.youtube.com/watch?v=D6vE-rKFp1I
57	Felitê Quto	https://www.youtube.com/watch?v=pDVCvW3KFgg
58	Gelîyê Tîyarê	https://www.youtube.com/watch?v=zFs749LCIZw
59	Gelîyê Zawîtê(Segvanîno)	Mp3 (Arşîva Seyran Amêdî)
60	Gidîyano (Gidîyano û	https://www.youtube.com/watch?v=mqyIM

	Tengezarê)	G_69mg
61	Gulê Mehrûmê (Gula Ertoşî/Gulê çîya bilind in)	https://www.youtube.com/watch?v=5FwuDVrUAJI
62	Gulê Mehrûmê (Gula Ertoşî/Gulê çîya bilind in) [varyant 2]	https://www.youtube.com/watch?v=f7CPs3z9uag
63	Gulê (Şêrînê Gulê)	https://www.youtube.com/watch?v=6e7-ya6HAHg
64	Hesenê Mala Mûsa	https://www.youtube.com/watch?v=UYHxz86uwXI
65	Hesenîko (Asê)	https://www.youtube.com/watch?v=O79Y2GyrjGI
66	Hey lo lo Delal (Delalê mala babê xwe)	https://www.youtube.com/watch?v=UC60tHCWkMA
67	Heylo dilo	https://www.youtube.com/watch?v=mv06NK41RZU
68	Hiseyno	Mp3 (Arşîva Seyran Amêdî)
69	Hizretê Nemayê	https://www.youtube.com/watch?v=YJpyEQkKfns
70	Îşev şev e	https://www.youtube.com/watch?v=EH6KRj-sAPI
71	Ji qudreta xwedê çavên te reş in	https://www.youtube.com/watch?v=higpQ6DNQQE
72	Keça Hiseyn Axa (Mebrûm Xan)	https://www.youtube.com/watch?v=CXzJXqeoN0I
73	Keçika Gundî (Keleş Gewrê)	https://www.youtube.com/watch?v=d5MxyIZ1Y1c
74	Kefyûkê	https://www.youtube.com/watch?v=SpbfM6vkIxQ
75	Kewê Kewgirê tu nazdar bî	https://www.youtube.com/watch?v=CvxjvDuDcbg
76	Kinê (Kina min)	https://www.youtube.com/watch?v=z3X1og91gZg
77	Koçerê (Wele de yar yar / Ez bimirim tu sebeb î)	https://www.youtube.com/watch?v=fcyWLHO5PHE
78	Lawikê Me'denî	https://www.youtube.com/watch?v=IG-T1MKMShM
79	Lawikê Simoqî (Kirîvê)	https://www.youtube.com/watch?v=PR6VMASirkk
80	Lorî lorî Cembelîyê min lorî	https://www.youtube.com/watch?v=L_Zu1Y0NIDU
81	Lê Evînê	https://www.youtube.com/watch?v=-cXWe5fJV2g
82	Lê lê Dînê	https://www.youtube.com/watch?v=FUC2a0e3WLM
83	Mehbûbê Şêxan (Hemkê îsa)	https://www.youtube.com/watch?v=5I7qÎyGFdZY

84	Mêhvano	https://www.youtube.com/watch?v=rY7CxOy1Pqw
85	Melûlo	https://www.youtube.com/watch?v=XrnX8O1KrQg
86	Metran Îsa	https://www.youtube.com/watch?v=vTsEZlHbeGk
87	Mihemed Axayê Germavokî	Mp3 (Arşîva Seyran Amêdî)
88	Mihemed Axayê Germavokî [varyant 2]	Mp3 (Arşîva Seyran Amêdî)
89	Mihemedo Ronî	https://www.youtube.com/watch?v=p-5KjdV25zs
90	Min dît (xewnek şevîn)	https://www.youtube.com/watch?v=Qqd-5_x3lc
91	Min sûnd xwarî mêra nakim	https://www.youtube.com/watch?v=GE2BxDGuzUU
92	Mîro (Mîrê Botan)	https://www.youtube.com/watch?v=5HgEspRiIbk
93	Mîryem (Miro, Beyazê)	https://www.facebook.com/omar.surchi.589/videos
94	Mudîro	https://www.youtube.com/watch?v=_nNQDNnF710
95	Nadir Beg (Siwaro)	https://www.youtube.com/watch?v=L96cSJk7MtE
96	Nesaxekî min heyê	https://www.youtube.com/watch?v=wFIMtH2HLA
97	Qasimê Meyro	https://www.youtube.com/watch?v=gT9TtWtNws8
98	Qetar çûbî	https://www.youtube.com/watch?v=lhaZ3mC9TS8
99	Rûmî (Were ronahîya çavê min Rûmî)	https://www.youtube.com/watch?v=c0dgVo a0tmc
100	Salihê Nûrê	https://www.youtube.com/watch?v=tYA5CKpSwDY
101	Sebirmalê	https://www.youtube.com/watch?v=Wx_Abpl5q7A
102	Ser çavan dinêrim	https://www.youtube.com/watch?v=dc24AKfqvys
103	Sêva Hacî Elî	https://www.youtube.com/watch?v=0CMVW61pCgE
104	Seyranê (Seyrana Mele Mûsa)	https://www.youtube.com/watch?v=9zYxULLJrTG4
105	Sihirbend Me'elim (dilmayê)	https://www.youtube.com/watch?v=LVwDxKULUcg
106	Sihirbend Me'elim (Ji derdê feqîrîyê) [varyant 2]	https://www.youtube.com/watch?v=FQVbHk0kOtY
107	Silêmano (Silê, Silêmanê 'Emer)	https://www.youtube.com/watch?v=jE3m9q5JoQs

108	Simaîlo (Simaîlê Xelîl)	https://www.youtube.com/watch?v=42_7leQ3p0k
109	Şalê	https://www.youtube.com/watch?v=wU4_eMQdyEE
110	Şemsîxanê	https://www.youtube.com/watch?v=zqTfHF07Ldk
111	Şerê Eşîra Herkîya	Mp3 (Arşîva Seyran Amêdî)
112	Şêxa Delal	https://www.youtube.com/watch?v=-MuvK9b0JY4
113	Tobedar im jê re	https://www.youtube.com/watch?v=1FnFEj_cKlo
114	Wer Helîmê	https://www.youtube.com/watch?v=nlr_eyvCObM
115	Were Êval (Were Lêmal)	https://www.youtube.com/watch?v=evEws6SDWnI
116	Werine tirî (Keçika Goran)	https://www.youtube.com/watch?v=2F_h7RJ9g14
117	Xana Elî Begê	https://www.youtube.com/watch?v=Krhk3KwDHfE
118	Xana Elî Begê (Xanê Emyanê) [varyant 2]	Mp3 (Arşîva Seyran Amêdî)
119	Xanê	https://www.youtube.com/watch?v=PDzckWU5_Xg
120	Xelîlê Xazî	https://www.youtube.com/watch?v=aw6wLetedko
121	Xezal Xezal	https://www.youtube.com/watch?v=73q3JKgyYy0
122	Xezalê	https://www.youtube.com/watch?v=hdgG8wIk3qY
123	Xirabo	https://www.youtube.com/watch?v=TjU-y0hnhGc
124	Yadê	https://www.youtube.com/watch?v=ZM7adQ5pOeg
125	Yadê [varyant 2]	https://www.youtube.com/watch?v=zdwH9JMq0g8
126	Yar Cîranê	https://www.youtube.com/watch?v=gp4p3Eq5R5g
127	Yar dilo(Meyro)	https://www.youtube.com/watch?v=pTSmMdGUHns
128	Yar Gewrê	https://www.youtube.com/watch?v=6TiN34I3L10
129	Ziravê	https://www.youtube.com/watch?v=GXWYUIW00YA
130	Zozanîyê	https://www.youtube.com/watch?v=7A3v1HYE5HI

2. Lîsteya Stranên Rîtmîk ên Mihemed Arif Cizîrî

	Navê strana rîtmîk	Çavkanîya/Lînka Stranê
1	Ay Lezo	https://www.youtube.com/watch?v=aETnDYZTdis
2	Babê Beşîr (Axawo lo)	https://www.youtube.com/watch?v=îygp8_SfPjE
3	Bedûlê	https://www.youtube.com/watch?v=ohN1KyvNOMs
4	Bejna Gulavê	https://www.youtube.com/watch?v=dGC_DrBLiog
5	Belqîz (Were Belqîz)	https://www.youtube.com/watch?v=rtnUMjnhONE
6	Biharê yar biharê	https://www.youtube.com/watch?v=gCI8f6GCUD0
7	Buhara çû xemilî	https://www.youtube.com/watch?v=9sstvBSapik
8	Bûrî bûrî (Miryem)	https://www.youtube.com/watch?v=AS7j1BtrwAE
9	Carek min tu dî were eywanê	https://www.youtube.com/watch?v=1Drg_S9_woc
10	Çaçanê	Mp3 Arşîva Seyran Amêdî
11	Çavreşê	https://www.youtube.com/watch?v=nD52_NBrh1c
12	Çûm Amêdîyê (Eman Suleyman)	https://www.youtube.com/watch?v=x6s3xoTPCQI
13	Çûme Stembûlê	Mp3 Arşîva Seyran Amêdî
14	Çûme Urfayê	https://www.youtube.com/watch?v=TCYTCS6WLyA
15	Dar hêjîrokê	https://www.youtube.com/watch?v=tDd6-CuRW_8
16	Dê werin gula biçînin	https://www.youtube.com/watch?v=d3Xgbt00L3w
17	Defîlê	https://www.youtube.com/watch?v=I-KrMTzB5qw
18	Desmala te	https://www.youtube.com/watch?v=-lfSILOwGNg
19	Dîlbera Mala melayî	Mp3 Arşîva Seyran Amêdî
20	Dilo ez bimrim (Rojkê ez bimrim)	https://www.youtube.com/watch?v=zdwH9JMq0g8
21	Dinya dolabil hewa ye	https://www.youtube.com/watch?v=fvyh5rK7yIM
22	Edlê (Edlayê)	https://www.youtube.com/watch?v=0kwLcLxVWkg
23	Emînê	https://www.youtube.com/watch?v=3eBkyclEx-I
24	Êmo	https://www.youtube.com/watch?v=F09KXIEfdNM
25	Erê Bazo tu tolaz î	https://www.youtube.com/watch?v=AazxjUyFLtE
26	Erê keçê tu zanî ez Kurmancî nizanî	https://www.youtube.com/watch?v=P7CdtbaAkJA
27	Erebê min	https://www.youtube.com/watch?v=n5ywKhIW1c0
28	Ermenî Qiz	https://www.youtube.com/watch?v=lZ2kUjOueTE
29	Eslê Keçîkê (Keproka çêkin)	https://www.youtube.com/watch?v=C5Byr0HnVqI
30	Ew milkê Kurda	https://www.youtube.com/watch?v=x-mhKwkhvKQ
31	Eyşê (Yar herê Eyşê)	https://www.youtube.com/watch?v=2BZYoLdQYWY
32	Ez Kevok im	https://www.youtube.com/watch?v=SyT_AjluAz8
33	Ez Xelef im	https://www.youtube.com/watch?v=edcdHQ6GRyY
34	Fatim were (Dê were Fatim were)	https://www.youtube.com/watch?v=akO8u21ZgCw

35	Fehîmayê Fehîmayê) (Yar	https://www.youtube.com/watch?v=pZiBESxwgNg
36	Firyal (Eman Feryal)	https://www.youtube.com/watch?v=Sg1JkuWsEy4
37	Gulê wey nar	https://www.youtube.com/watch?v=kfzNPt6MIFU
38	Gulnîşan	https://www.youtube.com/watch?v=m4IFd90ddCk
39	Hacerê	https://www.youtube.com/watch?v=KxxnqWOG-EA
40	Hawar Sêvê	https://www.youtube.com/watch?v=0CMVW61pCgE
41	Hay zeman zeman (Elîfa min)	https://www.youtube.com/watch?v=iErxfv0IwRw
42	Hey bano bano	Mp3 Arşîva Seyran Amêdî
43	Hey can hey canê (Mîrde)	https://www.youtube.com/watch?v=Tzw1DfHcR-8
44	Hey Maro	https://www.youtube.com/watch?v=La9k99QJqg
45	Heyla li min xerîbê	https://www.youtube.com/watch?v=phEqGacEHxY
46	Hisna Hisna Hesînê	Mp3 Arşîva Seyran Amêdî
47	Ji teyra teyrê spî me	https://www.youtube.com/watch?v=WQZqPK2aM-A
48	Keçika Mêrga çîyayî	Mp3 Arşîva Seyran Amêdî
49	Keçika Ticara	https://www.youtube.com/watch?v=fCdUznWQTbU
50	Kejê tu kej î	https://www.youtube.com/watch?v=zgfPSFalWYk
51	Kela Asîna	https://www.youtube.com/watch?v=0DXFkzCsNTc
52	Kevoka ser bedenê (Xeco)	https://www.youtube.com/watch?v=6KfAqa4R6-w
53	Kirasê te meles e	https://www.youtube.com/watch?v=olL6C9DqaOM
54	Kundiyo (Kundirê Mîranî)	https://www.youtube.com/watch?v=b9ZPHuWbias
55	Lê dînê lê dînê (Esmerê xwînşêrînê)	https://www.youtube.com/watch?v=wwwLOVCass
56	Lê Gulê helawa têr kakilê	https://www.youtube.com/watch?v=5FwuDVrUAJI
57	Lê lê Hinê	https://www.youtube.com/watch?v=h8Ka5_gbFi0
58	Lo lo Reşo	https://www.youtube.com/watch?v=LKZewVNqg80
59	Lo şivano lo wey şivano	https://www.youtube.com/watch?v=p-5KjdV25zs
60	Lorke lorke	https://www.youtube.com/watch?v=e2-QsQqLe9E
61	Mala bar kir	https://www.youtube.com/watch?v=9PI2291HB-o
62	Mardînê xweş Mardînê	https://www.youtube.com/watch?v=t80OW9hOIg4
63	Mellî Mellî	https://www.youtube.com/watch?v=wYBRmBhzeuw
64	Mem go Xezalê	https://www.youtube.com/watch?v=xf439bVyRSY
65	Memo (Xwezî biskik bîma)	https://www.youtube.com/watch?v=aEspqDY66QU
66	Mencolê	https://www.youtube.com/watch?v=nu6-Hxi2KOW
67	Meyremê (Meyrema File ye)	https://www.youtube.com/watch?v=vADhsxsBbPM

68	Min bi kelhê ra (Li hewşa dêrê dawet e)	https://www.youtube.com/watch?v=RECZNajcOII
69	Min dîtîye li ser cifrî	https://www.youtube.com/watch?v=aG7VqRySwSo
70	Nazdara min	https://www.youtube.com/watch?v=aVqjlq56kPM
71	Nazê Nazelîyê	https://www.youtube.com/watch?v=Ql6scghSw-4
72	Nazlîyê hey Nazlîyê	https://www.youtube.com/watch?v=EDyL-iSRNKI
73	Ne li mal e (Keçkokê ne li mal e)	https://www.youtube.com/watch?v=PeA0EvY1Zxw
74	Nekî nekî (Karçîn/Çûm Dîyane)	https://www.youtube.com/watch?v=xGnX_MjQA6M
75	Nêrgiz Nêrgiz (Nêrgiz narê ciwanê)	https://www.youtube.com/watch?v=LKZewVNqw80
76	Nermê (Ne li mal e)	Mp3 Arşîva Seyran Amêdî
77	Oy Delal şîrînê	https://www.youtube.com/watch?v=o40oVWPhzb4
78	Partî me partî me	https://www.youtube.com/watch?v=FYSvnxZaAhM
79	Qumrîkê ez Rûmî me	https://www.youtube.com/watch?v=1U2btla3DDE
80	Recîne (Recîne yar Recîne)	https://www.youtube.com/watch?v=yJ3TTciX9ak
81	Rehîmê Rehîmayê (Rehîm were)	Mp3, Arşîva Seyran Amêdî
82	Sara Sara	https://www.youtube.com/watch?v=c1H7Nc7MiaA
83	Sarê rabe êvar e	https://www.youtube.com/watch?v=A3XcUiiTGdU
84	Selîma Leylo	https://www.youtube.com/watch?v=MC61g7rqHJY
85	Selîmam	https://www.youtube.com/watch?v=A3XcUiiTGdU
86	Seydê min	https://www.youtube.com/watch?v=TeTldtnhM5A
87	Seyrana li ser Seyranê	https://www.youtube.com/watch?v=_JeZoLP0K4w
88	Sincano	https://www.youtube.com/watch?v=Krhk3KwDHfE
89	Sînem	https://www.youtube.com/watch?v=EGmoqpfGZQ
90	Sixcanê canê	https://www.youtube.com/watch?v=IHC_6QiprjU
91	Solîn e Solîn e	https://www.youtube.com/watch?v=6KFOFjCJobc
92	Songul (Songul Keça Tırka ye)	https://www.youtube.com/watch?v=g0ItlQFpvc
93	Suha	https://www.youtube.com/watch?v=RCZRboK_1Po
94	Şev bûrîbî	https://www.youtube.com/watch?v=LG7elg5JdJA
95	Teyrek hatî ji ezmana (Gulnaz)	https://www.youtube.com/watch?v=Sk_gPpIshqY
96	Va zerîya ez heladim (Çûme gundê Tilmûsil)	https://www.youtube.com/watch?v=PRwtFKvttjc
97	Were Şarê	Mp3 Arşîva Seyran Amêdî
98	Were were Esmerim	https://www.youtube.com/watch?v=yMcV8MbF4rA
99	Wey li min wey li min (De bila lo lo)	https://www.youtube.com/watch?v=zhPL5mFwniA
100	Xanimê wey Xanimê	https://www.youtube.com/watch?v=gCI8f6GCUD0

101	Xifşê	https://www.youtube.com/watch?v=NLo8aPEE3ak
102	Xoxê	https://www.youtube.com/watch?v=AcBCZU1sqYE
103	Xumxumê torîvanê	https://www.youtube.com/watch?v=wP9GyhdOqmQ
104	Yek heye (Kesnezanê)	https://www.youtube.com/watch?v=177d0yeT8-Q
105	Yelah Esmer	https://www.youtube.com/watch?v=c741SSj1eVc
106	Yeman Xeco	Mp3 Arşîva Seyran Amêdî
107	Zekîya (Ho yeman Zeko)	https://www.youtube.com/watch?v=ACWmkWcUhCY
108	Zembîlfiroş	https://www.youtube.com/watch?v=isuE8aol-MU
109	Zer e zer e (Alayê Kurdan çend zer e)	https://www.youtube.com/watch?v=7GsYyyEk4FE
110	Zerîyê ez mêhvanê te me	https://www.youtube.com/watch?v=cgRtrftZEs4

PÊVEK 2: Çend Mînak ji Kilam û Stranên Mihemed Arif Cizîrî

240 berhemên di listeya jor de bi awayekî nivîskî hemû hatine deşîfrekirin.
Lê ji ber ku wê gelek cih bigire, em ê qîm pê bînin ku çend nimûneyan pêşkêş bikin.

1. Ay ay Babiko

*Ay ay babiko ay ay babiko oy oy dil bi kulo
Ay ay babiko oy oy babiko oy oy rezîlo ay ay babiko
Oy oy babiko, emrê mino ay ay babiko*

*Ay ay babiko oy êvarkê, serê min giran bî, ranabê
Ji kulan û xeman û xetran û secran û derdan
Babikê mino ûy ay ay babiko oy
Biharek e hişîn dibê li serê kortikê gundê me mesîlanî û
Bêlan û çîmena, hemî seqlana ser kanîka hawar e heman û erdan
Babikê mino derdê evînikê derdekî nedej bû
Piştî wê re derdê we sala wek vê salê
Xizaniyê, eskerîyê, deyndarîyê, xurbetê jî serde ay ay babiko
Oy oy babiko ay ay babiko, ay ay rezîlo
Ay ay babiko, oy oy li min, emrê mino*

*Êvarê kule dilê min pir bûne
Serê vê êvarê darê dinyayê
Rebeno dîno bela bûne
Xwezîka min ê bizaniya ji xêra xwedê re
Ji derîyê mîrê mirada re
Çavê reş û belek kû dê melûl bûne
Oy oy babiko, oy oy babiko, emrê mino
Ay ay babiko, wez nebinîm oy oy*

2. Babê Nûrê

*Ew bo çi şerrî dikî, şerrê dewletê
Welle bo çi lê wayê, lê wayê, lê wayê lê wayê hawar dikim
E niza bo çî li hewara me nayê*

*Berdê, berdê, delalê diya xwewo de berdê
Şerrî bike, tirsî min ew tirs e
Şerrê dewletê ji te nayê rebeno
Wele tirsî min ew tirs e, tu serê min rebena Xwedê deyka xwe bî
'Eşîra xwe bî, bêxî li ber qeda û belaye vê dewletê
Gotî lê lê lê wayê lél lê lê wayê
Wele gotî dilê mi bî gelekî delodîn e
Dilê min rebenê Xwedê gelekî dilodîn e
Babê Nûrê Siwar dibe li hespê di mehîn e
Wele berê xwe didê xopanê Elmedîne
Wextê siwar dibê li hespê di mehîn e
Berê xwe didê xopanê Elmedîne
Fekî hindekê nijdevana pêşîya Babê Nûrê
Li çemî kemîn danîne, rûniştîne
Serê nijdevana gazî kirî gotî Babê Nûrê:
Te Navê xwe li nav koçk û dîwanxanên mêr û mêrxasa dida
Heke tu mêrekî çê bî, heke tu rastî bî, rabe dest hilîne
Li nav koçk û dîwanxanên mêr û mêrxasa dida
Heke tu rastî bî, rabe dest hilîne
Babê Nûrê lê kirî gazî gotî
Û pakîte fişekên canbêzara Babê Nûrê lê diheşîne
Dibêtin navê xwe li nav koçk û dîwanxana mêra didem
Heçî mêrekê baş e, bila bê pêşber Babê Nûrê dest hilîne
De lê lê wayê, lê wayê, lê wayê, lê wayê
Were lélêwayê, lêwayê, lêwayê, lêwayê
Ez ê hindî hawar dikim, hawar nayê
Wele kurê mino, tirsî min ew tirs e*

Tu serê 'eşîra xwe bêxî qeda û bela û teşqelê vê dinyayê

Babê Nûrê çûbî sekinîbî li devê bîrê

Wele gazî kirî gotî: Hedile Rabe

Rabe lingê xwe bêxe rikêba bozê

Lingê xwe bêxe rikêba bozê

Ez ê te birevînim, te bibime banê Sîlan û Beraza Mala Mihemedê Kilhê

Hedlo gazî kirî gotî: Babê Nûrê bi te ra nayêm Mala Mihemedê Kilhê

Heçî Mala Mihemedê Kilhê nin ji bereka mala babê xwe de

Weke hindeka bêbext in, direwîn in

Heçî Mala Mihemedê Kilhê nin Hedlo gotî

Ji bereka mala babê xwe da bêqewl in û bêbext in

Par vî çaxî heft birakê min kuştibîn ser sifra xwîné

Lê lê lê wayê

Hawar dikim, hawar nayê

Welle çi bikim hawara me dûr e qeda û belayê vê dinyayê lo lo

Tirsa min ew tirs e kurê min, mi bêxî lê lê lê wayê

Qeda û belayê vê dinyayê

3. Befîr barî

Befîr barî sebra minê li zozana befîr barî

Îro malekî li zomê mala babê min ê bar kirin sebrê

Kuro dîno zoma bar kir dana ser wî warî

Her du cotê memikê te rebena Xwedê

Mîna mûmik û şemalika rebenê dînê

Min ê danî nîveka mezela tarî

Gelî gundîyan û cîrana

Ji xala fesad û ewanê gundê me re sebrê

Xwedê mala wan xirab kit, min tu xwarî

Hal bûkê rebenê dînê min tu nexwarî

Befîr barî li ser kevirî

Befîr barî befîr barî

Li zozana sebra minê baran pê re
 Li aşûtê befrê lê kir
 Şevêkê baranê lê kir şevêkê kanûna gelî gundyan û cîrana
 Şevê kanûna berfê lê kir
 Baranê pêra biçirkîne befir barî
 Kuro dîno ji nav zoma were bîstekê layê mala min rebena Xwedê da were
 Bê bextê çend gel min direwîn î
 Befir barî befir barî
 Were şevêkê destê xwe bide gerdana mina zer li vê dinyayê tu biwerîne
 Kuro dîno hişyar û muqeyed be gidî
 Bes hişyar be muqeyed be kirasekî tenik e, lavlavk e, meles e li ber min e neqetîne
 Heke tu kirasê kitanê min ê teng e mefrûmê melezê te qetandî
 Bajarê welatê xerîb û qurbetê bigerî, Ji taxî ji wî terzî ji wî fistanî qet tunîne
 Befirê lê kir car bi car e
 Heçî bêtin tewefa memikê min rebena xwedê bejna min pê re
 Ji her du qewlê Xwedê bit
 Derman dikim, kor bit, şehit bit, şil bit, seqet be, birîndar be, nîvdîn be
 Befir barî befir barî

4. Eysana Elî

Lê lê lê wayê lê lê lê wayê lê lê lê wayê
 Eysanê lê wayê tenikê lê wayê nazdarê lê wayê kabilê lê wayê
 Wele gelê gundîn û cîrana sing û ber û bedana Eysana Elî mîna berfa çîyayê
 kembaxa Melezgirê.
 Şeve barî barî de hoy hoy Silo de singê Eysanê zereqa tavê lê dayê yadê
 Wele de rabin de rabin de rabin
 Ew çima babê Eysanê neda min ji her du çavê xwe kore be

 Kirasekî tenik ê kitan ê mebrûm ê melez li serr bejn û bala Eysana Elî, jê re dibêjim
 way gundîno
 Ji Eysana min re bêjin wê kirasê kitan ê tenik ê mebrûm ê melez li ber bejn û bala
 xwe neke keçê dînê malxirabê

Li ber bejn û bala xwe neke, kihêlê li zomê xwe neke, li nava xopanê gundê me negere

*Li nava xopanê gundê me negere ûy sût û sûtalê gundê me zehf in
Tirsime sûtalê gundê me fîstanê Eyšana Elî bike ji çavê xwe re jê re bikin îşaret e
Piştî wê re rabe ramêsenekê bi ser canê xelkê delal we de min de berde
Keçê Eyšanê bila ji dîya te re xêr e ûy êê ûy
Erê bila ji babê Eyšana min re cennet e çar malo xirabo ay gundo*

Lê lê lê wayê ûy tembûrekê ez ê çêkim ji Eyšana Elî re tembûrekê vayê çardeh perde way gundîno

*Li ber serê Eyšana Elî rûnim bi tilîka xwe ji te re lê bidim bêjim kulan
Yekê ji mereqa yekê ji xela yekê zecran yekê derda way way way gundîno
Ji xêra Xwedê re hakimekî adil li xopanê gundê min û Eyšana Elî de rabîya
Jina te ji terezê kotikî merê xirab wekî Eyšanê bida berdan ûy
Wele de rabin de rabin de rabin
Ew çima babê Eyšanê neda mi ji her du çavê e kore be*

*Kirasekî tenikê, kitan ê mebrûm ê melez e li ber bejna bala Eyšana Elî
Tirsa min e ser re bin re bixuye cotikê cotê zêr memikê way gundîno
Heçî Eyšana Elî kilê çavê serê wê nedîdî ramûsanê Eyšana Elî xweştirin ramûsanê
bistû pêncî oy*

5. Hesenê Mala Mûsa

*Hey wax hey wax hey wax, hey wax hey wax hey wax mala minê
Bila sêsed qeda û belayê li dinyayê bikevê şixulê zewacîkê Heseno dilketinê
Hesenê mala Mûsa min dixwazê Tora banî
Babê min kore bibî lo lo çima ez nedamê mala minê
Hey wax hey wax heya wax heya wax li min sebebê*

*Heseno biharekê ser me de hatî lo lo lo lo lo lo Heseno bihar bîye mala minê
Zerîyên gundê me meşîne lo lo lo lo lo lo dar mazî ye
Min ê destê pismamê xwe girtî birîye*

Emê çûne bi xort û qîzên gundê me re
Çûyine lo lo darê darmazîya mala minê
Min dît ji dana Xwedê tifengekê ji dara delê lo lo lo lo diteqîya
Ûsivê Mala Qasim gazî kirî gotî her lo
Bêje birînên Hesênê Mûsa lê lê lê lê li kawî bîye
Gotî Xwedê mala babê te xira bike birajo
Birîna Hesênê Mûsa ji sê derba serê çîçikê alîyê rastê lo lo lo lo derketîye

Heseno xwezî wez ê teyr bîma lo lo lo lo lo Heseno ji teyrê reş î
Bifirîma min ê danîna ser qesra Hesênê Mûsa li Tora banî
Li ser vî dîwarî lo lo lo lo lo ser wî hejî
Ji birîna hemî birîndara derketî xwîna safî
Ji birîna Hesênê Mûsa derketî lo lo xwîn û mejî
Ax u keserên te mane li ser vî dilî

Heseno navê gundê me bî lo lo me Sersem e
Hemî pê zanine şevê dilê min rebena Xwedê lo lo derd û birîn û cefa û kul û xem e
Ya Rebi çawa te miradê nekîr em aşîq bîn pa ne em jî ebdê te ne
Hemî ax û keserên vî zemanî mane lolo li ser vî dilî

Li min û te wa hatî rûjekê îdekê îda lo lo lo lo vê qurbanê
Pêş avê ve zerîyên gundê me meşîne hêdî hêdî lo lo rebeno ber dîlanê
Çawa xortên gundê me çûne ser tifengê li ber nîşanê
Hingî ez ê çavê xwe digerînim li Hesênê Mala Mûsa
Zerîyê li qesrê mane tenê alîyê eywanê
Şevê heta dibê dangê sibê min rebena Xwedê ji bin dîvkê çavê xwe re
Min ê ji şimamê xwe re lo lo lo lo rûndikê danê
Hemî ax û keserên vî rebenî mane lo lo ser vî dilî mala minê

Min ê karê xwe kir barê xwe da wilatê lo lo vê Mêrdînê
Ev e serê çendik û çend wextan e ez ketime bêbexto dadê dad kemînê

*Derbeka çawa li şimamê min dane li destê min rebena Xwedê ketibî li bazina keti
Derdê birînê*

Hemî ax û keser mane li ser vî dilî

Ax û keserên vî rebenî xilas nabin rebeno ji ser vî dilî

6. Lawikê Me'denî

Gulê gotî lawikê Me'denî ûy ûy ûy ûy ûy ûy ooo

Gulê gotî tu neçe serê rêka kuro kafira vê Me'denê

Lawiko tu neçe serê rêka kuro kafira vê Me'denê

Gulê gotî bêhnekê bisekne l' mi pepûkê l' mi rezîlê l' mi rebenê ooo

Lawikê Me'denî bêhnekê bisekne l' mi pepîkê l' mi rezîlê l' mi rebenê

Wextê deynê evda li te bê em ê bidîn

Gulê gotî wextê deynê evda li te nîn e

*Şevikê nivê şevê were rabe pişta xwe bide stûna mala babê min lawkê Me'denî gel
min nayê bo çî û*

Hayê sed caran li min hayêê

Lawikê Me'denî gazî kirê gotî Gulê ûy ûy ûy ûy ûy ûy ooo

Keçê Gulê heta wez ê Lawikê Me'denî bûm di wextê xwe de eee

Heta wez ê Lawikê Me'denî bûm

Serketê xort û lawa bûm

Xweyê cot û cobara bûm

Ez ê xweyê milk û emlaka bûm

Xweyê rez û peza bûm

Gulê bêbextê derewînê

Wele malxirabê xweyê rez û peza bûm

Xweyê milk û emlaka bûm

Destê mi rebenê Xwedê kêşa

De Gulê hatî ji malê dinyayê

Piştî wê re Gulê Lawikê Me'denî bo te dibêjim

Tu li xwe bikî kirasekî yê Qur'anê

Wele Gulê gotî Lawikê Me'denî jê re

*Tu li xwe bikî kirasekî yê Qur'anê
Kirasekî yê Mishefî, yê Incîlê yê Tewratî
Hêdi ewlehîya Lawkê, bawerîya Lawikê Me'denî çî cara bi te nayê ooo
Lê lê Gulê malxirabê li gel mi nayê
Heta wez ê Lawikê Me'denî bîm
Serkeftê xort û lawa bûm
Xweyê cot û cobara bûm
Xweyê milk û emlaka bûm
Xweyê rez û peza bûm
Destê mi keçê... heps kirin malê dinyayê Gulê
Pa ne êdî ewlehîya bawerîya Lawikê Me'denî ti cara li te nayê êêê
Sed cara li min hayêê*

*Gulê gazî kirê gotî Lawikê Medenî heta wez ê bi navê te bim Gul û Gulperî me eee
Heta wez ê Gul û Gulperî me
Bi daw û delingê Siltanê Ehmedî me
Solekê bo te, solekî şiftelîme
Ez ê gorekê ji va gorê moşalî me
Wez ê gorekê va gorê moşalî me
Min ê sûnd xwarî bo te bi sûnda qesemê
Bi qanîna Romê, Şêx Îslamê, Şêxê vê silhê
Ez bimirim Gulê gotî ez ya erdê me
Piştî wê re ji darê dinyayê bimînîm sax
Ez ya lawikê xwe yê kurê Me'denî me hao ooo hê hê hê
Hezar cara hayê li min hay*

7. Mêhvano

Ay lê de lê úy lo lo Mêhvano rêdûro

Mi dî xopana berrîka me ji qewlê zêr û zênetê warê dînê xeyalo

Birrekê maqûlê ji êvara xwedê de û beraza ji êvara xwedê ve

Lawikê mala babê min Şîrazê heram e bar kir lo Mêhvano

Wextê Mêhvanê mala babê min bi dikan û şîrazê barkirinê

Ez ê rabim bi çepilê Mêhvanê mala babê xwe bigirim bavê malê Xeyala

Destê hemû qumandaran û qeymakam bigirin li ber lawikê xwe bikim Mêhvano lo lo rêdûro

Ez ê rabim xwe bi tana kirasê kitanê meles bikim qîytana berê bişkojê serê memik ji mala bavê xwe re biqetînim

Min dît şevê dî li hewlê nîvê şevê re Mêhvanê mala babê min li xwe qebîçîn

Min nezani ne cilê Mêhvanê mala babê min dijon bîne

Ne war wargûzê mala babê min kembax bûne kit û matê gêncan bikine Mêhvano lo lo dîno lo

Lo lo Mêhvana lo lo úy

Lo lo Mêhvano bi sê dangan li berrîkê ji Mêhvanê xwe re bilîlînim bikin karî xayalo

Kona bar kir bi sê dangan ji Mêhvanê mala babê xwe re li berrîkê bilîlînim bikim bi milanî

Birrekî malê Ehmedê Mihemed bar kirin danîbûn çemê Xelemîyê,

Li golê Xatûnîyê, li aşê Mêhvanîyê, li Çemê Sewêdîyê, li çolê Gizronîyê Xeyalo

Wextê êl bi êlan serê war û wargoze mala babê min de danîn

Evînika xelk û alem û dinyayê bi sal û bi meha bû Mêhvano

Tal'îe min û Mêhvanê li berrîka me de bûye gawiristanî lo lo rêdûro

Ay ay ay Mêhvano lo lo rêdûro keserkûro

Min û Mêhvanê de gidî bist û perê berrîya Mêrdînê

Tavê xwe avêtî deşta Sirûcê, zeraqê tavê xwe dida kembaxê binya derîyê Misêbînê lo lo Xeyalo

Heçî rabe cabeka Mêhvanê ji mi ra bîne

Şev bî ez ê bazinê xwe biguhînim

Heke bi wê ciwabê qayîl bibe qayîl nebe heft aşê min rebena Xwedê hene
Ez ê bidime kembaxa binya derê şûrê Misêbînê lo lo Mêhvano
Ciwanîka lawikê min dilukimê lo lo Mêhvano
Em ê bibin li nalbenda li beytaran bigerînin
Nalbendo ketime bextê te û xwedê de ciwanîka Mêhvanê min dilikumê
Tu fekê ne ji nêl e ji heramê kembaxê mîratê bizmêr e lo lo rêdûro
Heke ji nêl e ez li bextê te de şûna nalî lê bide hicûlamîya zêr e
Heke ji kembaxê mîratê bizmêr e, nalbendo şûna bizmarî lê bide qerefla min a zêr e
de bajo
Wele tu delalê mala bavê min î oy
Mêhvano li ber tavika temûz û tebaxê neskînî
Tavika temûz û tebaxê gelekî dijwar e ûy
Wê serê te biêşe, mêvano ditirsim çavê te kul bibe ev xizan in halwextê me nîn e
Mêhvano
Wele tirsim tu bibî kar û emelê ji serê min î ez xema siwarê Hedbanê dinê berrîka
jêrî
Ez ê şevê dibêjim delal ez ê rojê dibêjim delal, şekirê labê heramê desmalê tu bî delal
Kulmekî mewîjê Hebabê li navê Delal, hejîrek ji hêjîrê kembaxê mîratê Çîyayê
Şingalê tu bî delal
Ne bi şevê ne bi rojê naçe ji xema min, xetera min ji xeyalê min
De lo lo Mêhvano ez xema siwarê berrîyê Mêhvano oy oy

8. Metran Îsa

Îro çûme Wanê aay Metrano wan li wê de
Min go tu rabe kelek û qayîkê Metrano ji me'r girê de
Em ê biçîn ba Metran îsa di behrê de
Wele delîl delîl delîl semyano lo dil delîl li vî Metranî
Dora Dêra Ixtimarê kemîn danî
Ji wî zemanî heya vî zemanî Metran îsa navê nav koç û dîwanxanê mêran û mêrxasa
her deranî
Delîl delîl li vî Metranî vî hogîçî vî beranî

*Elîyê Qolexazî gazî kirî gotî kelevano, kelekê lo lo ji me re bîne
Em ê biçîn ba Metran îsa lo lo di dêrê de
Wele delîl delîl delîl semyano lo dil delîl li vî Metranî, vî hogîçî lo lo vî beranî*

*Elîyê Qolexazî sê dangan gazî kirî gotî Metrano tu rabe Metrano ji xewa şîrîn rabe
Min ê tiştêkî da Mesîya Fileh tê de lo lo qeç nekirîye
Min ê Meyrema File dergistîya walîyê Wanê heyrano lo Metrano min ê revandîye
Rabe mehra min û Meyrama File bibire heyrano bi Filetîye
Heke tu qebîl bikî qebîl nakî mehra min û Meyrama File bibire ser dînê lo lo Îslamî
ye
Delîl delîl dilo şertê min û vî Metranî*

*Metran serê xwe ji xewa şîrîn rakirî gotî Elîyê Qolexazî wiha nakim lo loo
Heyrano wiha nakim şerîetê lo lo betal nakim
Ez ê dînê Mihemed hewşa derê bo xatirê jinika file rezîl nakim
Heçî qesta dêra Ixtimarê bike, min ê sûnd xwarî sûnda Îsayê Nûranî
Bi kuştina xwe be, kesekê bêmirad lo lo pader nakim
Ez ê dînê Mihemed hewşa dêrê rezîl nakim
Ez ê dil û qewl û resûê xwedê ji ser adetê Mihemedê, Meyrema file bînim dane
Elîyê Qolexazîyê, walîyê Wanê mahr kim
Seb te jî lo lo şerî betal nakim
Şert û min û vî Metranî*

*Walîyê Wanê gazî kirî gotî Metrano dîsa lo lo sed cara li min dîsa
Şevêkê min ê xewna xwe dîtîye cotekê kevoka firîn cem te hatine lîsa
Heke tu Meyrama File û Elîyê Qolexazî teslîmî min bikî ez ê bidim te hesabê hezar
kîsa
Heke tu qebîl bikî qebîl nakî bes Meyrama File teslîmê min bike
Ez ê bidim te bi hesabê hezar û hefsad kîsa
Delîl li vî Metranî
Devê dêra Ixtimarê lo lo Metran kemîn danî*

*Ji wî zemanî heya vî zemanî Metran îsa navê nav koç û dîwanxanê mêran û mêrxasa
her deranî*

Teslîm nakim teslîm nakim

Ez ê dînê Mihemed bo xatirê jinikeke file rezîl nakim

Ez ê bînim qewl û resîlê xwedê Meyrama File pêş çavê te ve Elî va kim

Şerî betal nakim, hezîno şertê vî Metranî

9. Qasimê Meyro

Ez ê bi dîyarê ûy ûy ûy kozika Lasebê xweşmêra ketim ûy ûy ûy

*Îro çawa kozik û çeperê van xweşmêra Qasimo danîne li devê xanîyê Xanê bila wez
nemînim ûy*

Çawa ûy ûy ûy li guhê xwişka te kuştin ji derbikê gulê sûstema

Ew çawa nalên dikeve xweyê van çaplîya xalê bila wez nemînim

Çawa nijdevana ûy ûy derbeka lédane li Qasimê min ê Meyrê ûy ûy ûy de kekê Ezo

Peyayê nijdevana pêşîya peyayê beledîyê bira Xanê wez nemînim

Ez ê çi bikim ûy ûy şevê dibê heta dangî sibî ûy ûy

Çaxê ba kirîye lalîn û kalîna Qasimê Meyrû yadê li min xweş tê

Ez ê çi bikim ûy ûy dengê lalîn û kalîne Qasimo lo xweş tê

*Sibê dibe heta dangê êvarî wele xewa xwişka te ya reben nayê hay li minê way li
minê li minê*

Ez rebena xwedê Hefayê birîndarê mala babê xwe bi tinê

Çeperê xweşmêra ûy ûy ûy danîne li devê va benderan ûy ûy

Li guhê min rebena xwedê xweş tê dengê gulê sûstema ûy ûy

Çawa nalên dikevê van miradxweyê sîtil û heft qedar e Xanê bila wez nemînim

Derbeka çawa ûy ûy nijdevana lédane Qasimê min ê Meyro de Kekê Ezo

Peyayê nijdevana pêşîya yê peyayê beledîyê Xanê bila wez nemînim

Em ê rabin cilê kuştîyan û birîndaran lev girê din

De biçin sera mehkima Dîyarbekir sera kurê Mihemed Paşa

Bêjin paşawo ketine bextê te w Xwedê de xanê bila wez nemînim

Derbeka çawa ûy ûy nijdevana lédana Qasimê min ê Meyrê de kekê Ezo

Peyayê nijdevana pêşîya peyayê beledîyê xalê mino ez nemînim

*Wext û çax û dangîya dengê nalîn û kalîna Qasimê min xweş tê yadê
Sibê dibî heta dangê êvarî ji dangê êvarî dibe heta dibê dangê sibî
Xewa xwişka te ya reben nayê de hay li minê li minê way li minê li minê
Ez piştî Heflayê mala bavê xwe nebînim Qasimo evdalê birê mi*

10. Xezal Xezal

*Xezal Xezal ûy ûy ay hoyê hoyê hayê hayê
Îro piştî xwe re ji mi re rêneke hawar e Xezalê çi nîşana ûy Xezal
Ez ê bînim ûy ûy hemî kulê dilê min pir in Xezalê ûy ûy hayê
Hawar e malxirab bînim danim rex kovanan ûy Xezal
Hawara gelî hemî gundîyan û cîrana
Ma hûn nizanin rûkê Xezala malxirab sor bûne
Ji kit û matê ramûsana ûy cefayê
De hayê Xezal hay nemîne
Xezala min ketî malê gundîyan û cîrana
Ez nizamim bo çi ji min re nayê rayê Xezal ûy*

*Xezal hoyê hoyê hoyê hoyê
Îro piştî te re çi bikim
Hewar e govendarê ji malê dinê hûy cefayê
Ez ê çi bikim ûy olya babê Xezala min bilind e gundîno ûy ûy hoyê
Îro hindî dikim û nakim çi rê naçinê, ser û berê xwe bidinê
Ma tu nizanî dîsana gelî gundîyan û cîranan
Wextê soz û qerarê min û Xezalê cardî serê xwe bê
Ez ê ber Xezala xwe da bîme ruhkê şîrîn sêbarî ji malê dinê hoy Xezal çi cefayê ûy
Xezal
Xezala min xerîb e ketibî malê gundîyan û cîrana, çima nayê rayê*

*Çi kanîka ûy hewarê Xezalê hoyê hoyê
Îro ketibî dankê reza kovandarê te me hoy Xezal
Hingî yadê ûy min ji Xezala xwe re ew kanî kolabî
Hawar e av tê neza hoy cefayê*

*Ma hûn nizanin gelî hemî gundîyan û cîrana
Memikê Xezala malxirab sor bîne
Mîna şemamokên deşta Hesina
Hawar e berê xwe bide ketine nav wan werza
Xizanê ji te re cefa ye ger ku mirî tu ketîyê*

*Xezal Xezal ûy ûy hayê hoyê hoyê
Îro piştî te re çî bikim hewar e ji hemî mal û milka kovandarê Xezal
Olya babê Xezala malxirab bilind e
Dikim nakim hewar e çî rê naçînê hoy Xezal
Hawar e sê qirarê Xwedê wê de Xwedê li can u cesedê min ketibê
Ez ê destê Xezala xwe bigirim ûlekê bihêlim hawar e bibim sêbarî wilatê Tirka
Xezal xerîb e hûy cefayê xezal xizan e ûy nemînim
Xizanî zehmet e ûy ûy Xezal ûy nemînim û Xezal
Ez ê çî bikim ez û Xezala xwe ketinê ûy xezal*

11.Zozanîyê

*Ez naçim zozana piştî te re mevanîyê zozanîyê
Ez ê naçim zozana wey lo wey lo wey lo
Zozan sar in ûy ûy zozanîyê
Îro gelî gundîyan û cîrana şelitê kona ba bidim biskê Zozanîyê
Şelitê kona ba bidim biskê va zerîya Zozanîyê
Sebebê çî bû te ceger û hinav û mêlakê min helandî
Te ceger û hinav û milakê canê min helandî
Şevê heta dibe banga sibê te dilê mi rebenê Xwedê
Hêdi hêdî hûrik hûrik danî danî ser gelîya zozanîyê mêhvanîyê canê min bi gorî
Ez piştî te re naçim zozana lazim dibînim biçim germîyana*

*Ez ê çî bikim roja me derketî heyv pê re
Ez nizanime ji derdê zozanîyê ji kûdê dihelê zozanîyê mêhvanîyê
Her du cohtê memikê Zozanîya malxirab heçî neditî
Weke sêvên Xelatê yê bilada hişîn bibê*

*Loma nêke kesê li paxilê zozanîyê mevanîyê canê min bi gorê
Piştî te re naçim zozana weylo weylo koçerîyê zozanîyê*

*Bejna zozanê nû kemilî emrê pazdehê yê çardehê
Heta gihişt şazdehe nû kemilî
Weylo weylo weylo weylo
Bo çi ew qa telgrafa rê dikim kelema bo te rê dikim
Mektûba rê dikim ciwaba wê nîn e hemî kul û mereqê te ne elemê te ne
Dinya bûrî feyde nakir ji derdê te bî zozanîyê
Hemî hişîn dibin dikevin ser vî dilî Zozanîyê
Te ceger û hinav û milakê min helandi milakê min pê re
Hemî kul û mereq derd û elemê te mane mane mane ser vî dilî zozanîyê mêhvanîyê
Ez piştî te naçim zozana lazim biçim germîyana zozanîyê mêvanîyê*

12. Babê Beşîr (Axawo lo)

*Dora çalê mişmiş e axawo lo
Dora çalê mişmiş e Babê Beşîr
Xencera axê xişxiş e axawo
Xencera axê xişxiş e Babê Beşîr*

*Ehmed çû Dîyarbekir axawo
Xweşmêr çû Dîyarbekir Babê Beşîr
Çar derî jê re vekir axawo lo
Nişan anî pê ve kir axawo lo*

*Çû hawara Mêrdînê axawo lo
Hat hawara Mêrdînê Babê Beşîr
Teyara bi xwe re tînê axawo lo
Nav Ereba direşînê Babê Beşîr*

*Hat hawara koçeka axawo
Çû hawara koçeka Babê Beşîr*

*Hemî bi rext û fişeka axawo lo
Hemî bi rext û fişeka Babê Beşîr*

13. Bejna Gulavê

*Bejna Gulavê ji çend taze
Bejna Gulavê tê ji pûle
Bejna Gulavê ji çavan e
Wele rîhana bi pûl e*

*Bejna wê wek gula bi av e
Taliê min çî bikim keçê
Bejna wê wek gula bi av e
Gula mi ji bo xelkê baş e
Gula mi çendî baş e
Bo taliê min çend xirab e*

*Gula min çû eynê tînê
Zilfê xwe li ber bixemlînê
Weke teyrê li ser hêlînê
Teyr firî kes nezanî
Nivîştîya îşqê îşqê bo min tînê
Were wer Gula misk were
Miska ber te tu were*

*Keçê were tu bi gundî ve
Gula mi were tu ji gundî ve
Şeva tarî wer bi gundî ve
Em ê qiset bikîn bi dizî ve
Were keçê tu bi gundî ve
Da baxvin bi dizî ve
Reqsê bikin bi Kurdî ve
Were wer were were*

*Were Gulam eynê tînê
Zilfê xwe li ber dixemlînê
Weke teyrê li ser hêlînê
Teyr firî kes nezanî
Mifta işqê işqê bo min tînê
Nivîştîya işqê bo min tînê*

*Govenda li pişt zeryan e
Gulav pêş nav ne xuyan e
Govend çêbî li ser çîyan e
Gulav mi nav ne xuyan e*

14. Çûm Amêdîyê (Eman Suleyman)

*Çûm Amêdîyê qesrê spî ne
Hat amêdîyê qesrê spî ne
Bin mesîra ve mêrg û kanî ne
Govend bûrîye mi hajê nîn e
Qîzik bûrî ne mi haj xwe nîn e*

*Keçê zû were babo zû were
Ez û tu ketî ji qamê te re
Keçik pîr bîye zaman ma ji pê re*

*Çûm Salebîka wile mi dîye
Çûme rûniştî kehnîya nivî ye
Dengê wê kewê li min hatîye
Çavê min pê ket tîra neyara
Tîra neyara li nivîya ketîye*

Çûme Simbûrê wile bi rez e

*Hatim Simbûrê wile bi rez e
Keçik rîniştî keçê bo digirî
Destê min girtî, keçê bigeze
Keçkê go êvar e kurik bileze
Nebî êvar e keçik bi lez e*

*Eman Suleyman canim Suleyman
Keçik pîr bîye zeman zû bir man*

*Çûme Dihokê wile li ber çem e
Hatim Dihokê wile li ber çem e
Fîstanê yarê hevrişmê nerm e (waweylê waweylê)
Nivişt xwe ve ke me ji xelkê şerm e*

*Eman Suleyman canim Suleyman
Keçik pîr bîye zeman zû bir man*

*Çûm amêdîyê tevde rûbar e
Hatim amêdîyê tevde rûbar e
Keçik rondikan tu nebarîne
Şev tarî ye lê bîye êvar e*

15. Dinya dolabil hewa ye

*Dinya dolabil hewa ye
Rojkê bo me ye nîv roj bo hewe ye
Çeqûqala hewe mal dilê me ye
Tu jî ne sûcê te yê hevalê te ye*

*Dinya fitilî ya nesîbe
Zelamek bibî qehr û musîbet
Tu bo me bûbû qehr û musîbet
Rêka te girtin kes naçit misîfe*

*Ne we ye ne we ye
Alem ser devê te şehde ye
Sûcê hevalê te sûcê te bi xwe ye
Rêka xelkê berde sûcê te ye*

*Hindik sax in yê mirî ne
Hindik mirî ne ew yê sax in
Serê erdê xwedê rê ve çûyî ne
Malê alemê wa xwarî ne
Turimbêla wa siwar bîne
Hindik çûne xariç wê hatî ne
Ji wan we ye kesek nîn e
Ji wan we ye qîyamet nîn e
Barê xelkê xwarî ne
Dinya dolabil hewa ye
Du rojan bo me nîv roj bo hewe ye*

16. Ew milkê Kurda

*Ew milkê Kurda tev xêr û bêr e
Alîyek maden e, tev zîv û zêr e
Em îro çî bikin maye ji xelkê re*

*Hey eman eman sed caran eman
Xelkê em kuştin avêtin çeman
Tu şêr û hakim di nav me de neman
Herkes siwar bûn em her peya man*

*Ew milkê Kurda tamam kanî ne
Her mêrekî Kurda bi sed mêrî ne
Îro em ketin me kesek nîn e*

*Her mêrekî Kurda em bi sed mêrî ne
Îro em ketin ax, em bê xwedî ne*

*Ew milkê Kurda hemî seyran e
Ev cihê hanê cihê xeman e
Ev dinya hanê cihê xeman e*

17. Fehîmayê (Yar Fehîmayê)

*L' bajêr e xweş bajêr e yar Fehîmayê
L' bajêr e xweş bajêr e ji mêrî dilmayê
Sînga wê berfa şikêr e yar Fehîmayê
Sînga wê berfa şikêr e ji mêrî dilmayê
Ramûsan ji bo te xêr e yar Fehîmayê
Ramûsan ji bo te xêr e ji mêrî dilmayê*

*Gundê me li ber de zevî yar Fehîmayê
Gundê me li ber de zevî ji mêrî dilmayê
Sînga wê berf û kevî yar Fehîmayê
Sîngê te berf û kevî ji mêrî dilmayê
Ramûsan bo min dikevî yar Fehîmayê
Ramûsan bo min dikevî ji mêrî dilmayê*

*Gundê me li ber de bûstan yar Fehîmayê
Gundê me berde bûstan ji mêrî dilmayê
Sînga te li berfa Kîstan yar Fehîmayê
Sînga te li berfa Kîstan ji mêrî dilmayê
Ramûsan sed û bîstan yar Fehîmayê
Ramûsan sed û bîstan ji mêrî dilmayê*

18. Kirasê te meles e

*Kirasê te meles e lê ha wer lê ha wer lê ha wer lê
Kirasê te meles e can û can kê qurban*

*Min dabû ber meqese ha wer lê ha wer lê ha wer lê
Te da bû ber meqes e can û can kî qurban
Kî yara wî tune ha wer lê ha wer lê ha wer lê
Kûçik lawê teres e can û can ez qurban*

*Kirasê te mebrûm e lê ha wer lê ha wer lê ha wer lê
Kirasê te mebrûm e can û can ez gorî
Hûrik hûrik didirûme lê ha wer lê ha wer lê ha wer lê
Hûrik hûrik didirûme can û can kî qurban
Kî yara wî tune lê ha wer lê ha wer lê ha wer lê
Ji her du dinya mehrûm e can û can can qurban*

*Kirasê te kitan e lê wey lê lê wey lê lê wey lê lê
Kirasê te kitan e can û can can qurban
Merişîvê berdan e lê ha tew lê lê ha wer lê ha wer lê
Merişîvê berdan e can û can can qurban
Kî yara wî tune lê ha wer lê haw lê ha wer lê
Xweyî kul û derdan e lê can û can ez qurban*

19. Kundiro (Kundirê Mîranî)

*Kundiro kundirê mîranî
Kundiro kundirê mîranî
Helawa şekir û şîranî
Kes tama kundir nizanî*

*Kundirê lema latê ye
Bî şîva bîk û zavê ye
Kundiro kundirê mîranî
Li zavê bî bîka hewşê ye*

*Kundirê li ber Xabûrî
Kundiro kundirê mîranî*

*Bi dizî ber mi re ew bûrî
Şevika nivî bî bûrî*

20. Lê lê Hinê

*Wey lê lê lê wey lê lê Henê
Gul gulşengê ber bêhna minê
Gul û gulrengê ber bêhna minê
Mi ji te seh nekir yek xeber tenê
Mi ji te seh nekir yek gotin tenê
Her kes ser dînê xwe tu hevala minê
Her kes dînê xwe tu yara minê*

*Mala Hennê ketî Rûbarî
Xanîyê babê Hennê ketî Rûbarî
Me gul çinîne me pelçim xwarî
Me gul çinîne me pelçim xwarî
Felek xayîn e ket roja tarî
Felek xayîn e ket roja tarî*

*Mala Henê way lê lê li nizarî
Xanîyê babê Hennê ketî nizarî
Me gul çinîne me pelçim xwarî
Me gul çinîne me pelçim xwarî
Şev şevkê bî wê şeva tarî
Şev ketibî wey ew şeva tarî*

21. Nazlîyê hey Nazlîyê

*Nazlîyê hey Nazlîyê
Çavreşê çil kezîyê
Lê lê lê Nazlîyê
Dengxweşê çil kezîyê
Hema dilê min ketîyê*

*Nazê derket ji derê mala
Çavreş derket ji derê mala
Biske têle li ser guhara*

*Eman eman hey Nazlîyê
Dengxweşê çil kezîyê
Dilê'm wayê li te ketîyê*

*Nazê têt û ji Dîyarbekir
Cilê keyfê li ber xwe kir
Mala xorta tew xira kir
Nazlîyê hey Nazlîyê
Çavreşê çil kezîyê*

*Nazê têt û ji Mêrdînê
Çavreş têt û ji Mêrdînê
Serê memika dihejînê
Wele simaqê tew şêrînê
Eman eman hey Nazlîyê*

22. Sînem

*Derketîye ji nav bistanî
Işaret kir bi fistanî
Wextê keçkê ez nabînim
Wextê Sînem ez dibînim
Wextê Sînem ez nabînim
Aqil ji serê min deranî
Wextê Sînem ez nabînim
Aqil ji serê min deranî*

Were ay were ay were

*J' derdê Sînem ketime
Were ay were ay were
J' min re bînin ketime*

*Çûm bistanî gula zer kir
Hat bistanî gula zer kir
Çûm bistanî gula zer kir
Hat bistanî gula zer kir
Sînem qulpa memka vekir
Wextê çavê min pê diket
Qupa memka Sîne vekir
Wextê çavê min pê diket
Sînem qulpa memka vekir
Heta bibit li beyanê
Heta bibî li ber beyanê
Min aqilê xwe min berze kir*

*Were ay were ay were
J' derdê Sînem ketime
Were ay were ay were
J' min ra bî yar ketime*

*Mi dîtibû li gir fitilî
Dûra kesrê ew fitilî
Mi dîtibû ew zîvirî
Dûra Sînem ew fitilî
Wextê çavê min pê diket
Aqil ji serê min deranî*

23. Sixcanê canê

*Sixcanê canê canê canê
Kember ketibî xanê*

*Xwezî bi şeva bî nanê
Derî qufl û mifte ke
Canîka hespê neke
Sixcanê kefyûka xwe ke*

*De lê ke biskê canê
Kilê çavê sixcanê*

*Sixcan penîrê ter e
Delal penîrê ter e
Kurtika gulover e
Xwîna min kela ji te re
Kelehîya birî ji xwe re*

*De lêvê wê Sixcanê
Sixcanê tu li Eyntirbê
Delal tu li Eyntirbê
Memik sêvê Xelatê*

*Mi divê Sixcan revînim
Tirsa min ji babê û yadê
Sixcanê canê canê
Kilê çavê nûre wanê
Sixcankê tu li ber avê
Delalkê tu li ser avê
Memik hingivê li navê
Mi divê ji Sixcan birevînim
Tirsa min ji yadê bavê*

24. Va zerîya ez heladim (Çûme gundê Tilmûsil / Ho yeman)

*Çûme gundê Tilmûsil
Ho yeman ho yeman ho yeman
Hatim gundê Tilmûsil*

Va zeryan ez helandim

Vê zerîyê ez helandim

Niza bo çî bo çî bo çî

Ho yeman ho yeman ho yeman

Kirim beyta naqosê

Va zerîya ez helandim

Hat karwanê Helebê

Ho yeman ho yeman ho yeman

Hat karwanê Helebê

Va zeryoka ez xepandim

Vê zerîyê ez pijandim

Niza bo çî bo çî bo çî

Ho yeman ho yeman ho yeman

Kirim darê dergûşê

Va zerîyoka ez xapandim

Hat karwanê Mêrdînê

Ho yeman ho yeman ho yeman

Hat karwanê Mêrdînê

Va zerîya ez helandim

Vê zerîyê ez helandim

Ho yeman ho yeman

Vê zerîyê kur xapandin

Ho yeman ho yeman ho yeman

Kirim derdê dewletê

Va zerîyoka ez xapandim

25. Xifşê

Çûm Bamernê ser çîya ye
Oy le min oy le min oy le min lê lê Xifşê
Hat Bamernê ser çîya ye
Oy le min oy le min oy li min ay gidyê
Dilê xorta ji kîza maye
Oy le min oy le min ay Xifşe ay gidîyê
Qîza bo me dil nedaye
Oy le min oy le min lê lê Xifşê

Eman eman qîza kifşê eman eman çend keleşê
Xeberxweşê oy li min lê lê Xifşê

Çûm Bamernê li ber de gir e
Oy le min oy le min oy ay Xifşê xeberxweşê
Hat Bamernê li ber de gir e
Oy le min oy le min oy li min lê lê Xifşê
Dilê mi jî bi qehr û kul e bo te gidîyê
Oy le min oy le min oy le min lê lê Xifşê ay gidyê
Dilê mi ji qehr û kul e bo te gidîyê
Oy le min oy le min oy le min xeberxweşê
Xelke Xifşê ji xwe re bire bo çî we dikî
Oy le min oy le min oy le min xeberxweşê
Xelke Xifşê ji xwe re bire
Oy le min le min oy le min oy le min

Eman eman ji qîza kifşê eman eman çend keleşê
Xeberxweşê oy le min oy le min lê lê Xifşê

Çûm Bamernê bi derge ye
Oy li min oy le min oy le min oy le min
Ay Xifşê xeberxweşê bo çî we dikî

*Hat Bamernê bi derge ye
Oy le min oy le min oy le min lê lê Xifşê
Dilê mi jî bi qehr û kul e bo çî we dikî
Oy le min oy le min oy li min lê lê Xifşê oy gidîyê
Xelkê Xifşê ji xwe re bire
Oy le min oy le min oy le min lê lê Xifşê
Xelkê Xifşê ji xwe re bire
Oy le min oy le min oy le min lê lê Xifşê*

26. Zer e zer e (Alayê Kurdan çend zer e)

*Rastî gotî bi behsî ye
Zer e zer e zer e
Rastî gotî bi behsî ye
Alayê Kurdan çend zer e*

*Şahînet e lo partî ye
Zer e zer e zer e
Govend ketî nav partî ye
Alayê Kurdan çend zer e*

*Agir kirin li serê çîya
Zer e zer e zer e
Agir kirin li serê çîya
Alakî Kurdan çend zer e
Zer e zer e zer e*

*Avê vexwin ji kevîya
Zer e zer e zer e
Avê vexwin ji kanîya
Alakî Kurdan ji xwe zer e*

Berê xwe bidin Filîstîne
Zer e zer e zer e
Em ê biçin Filîstîne
Alakê Kurdan çend zer e

Ew baran bî ji Mêrdîne
Zer e zer e zer e
Destê me digihê heta Sîne
Alakê Kurdan çend zer e

Pêşmerge bi şerî rabîye
Zerê zer e zerê zer
Pêşmerge û esker rabîye
Alakê Kurdan çend zer e

Berê xwe dan vî erdî ye
Zerê zer e zerê zer
Berê xwe dan vî erdî ye
Alakê Kurdan çend zer e
Dame hukmî zatî ye
Zerê zer e zerê zer
Dame hukmî zatî ye
Alakê Kurdan çend zer e

Rabin ser xwe di dîlana
Zerê zer e zerê zer
Rabin ser xwe di dîlana
Alakê Kurdan çend zer e
Erdê bidin van xortan e
Zerê zer e zerê zer
Erdê bidin van ehwan e
Alakê Kurdan çend zer e